Dr. Qasimlo banga aştî û azadiyê

Berhevkar: Şehab Xalidî
E-mail: mencel_ senger@yahoo.com

★ **Navê pirtûkê: Dr. Qasimlo banga aştî û azadiyê**
★ **Berhevkar: Şehab Xalidî**
★ **Pêdaçûn: Nûredîn Sofîzade**
★ **Rûberg: Şefîi Roşenî**
★ **Montaj: Dara Natiq**
★ **Tayp: Omîd Esxeran**

Dîhariye ji:

Malbatên birûmet yên gişt şehîdên rêya rizgariya Kurd û Kurdistanê re

Şehab Xalidî

Nawerok

- Pêşgotin 6

- Destpêk 9

Beşa yekemîn:
- Jînenîgariya şehîdê nemir Dr. Qasimlo 15

- Şîretên Dr. Qasimlo 18

Beşa duyemîn:
- Gotinên bi nirx yên şehîdê nemir Dr. Qasimlo 21

Beşa sêyemîn:
- Dr. Qasimlo û bizava azadîxwaziya Kurdan 33

Beşa çaremîn:
- Dr. Qasimlo û bizava seranseriya Îranê 38

Beşa pêncemîn:
- Rolê Dr. Qasimlo di PDK Îranê de 43

Beşa şeşemîn:
- Hevpeyvîna Dr. Qasimlo bi weşana **Rahê Eranî** re 50

- Hevpeyvîna radyoya BBC bi Dr. Qasimlo re 55

Beşa heftemîn:
- Kurdistan û Kurd 60

- Kurte bas 62

Beşa heştemîn:
- Kul û kovaneke mezin 67

- Şehîdbûna Dr. Qasimlo û hevalên wî ji zimanê kesekî ve ku bi çavên xwe ciyê bûyerê dîtiye 72

- Bûyera Viyenê 74

- Qisên dawiyê ên Dr. Qasimlo 77

- Rê û resma bi axê sipartina şehîd Dr. Qasimlo 78

Beşa nehemîn:
- Peyama Dr. Seîd Şerefkendî seba şehîdbûna Dr. Qasimlo 82

Beşa dehemîn:
- Li ser gora Şehîdan 88

Beşa yazdehemîn:
- Dr. Qasimlo berbijarê xelat Nobêl ya Aştiyê 95

- Yad û bîranîna kongireya Qasimlo 97

Beşa dozdehemîn:
- Dr. Qasimlo ji Dîtingeha kesayetiyên siyasî ve 101

- Helbest 132

- Wêne 137

Pêşgotin

Di nava gelên cîhanê de zaf mirovên jêhatî ji dayîk bûne ku bi zanist û zanyariyên xwe, û bi afirandinên xwe, karîne zaf xizmetên giring bi mirovahiyê bikin û navê xwe di dîroka wan gelan û cîhanê de tomar bikin. Di nav neteweya Kurd de jî zaf rêberên dilsoj û fîdakar heya axir dilopa xwîna xwe di pêxema rizgariya neteweya Kurd de tekoşîn kirine ku bê şik û guman nivşên dinê ji ceribandin û fîdakariyên wan bona pêşvebirina xebata rewa a netewa me mifah wergirtine. Yek ji wan rêberên mezin ku gişt jiyana xwe bona pêşvebirina doza netewa me û evroyîkirina xebata wê danî, şehîdê hertim zindî Dr. Qasimlo bû. Wî ku dikarî bi wan zanyariyên ku hene jiyana herî baş hebe, lê wî xweşiyên jiyanê cî hêlan û di pêxema rizgariya netewa xwe de rû li pêşmergetiyê kir û zanyariyên xwe xistne xizmeta ber bi pêşdebirina doza rewa a netewa xwe. Dr. Qasimlo bi bîr û baweriyên xwe yên ciwan û pêşketî rê û şopek ji PDK Îranê û gelê Kurd re dîharî kir ku niha jî rêbaza PDK Îranê ye, û ciwanên Kurd bi şanazî ve di pêxema vê rêbazê de tekoşînê dikin û diruşma Qasimlo Qasimlo rêya te dirêjî heye li ser zaf der û dîwarên Kurdistanê hatiye nivîsandin û li çiyayan de jî deng vedidet. Ya rastî eva ye ku nivîsandin an jî komkirina bîr û baweriyên pêşketî ên Dr. Qasimlo karekî dijwar e, lê hekî carna hinek ji bîr û baweriyên wî mamostayê mezin bikevne nava pirtûkan de, û ciwanên taze pêgihîştî ên welatê me van bîr û baweriyan bikne çiraya ronahîker ya rêya xebta xwe, bê şik û guman şûnwarekî baş di ber bi pêşdebirina xebata me de dê hebe.

Bîr û baweriyên Dr. Qasimlo yekcar zaf alî, û pan û berfireh in, ezê vira de tenê çend mînakan ji wan bîr û baweriyan bas bikim.

Dr. Qasimlo demokrat bû: Wî îmanekî zaf bi demokrasiyê hebû û jêve bû demokrasî çeka herî bi bandor a neteweyeke jêrdest û azadîxwaz e, her lewma wî demokrasiya herî xirab ji dîktatoriya herî baş pê çêtir bû. Wî eva di çaxekî de bas dikir ku rewşa çep per û baskên xwe bi ser welat de kêşa bû û diruşma dîktatoriya piroltariya bibû benûştê li ser zimanê piraniya siyasetvanên welatê me. Di siyasetê de dûrbîn bû: Di bersîva pirsyara nûçegihanekî Amrîkayî de ku jê dipirse: Bona evê ku xebata we deng vedet, bo çi hûn hewara

xwe nabne ber teror û însanrevandinê, dibêje: Rijîmek ku bingeha wê li ser terorîzm û însanrevandinê hatibe danîn nikare xizmetê bi armanceke rewa biket, ev dûrbîniya wî çaxî derdikeve ku niha partiya wî wekî partiyeke gelek bi pirensîb hatiye naskirin û ciyê rêz û hurmeta gişt kom û komikên navneteweyî ye. Di çaxê dest bi ser de girtina balyozxaneya Amrîkayê ji aliyê peyrewên xeta îmam ve, ku zaf ji rêxistin û kom û komikên siyasî ên wî çaxî bûne mehtkerê wî kiryarê, Dr. Qasimlo ew kiryar pirotesto kir, û ew kiryar bi ji rê derketin û binpêkirina yasayên navneteweyî hesêband.

Dr. Qasimlo îman bi siyaseta sed û sifir, an reş û sipî nebû, û digot: Siyaset hunera mumkin e û mirov dikare meremên xwe gav bi gav ber bi pêşde bibet, û digot di rabihûrî de Kurda wisa siyaset kirine, lewra heya niha yan negihîştine armancên xwe û digot; Kurd an sifir bûye an jî sed, lewra hertim bûye sifir. Raya wî eva bû ku bo diyarîkirina siyasetê hewce ye ku tu hêza xwe binirxînî û rewşa cîhanî, herêmî û navxweyî berçav bigrî û piştre biryaran bidî. Ew bi dijî takperestiyê bû û îmaneke zaf bi rêberiya bi kom hebû, heta ku ew mabû nehêla heta nîgarekî wî jî li dîwaran bidin. Di civîna piştî taqma heftkesî de bû ku wî ji xelkê Mehabadê re qise kir û xelkê jî diruşma “Dirud ber Qasimlo” didan ku Dr. Qasimlo nehêla xelk vê diruşmê bidet û gote wan, ku eva diruşma PDK Îranê nine, û diruşma “Dirud ber Hizbi Dimokrat” xiste ser devê xelkê. Kasêta vê civînê niha jî maye. Dr. Qasimlo fîdakar bû: Di çaxê şehîdbûna wî de wesiyetnameya wî ji wî bi cî ma ku tê de nivîsandibû : Di jiyana wî de wî her çi heye ya PDK Îranê ye, heya pirtûkxaneya wî a dewlemend jî. Wî bawerî bi yekbûna netewa Kurd hebû. Ew li bersîva rojnameya Aranî di sala 1367(1988)’an de dibêje: “Hekî sibê rojê hemû beşên Kurdistanê yek bigrin, eva parvebûna xaka welatekî nine, belkî hevgirtina xaka welatekî parvekirî ye”.

Derheq têkiliyên partiyên Kurdî bi welatên cîran re, û bi baldana bi hilkevta erdnîgariya Kurdistanê, bi raya wî partiyên Kurdî ên her beşek ji Kurdistanê dikarin bona pêşdebirina xebata xwe ji dijberiya dewletên cîran mifahê wergirin, bi vî şertî ku çi zerer bo wê beşa Kurdistanê çinebe. Bi gewahyariya belgeyên eşkerebûyî ên dezgehên ewlekariya Beisê, piştî hiloşîna wê, partiya Qasimlo di van têkiliyan

de serbilind hate der û xaleke nigativ di têkiliyên wê de nehate dîtin, û heya xalên pozetîv jî bi qazancê Kurdên Îraqê û xebatkarên wê hatne dîtin, û eva jî serweriya wê wedigere bo zanayiya Dr. Qasimlo di darêtina siyaseta serbixwe di têkiliyên bi aliyan re.

Ew aştîxwaz bû: Bi raya wî pirsa Kurd her divêt ji rêya aştîxwazane ve bête çareserkirin. Her di vê pêxemê de jî bû ku wî serê xwe danî. Dr. Bêrnard Kuşnêrê Feransewî dibêje: "Ew ji aştiyê ditirsiyan lewra Pêxemberê Aştiyê şehîd kirin". Gelekî bi cî ye ku gencekî xebatkar ê rêvîngê rêbaza Dr. Qasimlo cehda komkirina hinek ji bîr û boçûnên wî şehîdê nemir bidet û bi taybetî ew gence jî xelkê herêmekê be ku Dr. Qasimlo li wir ji dayîk bibe. Bê şik û guman divêt berhevkarê vê pirtûkê hest bi du tiştan kiribe.Ya yekemîn eva ye ku Dr. Qasimlo îmanekî zaf bi nivşa genc hebû û ên genc bi bişkujên pêşerojê ên welat dizanîn. Ya duyemîn eva ye ku herçend 16 sal bi ser şehîdbûna Dr. Qasimlo re derbas dibin lê serrastbûna bîr û boçûnên wî roj bo rojê zêdetir derdikevin. Gehandina van bîr û boçûnan bi ciwanên taze pêgihîştî ên welatê me erkê li ser milêt her gencekî wekî berhevkarê vê pirtûkê ye. Lewra ez tevî daxwaza serkevtinê bo berhevkarê vê pirtûkê seba vê cehd û tekoşîna wî, serkevtina wî di hemû warên jiyanê de jê re bi hêvî dixwazim

Têymûr Mistefayî

Destpêk

13 salan berî niha di roja 22.04.1368 (13.7.1989)'an de Dr. Ebdulrehman Qasimlo sekreterê giştî yê PDK Îranê û kak Ebdullah Qadirîazer endamê Komîteya Navendî a PDK Îranê û Fazil Mihemed Resûl ku Kurdekî Îraqî û dostê PDK Îranê bû, di bajarê Viyenê de ketne ber destrêjiya çekên çend kes ji terorîstên Komara Îslamî a Îranê û hatne şehîdkirin. Ew terorîstên ku wekî nûnerên Komara Îslamî a Îranê û bi armanca gengeşekirina li ser pirsa Kurdên Îranê bi wan re rûniştina hevpar pêk anîbûn.

Di rastî de ev cinayeta tenê derheq xelkê Kurdistana Îranê û PDK Îranê nehatibû kirin, belkî gefeke rastewxwe bû li ser hukûmeta Utrîşê û bêhurmetiyeke gelek mezin jî bû bi dijî yasa û pirensîpên navneteweyî, çimku terorîstên Komara Îslamî a Îranê bi navê dîplomat ji pasporta dîplomatîk mifah wergirtin û bi vî awayî karîn bêy ewê ku çi astengek bikeve ser rêya wan, vê pîlana xwe ya nemirovane rêve bibin. Lê mixabin dezgeha dad û tenahiyê a dewleta Utrîşê li hember vê pîlana nemirovî de bêdeng bû. Danûstandinên bazerganî li navbera Îran û Utrîşê ji aliyekê ve, û bê deshilatî û hejariya neteweya Kurd ji aliyekî din ve bûne sebebê vê yekê ku dad û tore ên exlaqî, mirovî, û demokrasî bibne goriyê qazanc û berjewendiyên dewleta Utrîşê. Ji me re jî eyan bû ku demokrasî û mafên mirov heya wî çaxî têne berçavgirtin ku bi qazancên dewletan re yek bigrin.

Bi şehîdbûna Dr. Qasimlo, PDK Îranê û neteweya Kurd rêberekî gernas û rêzan, tevgera demokratîk û şoreşvanî a welatê me jî kesayetiyekî gelek hêja û pêşeng ji dest dan. Mirovên mezin ne tenê di dema jiyanê de mezin in, belkî di dema mirinê de jî her wisa mezin dimînin, çimku mirovên mezin hekî di dem û qonaxên curbicur ên jiyana xwe de dikarin mînaka xizmetên mezin û jibîrnekirî bin û bandorên kûr li ser jiyan û xebata xelkê danên, bi mirina xwe jî neteweyekê û welatekî dihejînin û bi milyonan mirovan kovandar dikin. Bi şehîdbûna Dr. Qasimlo ku hem rêber û

hem rêzanê zana yê me bû, bi hezaran pêşmerge, dehan hezar kes ji endamên PDK Îranê , bi sedan hezar heval û bi milyonan kesî ji xortên neteweya me û di rastî de bîr û raya giştî a azadîxwazên cîhanê rondik rijandin. Hekî mirina hinek kesan bi bihurîna zeman ji bîra mirov diçe, lê nav û bîra vî rêberê me yê mezin û kiryarên wî ji bîra çi azadîxwazekî/ê naçin. Kul û kesera jidestçûna wî jî bi bihurîna zeman di dilê rêvîngên rêya wî de qet dernakeve.

Dr. Qasimlo di tewaya jiyana xwe de ji bo xizmetkirina bi gelê xwe xebitî û her di rêya serbilindî û serfiraziya neteweya Kurd de jî canê xwe gorî kir, lewma hewce ye ne tenê pirtûkek belkî çendîn pirtûk li ser kesayetiya Dr. Qasimlo bihêne nivîsandin, bo vê çendê ku xelkê Kurdistanê û nivşên din ên neteweya Kurd pitir kesayetiya wî xweşmêrê dîroka neteweya Kurd nas bikin û rêya xebata Dr. Qasimlo bikne rêya xwe, û wî bi mamosta û pêşengê jidestçûyî yê xebata xwe bizanin.

Lê mixabin herçend 13 sal bi ser şehîdbûna wî re dibihurin, niha jî min pirtûkek nedîtiye ku li ser kesayetiya wî gernasê dîroka neteweya me û siyasetvanê bê heval hatibe nivîsandin. Di rastî de nebûna pirtûkekê li ser kesayetiya Dr. Qasimlo, ew kesê ku tewaya jiyana xwe goriyê neteweya xwe kir, wîjdana min dihejand.

Bi bawera min hekî Dr. Qasimlo rêberê neteweya Kurd neba û rêberê neteweyeke dinê ba, renge piştî bihurîna 13 salan bi ser şehîdbûna wî re, bi dehan pirtûk li ser kesayetiya wî hatibana nivîsandîn.

Dr. Kemal Mezher yek ji dostên Dr. Qasimlo yên herî nêzîk dibêje: "Xwazî ku rêvîngên rêya Dr. Qasimlo ew hemû xasmaniyên Dr. Qasimlo di pirtûkeke serbixwe de weşandiban ku ez xatircem im wê bibe rênîşandereke bê mînak û ji neteweya Kurd re wê gelekî hewce be".

Di rastî de vê gotina Dr. Kemal Mezher pitir kar li min kir, û şev û rojan berhevkirina pirtûkekê li ser jiyan û xebat û taybetmendiyên wî bîr û hizra min bi xwe ve mijul kir. Lewma min bi hêviyeke zaf ve zendên xwe vedan û dest bi kar bûm. Min di destpêkê de ew

çavkaniyên ku tê de mijarek yan jî çend mijar li ser jiyan û taybetmendiyên wî hatibûne nivîsandin kom kirin. Piştî komkirina wan çavkaniyan, min gelek mijar wergêrandne ser zarawayê Kurmanciya Jorîn bi pîtên Latînî. Egera bikaranîna pîtên Latînî jî eva bû ku bi bawera min hekî di pêşerojê de zimanekî hevgirtî ê Kurdî pêk bihêt, hetmen wê bi pîtên Latînî be. Çimku pîtên Latînî bo hînbûna zimanê Kurdî sanahîtir e û bîhanî jî zûtir dikarin zimanê me hîn bibin.

Dr. Qasimlo di warê nivîsandina zimanê Kurdî bi pîtên Latînî dibêje: "Pîtên Latînî bo nivîsandina zimanê Kurdî ji hemû pîtan baştir in. Zimanê Kurdî kêmekê sanahî ye û hekî pîtên Latînî bête bi kar anîn, nexwendewarî wê zûtir ji nav here û bîhanî jî wê zûtir zimanê me hîn bibin".

Tomabiwa jî di pirtûka "Jiyana Kurdewarî" de nivîsandiye: "Kurdên Ermenistanê di destpêkê de bi pîtên Latînî nivîsandine, tenê hinek guherîn di pîtan de pêk anîne ku ew jî berî şerê cîhanî yê yekemîn bû, û Alfabê a Sîrîliyek tevlî van pîtan kirine. Lê her çawa be nivîsîna bi pîtên Latînî sanahîtir e ji pîtên Erebî. Wisa jî tête çavnihêrkirin ku tewaya Kurdan bo bikaranîna pîtên Latînî cehdê bikin. Çimku xwendin û nivîsandina wê ji zarokan re sanahîtir e. Herwisa guherîna pîtên Erebî bi pîtên Latînî yekbûna ziman sanahîtir diket".

Herwisa Mehdî Zanayê nivîskar û siyasetvan jî dibêje:" Weşandina pirtûk û kovarên Kurdî bi pîtên Latînî pêdiviyeke jiyana îro û sibê ye. Herwisa xelateke gelek bi seng e ji bo tewaya Kurdên ku nizanin pîtên Erebî bixwînin". Pêka gotina Mehdî Zana pitir ji 25 milyon Kurd hene ku bi pîtên Latînî dixwînin û dinivîsin.

Di dawiyê de ez gelek spasê ji hevalê hêja kekê Ebdulrezaq Muradazer dikim ku kampiyutera xwe hetanî bidawîhatina karê pirtûkê danî xizmeta min de.

Bê şik û guman ez dizanim ku ev pirtûka bêy kêmasî nabe, çimku di rastî de kêm nivîskar dikarin pirtûkekê binivîsin ku kêmasî tê de

çinebin. Lewma bo min jî ku ez ne nivîskar im, hebûna gelek kêmasiyan ji rastiyê bi dûr nine.

Ez hêvîdar im ku hevalên dilsoj bi gazinde û pêşniyazên xwe ên bi nirx pitir min ji kêmasiyên vê pirtûkê pê bihesînin. Dîsan jî ez pir bi dil spasê ji hemû wan kesana dikim ku bi gazinde û pêşniyazên xwe, çêtir min bo serrastkirina kêmasiyên vê pirtûkê haydidin.

Hêvîdar im ku ev pirtûka bikare heya radeyekê Dr. Qasimlo û kesayetiya vî xweşmêrê mezin yê dîroka Kurdan bi xwandevanên xwe bide naskirin, û xortên Kurd mifahê jê wergirin û şîretên wî xebatkarê mezin ji xwe re bikne çiraya pêşerojê.

Şehab Xalidî
22.01.1381
11.04.2002

Beşa yekemîn:

- Jînenîgariya şehîdê nemir Dr. Qasimlo
- Şîretên Dr. Qasimlo

Kurtiyek ji jiyana pirr berhem a şehîdê nemir Dr. Qasimlo

Ebdulrehman Qasimlo li yekem şeva zivistanê (Şeva Yelda) a sala 1309 (22.12.1930)'an li bajarê Urmiyê di malbateke xudanmilk û dewlemend de ji dayîk bû. Wî xwendina destpêkî û navendî pêşde li Urmiyê û piştre di Tehranê de bi dawî anî.

Hêla ew kuşke bû ku bi pirsên siyasî re nasyar bû, û hizr û bawerên azadîxwaziyê mejiyê wî dane ber pêlên xwe.

Ew bixwe di vî warî de li pirtûka "Çil salan xebat di pêxema azadiyê de" piştî wê ku basa sefera 30 kesî ji axa û serokeşîrên Kurdan bo Bakûyê li ser gaziya dewleta Sovyetistana berê diket, dinivîse: "Herçend ku wî çaxî ez yazde salî bûm, lê wekî zaf ji zarokên wî çaxî siyasetê bala min bo aliyê xwe rakêşabû . Babê min yek ji endamên vê şandê bû. Gelek baş li bîra min e, dema ku bavê min ji Bakûyê wegerya, çend tayê qendê û teypureke ciwan jî bi xwe re anî bûn. Wisa xuya bû ku Sovyetiyan qend û tifeng û tiştên dinê wekî dîharî dabûne tewaya endamên vê şandê. Wî çaxî bi taybetî qend gelekî bi nirx bû, çimku wî çaxî qend di Îranê de kêm û giran bû. Dema min ev yeka dît ez pir heyrî mam, çimku di mala me de birayên min û kurmamên min ku ji min mezintir bûn, basa vê yekê dikirin ku babê min bi çend kesên din re çûne Bakûyê da ku basa maf û azadiya Kurdan bikin, lewma min jî rast û rewan ji babê xwe pirsî: Erê babo mafê Kurdan çi jê hat?"

Ebdulrehman Qasimlo di sala 1324'an de tekoşîna xwe a siyasî bi avakirina "Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistanê" di bajarê Urmiyê de dest pêkir. Di sala 1325'an de piştî sernixûniya Komara Kurdistanê li Mehabadê, bo xwendinê diçe Tehranê û di sala 1327'an de bo domandina xwandina xwe diçe Parîsê. Gihîştina wî bi Parîsê hevçax bû tev teqekirina li Şah, di Zanîngeha Tehranê de (25.11. 1327'an), ku bû sedema jinavçûna azadiyên demokratîk di seranserê Îranê de.

Bi vê hincetê civîneke pan û berfireh a xwendekarên Îranî li Parîsê pêk hat, ku di vê civînê de Ebdulrehman Qasimlo bi dûr û dirêjî bi dijî Şah û rijîma wî axivî, û di encam de xwendekaran mesajeke bi lome ji Mihemed Riza Şahê Pehlewî re şandin. Ev yeka bû sedema

vê çendê ku heval Ebdulrehman Qasimlo ji aliyê balyuzxaneya Îranê li Parîsê û hukûmeta Feransayê ve bikeve jêr zext û givaşê û di encam de ew neçar ma Parîsê bi cî bihêle û wekî yekem bûrsiyeya Îranî a "Yekîtiya Navneteweyî a Xwendekaran" çû Praga paytexta Çikislowakiya berê. Her di vî heyamî de ku ew di Feransayê de bû, bi arîkariya çend xwendekarên din ên Kurd "Civata Xwendekarên Kurd" li Ewropa ava kirin.

Di vî heyamî de ku wî di Pragê de ders dixwand, di tekoşîna "Yekîtiya Navneteweyî a Xwendekaran" de jî beşdar bû. Di sala 1330'an de bi nûneratiya xwendekarên Îranê di kongireya duyemîn ya vê saziyê de ku di bajarê Pragê de pêk hat, pişikdar bû. Her di vî heyamî de ew wekî nûnerê Îranê li zaf civîn û konferansên Federasyona Cîhanî a Ciwanan di bajarê Budapesta paytexta Mecaristanê de pişikdar bû.

Sala 1331'an di çaxê hukûmeta neteweyî a Dr. Musediq de, Ebdulrehman Qasimlo piştî evê ku ji zanîngeha Pragê lîsansa zanistên civakî û siyasî wergirt, vegeriya Îranê. Wî çaxî di navbera PDK Îranê û saziya Tude a Îranê de yekîtiya teşkîlatî hebû. Heval Qasimlo piştî şeş mehan cehd û tekoşînê ji Tehranê hate Mehabadê û li wir berpirsyariya karê partê girte stûyê xwe.

Piştî kudetaya biyom a sala 1332'an ew neçar ma ku xwe veşêre û bi nepenî di Tehran û Kurdistanê de mijulî karê partê be. Di vî heyamî de heval Ebdulrehman Qasimlo serperestiya rojnameya Kurdistan, organa Komîteya Navendî a PDK Îranê li stûyê wî bû, ku tenê pênc hejmarên wê bi nepenî hatne çap û weşandin. Her di vî heyamî de jî bû ku komîteyeke sertaserî bo karûbarên partê bi serokatiya wî pêk hat.

Heval Ebdulrehman Qasimlo piştî pênc salan tekoşîna siyasî li Îranê û bi xasmanî di Kurdistanê de, sala 1336'an careke din vegeriya Çikislowakiyê. Sala 1337 (1958)'an piştî serkevtina şoreşa Îraqê û vejiyana tevgera Kurd li Kurdistana Îraqê, Dr. Qasimlo tevî çend endamên din ên berpirs di PDK Îranê de cehd kirin ku ji rêya Îraqê ve rêxistinên partê zindî bikin. Lê bi sedema tevdaniya hinek aliyan ew di vî karî de sernekevtin û di sala 1339'an de Dr. Qasimlo

bi biryara dewleta Îraqê ji vî welatî hate derêxistin û vegeriya bajarê Pragê.

Dr. Qasimlo sala 1341 (1962)'an ji zanîngeha Pragê doktoraya zanistên aborî wergirt û heya sala 1349'an di zanîngeha Pragê de dersa aboriya sermayedarî, aboriya sosyalîstî û tiuriya geşandina aboriyê got. Di vî heyamî de Dr. Qasimlo çend pirtûk û namîlke li ser arîşeyên aborî, civakî û siyasî nivîsandine ku a herî bi navûdeng "Kurdistan û Kurd" e.

Ev pirtûka cara yekemîn bi zimanê Çikî hate nivîsandin, lê heya niha bi zimanên Îngilîzî, Silowakî, Lehistanî, Erebî, Kurdî û hinek beşên wê jî bi Feransewî û Farsî hatine çap û weşandin. Dr. Qasimlo zimanên Kurdî, Farsî, Tirkî, Erebî, Feransewî , Çikî û Rusî baş dizanîn û li ser gelek zimanên din jî wekî Almanî û zimanên Silaw heya radeyekê şareza bû. Sala 1349'an piştî derçûna daxuyaniya 11'ê Adarê û lihevhatina li navbera rêveberiya tevgera Kurdan di Kurdistana Îraqê û dewleta Îraqê îmkana tekoşîna siyasî di Kurdistana Îranê de çêtir bû. Di wî çaxî de Dr. Qasimlo ji Ewropayê vegeriya û bi arîkariya çend kes ji hevalên xwe ên nêzîk erkê zindîkirina rêxistinên PDK Îranê girte stûyê xwe. Dr. Qasimlo di konferansa 3'an a partê de ku di meha Cozerdana sala 1350'an de pêk hat, bû endamê Komîteya Navendî û piştî wê bo sekreteriya giştî a vê partê hate hilbijartin. Ew ji wê demê pêde di hemû kongireyên partê de wekî sekreterê giştî hate hilbijartin û bi vî awayî bo heyamê 18 salan wekî rêberekî lêhatî û şareza di pileya yekemîn a berpirsyariyê de karûbarên PDK Îranê di qonaxeke herî dijwar a xebata vê partiyê de rêve bir .

Hevalê xebatkar û mamostayê rêber Dr. Qasimlo li 13.07.1989'an di çaxekî de ku bo peydakirina rêçareyeke aştîxwazane bo pirsa Kurdan di Îranê de bi çend nûnerên rijîma Komara Îslamî re li bajarê Viyenê li ser maseya hevpeyvînê rûniştibûn, tevî hevalê xabatkar kak Ebdullah Qadirîazer endamê Komîteya Navendî bi destê wan bi nav nûnerên dewletê bo hevpeyvînên aştiyê, hatne şehîdkirin. Di vê terora necamêrane de Dr. Fazil Resûl Kurdê Îraqê û mamostayê zanîngehê li Viyenê jî her bi destê van terorîstan şehîd bû .

Çavkanî: Rojnameya Kurdistan, hejmar 163

Ji şîretên şehîdê nemir Dr. Qasimlo

Milletek ku azadiyê bixwaze divêt nirxa wê azadiyê jî bidet. Çi milletek bêy zehmet û tekoşîn, bêy gorîkirina xortên xwe yên egîd negihîştiye azadiyê. Gelê Kurd û partiya me jî ku pêşengê xebata gelê Kurd e, ji mêjve ye vê çendê dizanin ku azadî xwe gorîkirinê dixwaze, xwe bextkirinê dixwaze. Karwanê şehîdên me dirêj e, lê renge ji vê hindê jî dirêjtir be.

Di roja şehîdbûna şehîdên xwe de, di bîranîna şehîdên xwe de, ji mêjve ye ku me biryar daye em qet negirîn. Ji mêjve ye ku me biryar daye tenê û tenê vî karê ku em dikarin bikin û li ber çavên şehîdên xwe şermezar nebin, eva ye ku em rêya wan bernedin û wekî wan heta serî vê rêyê bipîvin, ji çi tengasî û astengekê netirsin, ji çi dijwariyekê nevekêşin.

Xebata me xebateke berheq e, xebat ji bo azadiya milletekî ye, xebat bo pêşeroja zarokan û nivşên dinê ye. Hekî em wekî nivşa niha (Nesla şehîdan) erkên xwe bi başî encam bidin, em dê bikarin hêvîdar bin ku nivşa piştî me şehîd çinebin. Herwisa hekî nivşa rabihurî, an jî nivşên rabihurî bi başî erkên xwe cîbicî kiriban, renge vê nivşa me şehîd çineban.

Lewma bîranînên şehîdêt me careke din me tînne ser vê bawerê ku bi bîr û bawereke qahîm, bi dilekî pir ji şoreş û bi hêviyeke zaf ve, em xebata xwe bidomînin. Encama vê xebatê dibe du tişt: Hem riha şehîdên me şa dike, hem jî gelê me rizgar diket da ku di pêşerojê de me şehîd çinebin.

"Xelata herî baş ji şehîdan re domandina rêya wan e".

Beşa duyemîn:

- Ji gotinên bi nirx ên şehîdê nemir Dr. Qasimlo

Dr. Qasimloyê şehîd pitir ji 40 salan jiyê xwe ji bo xebat di pêxema azadiyê de gorî kiriye. Wî li ser sitratêjiya bizava Kurd, rewşa paşeroja Îranê, Rojhilata Navîn, rewşa navneteweyî û gelek pirsên curbicur ên din bîr û raya xwe eyan kiriye.

"Kurdistan û Kurd", "Çil salan xebat di pêxema azadiyê de", namîlka "Baseke kurt li ser sosyalîzmê", "Pêvajoya aştî û demokratîzasyonê", "basek li ser mudîriyetê", "dîrokeke kurt ji rêberiya PDK Îranê " û bi sedan û bi hezaran gotarên din ku Dr. Qasimlo bi zimanên curbicur di çapemeniyan de belav kirine, hemû bo vê yekê dibin ku şoreşvanên Kurd û rêvîngên rêya rizgariyê bixwînin û ders û şîretan jê wergirin.

Demokrasî û mafê neteweyî yê gelên Îranê

Parastina azadiyên demokratîk û cîgirkirin û qahîmkirina bingeha rijîmeke rastîn di seranserê Îranê de zaminê bingehî a pêşketina şoreşê û destveanîna mafê neteweyî ê tewaya gelên Îranê ye. Bêy hebûna rijîmeke demokratîk mafê gelê Kurd destve nahêt û bêy cîgirbûna mafê neteweyî ê gelê Kurd jî, rijîm bi wateya tewaya peyvê demokratîk nabe. Hekî dijminên gelê Kurd wisa difikirin ku bi gotina hinek qisên wekî cudahîxwaziyê dikarin gelê Kurd neçar bikin ku terze xebateke berevanîkirina ji xwe bigirne pêş û mafê xwe yê berheq nexwazin, gelekî şaş difikirin.

Em xatircem in ku çi rijîmek di Îranê de ku bi rastî gelî, dadmend, û demokratîk nebe nikare pirsa neteweyî ku yek ji astengên bingehî yê welatê me ye çareser biket.

Rastî eva ye ku di Îranê de gelên belengaz pitir ji nîva akinciyên welat pêk tînin. Xwandin bi zimanê dayîkê, parastin û geşandina çanda neteweyî, nehêlana cudahiya siyasî û aborî, û ji tewayan giringtir dîharîkirina muqederê bi destên xwe, beşek ji mafên rewa û berheq ên wan gelan in. nehêlana zilma neteweyî li ser wan gelan, berevajiyê gotinên hinek ji dijminên gel, haydan bo cudahîxwaziyê nine, belkî pêkanîna yekîtiyeke zaf qahîm li navbera gelan, di çarçoweya Îraneke demokratîk de, zaminê parastina hevgirtin û serxwebûna welat e.

Di Îranê de pirsa neteweyî heye û xwe veqelistina ji vê pirsê çi ji bihagiraniya wê kêm naket, berevajî rê ji dujminên azadî û serxwebûnê re xweş diket ku bi qazancê xwe mifahê jê wergirin.

Rolê akinciyên bajaran di tevgerê de

Bajarên Kurdistanê pişta eniya dijmin in, bes di bajarên Kurdistanê de mirov dikare derbên dijwar li dijmin bidet. Nabe em bihêlin dijmin pişta eniya xwe qahîm bike. Tedarokata dijmin Ji bajaran ve têt. Dijmin hêza xwe di bajaran de kom dike û ji wan ciyan ve tedarokata xwe cîbicî diket. Divêt em karekî wisa bikin ku ne tenê li derdorên bajaran ku pêşmerge li wir in rêya dijmin bigrin û derbên giran li wan bidin, belkî divêt di nava bajaran de jî, bi arîkariya akinciyên bajarên Kurdistanê derbê li Dijmin bidin. Nabe ji bîra akinciyên bajaran here ku herçend ew di bajaran de ne, û herçend bi berçav ew bê çek in, lê ew jî pêşmerge ne, wekî pêşmerge di çeperê de ne û divêt bo puçkirina pîlanên dijmin, bo anîna xeberan ji pêşmergan re, û bi berbendkirina rêya dijmin bi her awayekî ku ji destê wan têt erkê li ser milêt xwe encam bidin.

Pirsa Kurdan pirseke navxweyî nine

Pirsa Kurdan di hemû warên xwe de bi vî awayî ku heye di bingeh de pirsa 25 mîlyon Kurd e ku divêt bête çareserkirin. Bi hizra min hekî em bi vî awayî herne pêş, hêvîdariya bi serkevtina me wê zaftir be. Giring jî eva ye ku vê peyama em di vê zirûfa nû de dişînin peyamek be ku bi başî li derve bête wergirtin.Yên ku guhê wan li gotinêt me ne divêt em bêjne wan ku: Daxwazên Kurdan zaf destpêkî û berheq in. Kurd mafê xwe yê neteweyî dixwazin ku di daxuyaniya cîhanî a mafên mirovan de hatiye. Yanî tişteke zêde nine, lewma daxwaza otonomiyê pirseke navxweyî nine. Gelek ji dewletên wekî Îranê dema basa otonomiyê tête kirin dibêjin: Eva pirseke navxweyî ye û kesê heq çinine basê biket. Ku wisa bû pirsa otonomiyê pirseke navxweyî nine û pirsek e ji mafên mirovan. Lewma ew dewlet û rêxistin û kesayetiyên ku xwe bi alîgirê mafên mirovan dihesibînin hewce ye ku piştevaniyê ji daxwazên berheq ên Kurdan bikin.

Rû li gelên Îranê

Min hez dikir ku çend peyveka jî bi neteweyên parên din ên Îranê re biaxivim. Hûn divêt bizanin ku Kurdistan tenê bona otonomiyê şer naket, belkî ji bo azadiya seranserê Îranê xebatê diket. Kurdistan di pêxema rizgariya hemû Îranê de ku li jêr lepê rijîma kedxwar a Axundî de ye şehîdan didet. Lewma erkê li ser milên hemû şoreşvan û azadîxwazên Îranê ye ku arîkariya me bikin. Em dizanin ku rijîma tepeserkar rê nade we, ku hûn arîkariya me bikin, lê rijîm hinde jî xwedîhêz nine ku karbidestên wê bas dikin. Rêya arîkarîkirina bi Kurdistana xunîn vekirî ye. Ji bîra we neçe ku arîkarîkirina bi Kurdistanê arîkariya bi çepera seranserî a Îranê ye ku qet nayê girtin.

Retkirina terorîzmê

Em wekî partiyeke demokrat reşekujiyê ret dikin. Çimku partiyek ku ji aliyê gel ve pişteva nî jê bête kirin çi hewce naket ku hewara xwe bibe ber reşekujiyê. Em terorîzmê li her derê şermezar dikin.

Exlaq di siyasetê de

Em bêusulî û bêhurmetiyê di siyasetê de ret dikin, bo cîgirkirna exlaq di siyasetê de em yekemîn saziya Îranî bûn ku me exlaq anî nava siyasetê de.

Rojnameya "Kurdistan", hejmar 187

Dîktatorî mehkumî nemanê ye

Serkevtina bi ser faşîzmê de gelek dersên bi nirx tê de hene. Ya yekem: Eva ye ku dîktatorî herçend xwedîhêz bin jî, dîsan li hember berxwedana gelan de nikarin xwe ragirin û sernixûn dibin. Ya duyem: Eva ye ku şerxwazî bi merema pelçiqandina gelan, yan hinartina rijîmeke dîharîkirî, encama wê dibe şikest û neman.

Hemen çavkanî

Serxwebûna siyasî

Em partiyeke serbixwe ne û ji her tiştî zêdetir ji serxwebûna xwe re hez dikin. Eva ku bi qazancê me be emê bikin. Çi kes nikare hizra xwe bi ser me de bisepîne û heya niha jî kesê hizra xwe bi ser me de nesepandiye.

Hemen çavkanî

Demokrasî

Qet nabe xebat bo demokrasiyê here jêr sîbera xebat bo mafên neteweyî yan xebata tebeqatî. Çimku demokrasî sedema bingehî a pêkhatina PDK Îranê ye û heya PDK Îranê hebe demokrasî merem û armanca wê ye.(1)

Em demokrasiyê her bi vî terzî ku heye dixwazin yanî demokrasiyeke rastîn, demokrasî bo hemû xelkê û ji bo vê yekê ku ev derfeta hebe da ku hemû saziyên neteweyî bikarin tekoşîna xwe a siyasî bikin û destê xelkê bigihîje azadiyên demokratîk. (2)

Pêdagirtina me li ser demokrasiyê du sebeb hene. Ya yekê eva ye ku em wekî partiyeke demokratîk û gelerî bi rastî me bawerî bi demokrasiyê heye. Em li ser vê bawerê ne ku hebûna demokrasiyê di welat de dikare arîkariyê bi cîgirbûna tewaya daxwazên xelkê Kurdistanê biket. Dîhare em demokrasiyê tenê bo pertiya xwe naxwazin, belkî ji tewaya partî û sazî û girûpan re dixwazin, û di rewşa niha de em cehd û tekoşînê dikin heya ku îmkan hebe ev demokrasî bi kiryar di Kurdistanê de rêve here, û di rastî de bi arîkariya taqm û saziyên din em meşqa demokrasiyê dikin. Lê sebebeke din ya pêdagirtina partiya me li ser demokrasiyê eva ye ku ji bo cîgirbûn û parastina otonomiyê di Kurdistana Îranê de, me çi zamineke din ji bilî demokrasiyê çinine. Ev fikra ku me di Îranê de herêmeke otonomî hebe, lê di parên din de serberedayî deshilatdariyê biket di mejiyê me de cî çinine.

Em naxwazin kite partiya Kurdistanî bin. Em ji her cure daxwazeke qorixçiyane bi dûr in. Îran ya tewaya girûp û saziyên siyasî ye û em tewaya saziyan hazir in arîkariyên hevbeş bi hev re pêk bînin. Lê em dizanin ku kite partiya siyasî a mezin û serûber di kurdistanê de PDK Îranê ye. Lê disan jî em naxwazin ku kite partiya Kurdistanî

bin. Ez li ser vê bawerê me ku hebûna partî û saziyên din ên siyasî li cem partiya me di meşqa demokrasiyê de hevkariya me dikin û heta boçûnên wan girûp û saziyên siyasî dikarin ji partiya me re rênîşander bin. (3)

1- "Kurdistan", hejmar 187
2- Gotûbêja tevî kovara heftane a Comhorî hejmar 7, 26.07.1358'ê Rojî
3-Hevpeyvîn tevî kovara siyasî a Cewan, hejmar 24, 04.03.1358' ê Rojî

Evîna welat

Ez di rastî de gelekî kêfxweş im ku careke din jî di nav koma xelkê xwe û endamên partiyê û pêşmergeyan de me. Welatên din gelekî xweş in, gelek ciyên xweş jî di vê cîhanê de hene, lê ji min re çi yek ji wan welatan hindî welatê min xweş nîinin û hemî carê dema ku ez wedigerme Kurdistanê, ez hest bi kêfxweşiyeke yekcar zaf dikim û dema ku rojên dawiyê ên sefera min tên, ez hinekê jî bilez im da ku hindî zûtir vegerme nav koma hevalan, pêşmergeyan, û gelê xwe de.

"Kurdistan", hejmar 187

Têkiliya bi gelên din ên Îranê re

Sedan sal e ku xelkê Kurdistanê û gelên din bi hev re dijîn. Em xwe bi Îranî dizanin û bi wan kesan ku carna vira û wir de me bi cudahîxwaz dihesibînin dibêjin: Em bi çi awayekî vî heqî nadne çi kesî ku xwe ji me Îranîtir bizane.

Heman çavkanî

Mafê dîharîkirina muqederê ji Kurdan re

Gelê Kurd li warê mafê dîharîkirina muqederê cudahiyek tev gelên din heye û ev jî eva ye ku Kurd di Îraqê, Tirkiyê, û Suriyê de jî dijîn û parvekirineke destçêkirî bi ser xelkê Kurdistanê de hatiye sepandin. Rojekê ku ev pirsa bête holê wekî mafê hevgirtina Kurdan wê xwe nîşan bidet. Min hez nedikir îşarê bi vê yekê bikim (Çimku ji "Tewazoi"ê dûr e) di vî warî de, di pirtûkekê de ku 25 salan berî niha hatiye weşandin, min nivîsandiye ku ez di pêşerojê de bo Rojhilata Navîn federasyonekê pêşdîtin dikim, di vê federasyonê de renge yek ji komarên federatîw ên Rojhilata Navîn Kurdistan be.

Heman çavkanî

Berevaniya berheq

Berevajiyê teblîxata dijminên milletê Kurd, Kurd ne şerxwaz in. Ew daxwazkarê aştiyê ne. Lê dema ku man û hebûna wan wekî neteweyekê dikeve ber tirsê, dîhare bo berevanî ji nasnameya neteweyî û kesayetiya xwe a mirovî neçar in serî hildin.

Heman çavkan

Têkiliya bizava şoreşvan a Kurdistanê bi bizava gelên Îranê re

Bizava gelê Kurd herçend jî xwedîhêz be, ew qasê xwe dikare tenê rijîmê bêhêz biket, û rê bo sernixûniya rijîmê xweş biket, lê qet nikare bi tenê bibe altirnatîw, lewma me berdewam cehd kiriye da ku têkiliya li navbera bizava Kurd û bizavên din ên Îranê xwedîhêz bikin.

Gotûbêja "Atifê Gorgîn" bi Dr. Qasimlo re

Ewa ku em dixwazin:

Em li ser vê bawerê ne ku piştî ceribandina du serberedayiyên tund û tûj yanî serberedayiya Paşatiyê û serberedayiya rijîma Xumêynî, dema vê yekê hatiye ku rijîmeke demokratîk di Îranê de bête avakirin. Em hazir ninin ku bi çi hêzeke alîgirê dîktatoriyê re arîkariyê bikin, em her di bingeh de her terze dîktatoriyekê ret dikin. Em dixwazin bo heta heta dawiyê bi kombûna deshilatê di Îranê de bînin. Em daxwazkarê Îraneke serbixwe û bê alî ne, û em li ser vê bawerê ne ku piraniya hêzan di vî warî de bi me re hevdeng in.

Kovara "Feslî der golê sorx" cildê 3

Ewa ku ji şoreşvanekî/ê re giring e

Bi baweriya min ewa ku ji şoreşvanekî/ê re giring e, eva ye ku qet nabe ew şermezarê wijdana xwe be, û divêt hertim ew bikare vê deiyê biket ku ew hinda ku kariye û ji desta hatiye, di pêxema şoreş, azadî û rizgariya welatê xwe de tekoşîn kiriye.
Belavoka "Camiêyê nowîn we dêmokratîkê Kurdistan" hejmar 1

Suçê xelkê Kurdistanê tenê hildana ala xebatê ye

Suçê xelkê Kurdistanê tenê eva ye ku naxwazin herne jêr barê deshilata sedsalên navîn a Axundan, û di parek ji welatê me yê xweştivî, anku di Kurdistanê de ala xebatê qît ragirtine. Lewma ketine ber kerb û kîna bê reje a Xumêynî û dar û destikên wî.
Heman çavkanî hejmar 4

Kurdistan çepera azadiya seranserê Îranê

Xelkê Kurdistana Îranê daxwaza "Demokrasî bo Îranê û otonomî bo Kurdistanê " dikin, ew li hember deshilata kevneperestane a Axundan de ne tenê her berevaniyê ji hebûn û bihagiraniyên xwe ên mirovî dikin, belkî bo azadiya seranserê Îranê tekoşînê dikin, ev serfiraziya ji bo heta heta ji xelkê Kurdistanê re wê bimîne ku di qonaxên herî dijwar ên dîroka hevçerx a welatê me de Kurdistan kirine çepera rizgariya seranserê Îranê û bo parastina vê çeperê jî canê xwe gorî kirine.
Heman çavkanî

Paşeroja rijîma Komara Îslamî a Îranê

Herçend ku rijîma Komara Îslamiya Îranê bi Xumêynî û çi bêy Xumêynî rijîmeke bê paşeroj e, lê rast nine hekî em wisa bifikirin ku piştî mirina Xumêynî, rijîma wî gelek zû wê sernixûn be. Eva rast e ku praniya xelkê ne li pişta rijîmê ne, lê ev kêmaniya ku ma ye, hesteyeke gelek çir pêk tîne, û tevî vê yekê jî ku yekparçe û yekdest nine, lê berjewendiya wan a hevpar ew bi hevûdu re girê dane û di navbera karbidestên rijîmê de hêdî-hêdî bask pêk hatine : Baskê parêzvan û Baskê guhertinxwaz.

Eyane ku her yek ji van du baskan cehdê dikin ku çeperên xwe qahîmtir bikin û hekî parêzvanan merema wan eva ye ku vê rê û terzê

xwe yê niha yê hişk, tund û negihur bidomînin, guhertinxwaz jî hez dikin hinek ji azadiyên binpêkirî bi rêjeyî sax bikin û wan deriyên ku bi rûyê Rojavayiyan ve girê dane hêdî-hêdî wekin û bi van çareseriyan jiyê Komara Îslamî dirêj bikin.

Gotara Dr. Qasimlo li rojnameya "Lomond"a çapa Parîsê di marsa sala 1982'an de

Ez nizanim ku Xumêynî wê çiqas bijî

Navinciya temen di malbata wî de nêzî sed salî ye, ku wisa bû renge bi van zûkatiya nemire. Lê bi heçî kul û halê heyî heya wî çaxî ku Xumêynî ma be, min jêve nine ku guherînek bête pêş, lê piştî wî, ev rijîma niha yan wê bimîne yan jî şerê navxweyî wê çê be. Min jêve nine ku rijîma Komara Îslamî piştî mirina Xumêynî, her wekî deh salên rabihurî bimîne. Lê eva bi vê wateyê jî nine ku rijîm bi van zûkatiya ji nav here. Çimku Komara Îslamî di van deh salan de kariye ciyê xwe xweş biket, û bi van 250 hezar pasdar û 150 hezar Axundan ku wê hene, di şevekê de nayê guherîn. Lê bi vî halî jî wê guherînên mezin pêk bihên. Çimku ev Axundane bi tenê nikarin astengan çareser bikin, lewma neçar in ku stûyê xwe li hember terze demokrasiyeke çend hizbî de bitevînin, dîhare hilbijartina vê rêyê ji rêyên din, yanî şerê navxweyî, hitbareke zaftir heye. Çimku rewşa Îranê di radeya navneteweyî de bi awayekî ye ku welatên derve rastewxwe qazancê wan tê de heye û Lobnanîkirina Îranê zerereke cobrannekirî wê bigehîne wan hemiyan.

Kurtiyek ji hevpeyvîna Dr. Qasimlo bi nûçegihanê Feransewî re, 15.09.1982'an

Şanaziyeke mezin bo PDK Îranê

Ez dikarim bêjim û rabigehînim ku em ji wan yekem kes û aliyan bûn ku berengarî rijîma Xumêynî bûn û ez li ser vê bawerê me ku di pêşerojê de jî emê kesên dawiyê bin ku berêkaniya me bi rijîma Xumêynî re wê her bimîne.

Hevpeyvîna Dr. Qasimlo tevî rojnameya "Yewmolsabii"

Egera destbirina bo şerê partîzanî

Dema ku di welatekî de serberedayî deshilatdar be, azadî bêne binpêkirin û hurmet ji mafê mirovan neyê girtin, xelkê evîndarê rizgarî û edaletê çimku bi sedema bê hêziya xwe nikarin serhildanekê bi kom yan şoreşeke gştî bo bidawîanîna deshilata navendî rê bêxin, rêyeke din ji bilî destbirina bo şerê partîzanî nabînin.

Gotara Dr. Qasimlo li jêr navê "Şerê partîzanî û zext û givaş"
"Kurdistan", hejmar 124

Hinek miraz, xwazî û xwastekên Dr. Qasimlo ji zimanê wî bixwe ve

Pirseke bingehîn bo min di jiyana min de jinavbirina zilm û zorê bûye, bo nehêlana zilm û zorê min ji destpêka gencitiya xwe pêde hetanî niha dest kiriye bi xebatê. Çi guherînek bi ser vê taybetmendiya min ya bingehîn de nehatiye. Dîhare min di jiyana xwe de zaf ceribandin li ser hev danîne û bi gştî ez "waqiibîn" bûme. Ez di jiyana xwe de hertim xweşbîn bûm û di zirûfên herî dijwar de jî min ruhiya xwe parastiye. Niha jî ez her wisa me. Ez gelek ogirê xwandinê me. Di Kurdistanê de ez tewaya wan kovar û rojnameyên bîhanî û Îranî dixwînim. Ez gelek ogirê xwandina roman û pirtûkên zanistî me, ez ji helbestan re pir hez dikim. Em di Kurdistanê de şeva helbestan pêk tînin û ez helbestan dixwînim. Ez gelek ogirê helbestên kilasîk ên Îranî me, bo mînak: Hafiz, Seidî, Xeyyam, Baba Tahirê Oryan û Firdosî. Dîhare helbestên Kurdî jî bi taybetî helbestên Goran ku helbestvanekî sedsala bîstan e, û Ehmedê Xanî jî ku helbestvanekî kilasîk ê Kurd e. Ji helbestvanên nû jî Nadir Nadirpûr û Ehmedê Şamlû bi dilê min in. Dîwanên wan min hene û Perwîn Êitisamî jî gelek bi dilê min e, bi bawera min helbestên wê gelek bi jiyana min nêzîk in. Di zirûfa niha de her wekî tu dizanî tekoşîna siyasî bi taybetî di demekê de ku tu berpirs bî û şerê navxweyî jî hebe, astengan te re tîne pêş ku mixabin tu nikarî bi awayekî sîstematîk û bi dilê xwe ogiriya xwe bi helbestan yan muzîkê bidî xûyakirin.

Yek ji wan arîşeyên ku di jiyana min de heye, pirsa şehîdbûna hevalên min ên nêzîk in, di rastî de eva yek ji wan nerehetiyên herî mezin e ku di jiyana min de hene. Niha hekî min bikarîba bixwe

biryarê bidim, min hez dikir ku mijulî zanistê bam û li ser pirsên çandî û toreyî ên Îranê xebitîbam. Lê niha di Kurdistanê de ez erkdarim û li hember xelkê Kurdistan û Îranê de hest bi berpirsyariyê dikim.

Pirsyar: Ez dixwazim pirseke din ji te bikim. Erê gelo bi bawera cenabê te piştî 10, 15 an 20 salên din tu dê mijulî çi bî, û li kuderê bî?

Dr. Qasimlo: Di vê zirûfa ku em tê de ne, ez nikarim pêşdîtinê bikim, pêşdîtin karekî pir îza ye. Ez hez dikim piştî çend salên din hekî ji destê min bihêt, mijulî karê zanistî û nivîsînê bim. Niha nêzîkî 40 sala ye ku ez di xebatê de beşdar im, ez hez dikim ceribandinên xwe binivîsim. Lê her çawa be ez hez dikim ku di nav xelkê de bim. Niha min xwe bi vê zirûfê ve girtiye, lê dûrbûna ji xelkê sivîl, bo min pir zehmet e, û hêvîdar im zirûfek bête pêş ku welatê me bibe welatekî serbixwe û êmin, û di vê zirûfê de ez di gundekî Kurdistanê de, bo mînak gundê "Qasimlo" de -Renge hûn nezanin ku gundekî hankî heye, me navê xwe ji vî gundî wergirtiye -runêm û heta ku mabim bixwînim û binivîsim.

Hevpeyvîna nûçegihanê B.B.C Bêhruz Yusifzade bi Dr. Qasimlo re

Beşa sêyemîn:

- Dr. Qasimlo û tevgerên rizgarîxwaz

Dr. Qasimlo û bizava azadîxwaziya Kurdan

Hekî îro em dibînin PDK Îranê wekî partiyeke şoreşvan û pêşketî roleke berçav di bizava neteweyî a gelê Kurd de dilîze û bi lêzanî û şarezayî ve rêveberiya bizava gelê Kurd di Kurdistana Îranê de diket, divêt em vê rastiyê qebûl bikin ku beşeke berçav a vê şanaziyê vedigere ser cehd û tekoşîna şehîdê nemir Dr. Qasimlo. Çimku ew bû ku nêzîkî 20 salan rêberiya PDK Îranê kir û piştî şehîdbûna xwe jî rê û rêbazeke serrast a siyasî, teşkîlateke qahîm, û pirestîjeke bilind a navneteweyî ji PDK Îranê re bi cî hêla. Heyamekî dûr û dirêj bû ku beşeke berçav ji xortên gelê Kurd tûşî bê baweriya bi xwe, û bi hêz û şiyana xwe a xebatkarane bibûn. Ew çavnihêr bûn ku ji derve, û di encama guherînên siyasî ên cîhanê de hêzek an dewletek bêt û wan rizgar biket. Dr. Qasimlo ev cure bîrkirina ret kir û em hîn kirin ku di her rewşekê de Kurd divêt bi hêz û şiyana xwe piştrast be, û cehd û tekoşînê biket da ku bi xebata bê rawestan pirsa Kurd bikete pirseke giring û micid li berhevdana rewşa Rojhilata Navîn û cîhanê de, û bikare ji guherînên herêmî û cîhanî bi qazancê xwe mifahê wergire. Dr. Qasimlo em hîn kirin ku gelê Kurd divêt arîkarî û piştevaniya derve wekî sebebkarekî hevkarîkirinê bihesibîne.

Bi dirêjahiya dîroka bizava neteweyî a gelê Kurd yek ji xalên jar ên vê bizavê eva bûye ku muqedera bizavê û muqedera rêber an kesayetiyekê pêkve hatiye girêdan, û jirêderketin û neman, yan jî jidestçûna wî kesayetiyê bûye sedema şikesta vê bizavê. Di vî warî de jî Dr. Qasimlo çi di warê bînarî (Tiurî) ve, û çi di qada kiryarê de, bi dijî pêkve girêdana rêberekî, kesayetiyekî an malbat û eşîrekê sekinî û karê bi tebayî (Destêcemî) û rêberatiya bi tebayî anî nava çanda bizava Kurd de, û bi hemû şiyana xwe dijberî mezinkirina rolê kesayetî û boçûna eşîretî û paremayiyane sekinî û bi awayekî gelek lêhatî ji bo xwedîhêzkirina rolê teşkîlatê di bizavê de xebat kir û di nava teşkîlatê de jî, dijberî her cure kiteserkêşiyekê (Tekrewiyê) sekinî.

Dr. Qasimlo herwisa qala vê çendê kiriye ku bona gihîştina bi armancên pîroz û berheq ên gelê Kurd divêt emrazekî berheq û pîroz bihête bikaranîn. Nabe rê bête dan ku ev bizava berheq di nava bîr û raya giştî a cîhanê de bête lekedar kirin [Yanî nabe êxsîrkuştin, reşekujî, girtin, lêdan û îşkence hebe]. Di vî warî de jî Dr. Qasimlo bandoreke zaf li ser bizavê danî û encama vê bandorê jî gelek ji mêjve ye eyan bûye. Bi salan bû ku bizava neteweyî a Kurdan ji destê serhişkî û berçavtengiya neteweyî, herêmî, olî û hizbî de bendewar bû. Dr. Qasimlo bi hemû şiyana xwe dijberî van boçûnên şaş sekinî û çanda demokrasî û piloralîzmê anî nava bizava neteweyî a Kurdan de. Wî gelek caran bi qazancê giştî a bizavê, berjewendiyên demî ên xwe jî didanîne qeraxê. Ji mêjve bû ev boçûna di nav xortên gelê Kurd de bibû carr, ku gilî û gazindeyan ji welatên curbicur bi taybetî Sovyetistana berê bikin ku çima wan bi dijminên maf û azadiyên gelê Kurd re têkilî hene, bazerganiyê bi wan re dikin û heta çek û teqemeniyan jî difiroşne wan. Dr. Qasimlo da zanîn ku herçend ev gazinda berheq û rewa ye, lê ev çavnihêriya tevî rastiyan û siyaseta îro yek nagire. Çimku mixabin cîhana îro cîhana qazancperestiyê ye û dewletên cîhanê berî her tiştî bona destveanîna berjewendiyên xwe dixebitin.

Dr. Qasimlo tekoşîn ji bo rizgariya neteweyî bi erkê li ser milêt tewaya tex û qatên welatparêz ên civaka Kurdan dizanî û li ser vê bawerê bû ku tewaya tex û qatên îro ên civaka Kurdan dikarin di xebata neteweyî de beşdar bin û rolekî hêja tê de bilîzin. Dr. Qasimlo bi berhevdana hûr û zanistiyane ya rewşa îro a cîhanê jêre îsbat bibû ku armanc û erkên niha û pêşerojê ên bizava neteweyî a Kurdan tevî berjewendiyên împeryalîzmê û hêzên Kevneperest ên herêmê dijber in, û hekî bizava Kurdan ber bi pêşva here, guherîneke berçav di herêma Rojhilata Navîn de wê pêk bîne. Lewma bizava Kurdan bi çi awayekî nabe baweriyê bi hêzên împeryalîstî û kevneperest biket. Dr. Qasimlo ku bixwe wekî rêber û kesayetiyekî lêhatî li nav bizava Kurd de hertim di hember dîroka neteweya xwe de, her siyasetek girtiba pêş, li hember vê yekê de hest bi berpirsyariyeke mezin dikir, wî ev hest bi berpirsyariya, kire beşek ji çanda siyasî di nav bizava Kurd de.

Dr. Qasimlo hevçax tevî evê ku li ser vê bawerê bû ku divêt bizava Kurd bi awayekî baş li hember vê tirsa ku gefê li man û hebûna neteweya Kurd diket bisekîne, bi tewahî îman jî bi vê yekê hebû ku rêçareya pirsa Kurd leşkerî nine. Lewma wî tewaya şiyan û lêhatiya xwe bi kar dianî da ku pirsa Kurd ji rêya aştî û danûstandinan ve bête çareserkirin. Di qada dîplomasiya navxwe a Kurdistanê de jî Dr. Qasimlo siyaseteke rast û usulî berçav girt û bi kiryar jî ev siyaseta rêve bir. Ew li ser vê bawerê bû ku partî û saziyên Kurdistanî her di vê demê de ku hewce ye têkiliyên dostane û bi biratî bi hev re hebin, û li ser pirsên giştî ên bizava neteweya Kurd bi hev re hevkariyê bikin, nabe bi çi awayekî destêwerdanê di nava karûbarên yektir de bikin.

Dr. Qasimlo li ser vê bawerê bû ku bizava neteweyî a Kurdan çimku bizaveke berheq e, şiyan û ciyê vê hindê heye ku bibe pirseke cîhanî û neteweyî. Lewma bo nasandina pirsa Kurd bi bîr û raya giştî a cîhanê gelekî cehd û tekoşîn kir û di rastî de jî rolê Dr. Qasimlo di vî warî de bê heval bû. Dîhare mirov di gelek warên din de jî dikare rolê Dr. Qasimlo di nav bizava Kurd de bêxe ber bas. Çimku di rastî de ew mirovekî birumet û xebatkarekî lêhatî yê gelê xwe bû, lewma şehîdbûna wî wekî erdhejeke xwedîhêz û mezin, gişt Kurdistan hejand û bû karesateke neteweyî.

Rojnameya "Kurdistan", hejmar163

Beşa çaremîn:

- Dr. Qasimlo û bizava seranserî a Îranê

Dr. Qasimlo û bizava seranserî a Îranê

Dr. Qasimlo xebatkarekî mezin yê rêya serxwebûna Îranê bû. Wî her çawa ku di nava PDK Îranê de baweriyeke zaf bi serxwebûna partiya xwe hebû, serxwebûna welatê xwe jî bi yekemîn şert û mercê pêşketinê dizanî. Ew bi tewahî ji girêdayîbûna Îranê bi her deshilateke bîhanî bêzar bû, û xebata wî û partiya wî dijberî destêwerdana siyasî, aborî, çandî û leşkerî a împeryalîzmê di Îranê de mînakek ji vê bêzariyê ye.

Ew dijberî her terze cehd û tekoşîna deshilateke derekî bo berbendkirina rêya serxwebûna welatê me bû. Dr. Qasimlo bi dirêjahiya jiyê pir ji xebat û tekoşîna xwe ev rastiya pîroz ji bîr nekir ku biryar li ser muqedera welatê me mafê bê qise a gelên Îranê û hukûmetekê ye ku nûneratiya xwastek û daxwazên wan diket. Eva qiseyek nine ku em tenê bona yad û bi bîranîna rêberê xwe yê şehîd bêjin. Karnameya bi dehan salî xebata bê rawestiyan, û herwisa nivîsîn, û hevpeyvînên Dr. Qasimloyê şehîd, û di encam de rêbaza siyasî û bi kiryar ya partiyekê ku Dr. Qasimlo rêberiya wê dikir vê rastiyê nîşanî me didin. Dr. Qasimlo serxwebûna Îranê bi yekemîn armanca hevpar a tewaya hêzên şoreşvan û resen ên welat, û sedemeke giring bona li hev nêzîkkirin û hevgirtina opozîsyona pêşketinxwaz a welat dizanî.

Rêberê me ê mezin ji wê rojê pêde ku wekî Kurdekî têkoşer û wekî xebatkarekî Îranî pê danî qada xebatê de, û refên PDK Îranê ji bo xebat û tekoşînê hilbijart, bo sernixûniya rijîma Paşatiya Îranê bi can û dil ve xebat kir. Piştî sernixûniya rijîma Paşatiyê di encama serhildana bi coş a gelên Îranê di sala 1979'an de jî, Dr. Qasimlo li her derfeteke baş de tirsa vegeriyan û sepandina vê sîstemê dianî bîra gel û hêzên welatperwer ên Îranê. Wî bona sernegirtina her terze cehd û tekoşîneke împeryalîzmê û paşmayiyên Nizama Seltenetî di vê derheqê de daxwaza serwextî, hevpêngavî û yekîtiya kiryarê ji hêzên opozisyonê dikir. Dijberiya Qasimloyê şehîd bi Nizama Seltenetî re seba vê yekê bû ku vê nizamê nedikarî serxwebûna welat û cîgirkirina demokrasiyê di Îranê de qebûl biket, û ne jî dikarî bersîva daxwazên neteweyî û civakî ên gelên jêrdest û tex û qatên zehmetkêş yên welatê me bidet. Wî hertim ev yeka dianî bîra

hevwelatiyan ku di welatekî paşvemayî wekî Îranê de Şah ku xwediyê çi cîpêyeke civakî di nav welat de nine, di encam de dibe dîktator û welat ber bi girêdayîbûnê (Wabestigî) ve dibet. Di van cure welatan de deshilat bi tewahî di destê Şah de kom dibe û vê yekê jî tevî armancên bizava seranserî a Îranê û daxwazên gelê Kurd, ku divêt xelk di deshilatê de beşdar bin û beşek ji deshilata navendî bi gelên jêrdest bihête dan netebayî heye. Her lewma Dr. Qasimlo alîgirê Nizama Komarî bû û Nizama Komarî bi altirnatîwek dizanî ku hewce ye tewaya hêzên şoreşvan û pêşketinxwaz ên welat bo vê yekê ku nizameke weha bînne ser kar xebatê bikin.

Dr. Qasimlo bo vê yekê ku hem xelkê welatê wî hest bi azadiyê û bikaranîna îradeya xwe di dîharîkirina muqedera welatê xwe de bikin û hem jî otonomiya gelê Kurd di paşerojê de zamineke ciyê hitbarê hebe, nizameke wisa ya Komarî dixwast ku bingeha wê li ser piloralîzmê hatibe avakirin.

Rêberê me yê şehîd li ser vê bawerê bû ku tenê hukûmeteke demokratîk û nizameke çend hizbî dikare welat di vê zirûfê de ber bi pêşketin û bexteweriyê ve bibet. Wî gelek caran ev tirsa dianî bîra partî û saziyên siyasî ên Îranê, ku di welatekî wekî Îranê de ku ji netewe û olên curbicur pêk hatiye, xwe sepandina her netewe û olekê bi ser ên dinê de, û bi kurtî her terze pawanxwaziyek li deshilat bi destvegirtinê de yekîtiya nîştimanî (Temamiyetê erzî) a welatê me diêxe xeterê û Îranê ber bi şerekî navxweyî ve dibet. Dr. Qasimlo giringiyeke taybetî dida hêzên xebatkar ên welatê xwe û bizava neteweyî-demokratîk a xelkê Kurdistana Îranê tevî bizava seranserî a welatê me, bona evê ku rê nehête dan ku di paşerojê de çi deste û taqmek bi tenê deshilata welat di destê xwe de qorix biket. Wî ev yeka ji bîr nedikir ku destvegirtina hukûmeta Îranê mafê taybetî û bi tenê a çi sazî û desteyeke taybetî nine, û pêwîst e tewaya partî û sazî û beşên civakê pêka nifûza xwe li dîharîkirin û destvegirtina deshilata welat de rolê xwe hebin. Ew dijberî her terze dîktatorî û pawanxwaziyekê di nava welatê me de bû, û bi şanazî ve digot: "Ez demokrasiya herî xirab ji dîktatoriya herî baş çêtir dizanim".

Rêberê şehîd ê partiya me rê nedida çi kesî ku xwe ji wî û ji her Kurdekî/e Îranî, Îranîtir bizane. Ew her tim ji vê yekê bêzar bû ku ew

bixwe û gelê wî di çarçoweya Îranê de hevwelatiyê pile du bêne hesêbandin.

Dr. Qasimlo nehêlana stema neteweyî li ser xelkê Kurdistana Îranê bi rêçareyek dizanî da ku xelkê Kurdistanê di welatê xwe de hest bi vê yekê nekin ku hevwelatiyê pile du ne, û bi hevwelatiyên dinê re hest bi wekheviyê bikin. Dema ku Dr. Qasimlo yan gelê wî bi cudahîxwaz dihatne suçbarkirin, bi eşkere digot: "Ev hukûmetên ku gelê Kurd û gelên din ên jêrdeste Îranê, li jêr bindestî û zilm û zorê de dihêlin, welat ber bi parvebûnê ve dibin. Hekî ne, di welatekî de ku tewaya gelên pêkhînerê wî welatî hest bi vê yekê bikin ku serbest in û muqedera wan di destê wan bixwe de ye, qet bîra cudahîxwaziyê nakeve mêjiyê wan de.

Dr. Qasimloyê şehîd li ser vê bawerê bû ku gelê Kurd li Kurdistana Îranê bi gelên din ên Îranê re xwedî dîrok, çand, salux û qazancên siyasî ên hevpar e, û hekî zilm û zora neteweyî li ser nemîne ev girêdayîbûna bi civak û welatê Îranê wê qahîmtir be. Lê Dr. Qasimlo her bi tenê daxwazkarê çareseriya pirsa neteweyî a xelkê Kurdistana Îranê nebû. Wî bona destveanîna mafê neteweyî yê tewaya gelên jêrdest ên welatê xwe tekoşîn dikir. Lewma jî wî alîgirî ji her bernameyeke hevpar dikir bona hevgirtina hemû hêzên siyasî ên Îranê li ser bingeha destveanîna mafên xwe ên neteweyî. Dr. Qasimlo bi xebata gelên belengaz ên welatê xwe yanî: Belûç, Azerî, Ereb û Turkemenan dilxweş bû, û her terze meşeke rizgarîxwazane a wan bi berpaleke qahîm bo bizava şoreşvanî a gelê Kurd li Kurdistana Îranê û beşeke giring ji bizava seranserî a Îranê dihesêband. Wî cehd dikir da ku partiya wî ji çi terze tekoşînekê bo avakirin û qahîmtirkirina têkiliya bi şoreşvanên gelên jêrdest ên Îranê re, û arîkariya tevî wan xemsariyê neket. Wî nizameke Federalî bi şêweyeke herî baş bo çareseriya pirsa neteweyî ji welatê xwe re dizanî.

Xaleke dinê derheq Dr. Qasimlo û tevgera seranserî a Îranê giringîdana rêberê me ê şehîd, bi hevgirtin û yekîtiya hêzên demokrat û pêşketinxwaz ên welat e. Ew ji wan kesayetiyên Îranî ên mezin bû ku hertim alahilgirê hevbendî û yekbûnê di nava hêzên xebatkar ên Îranê de bû. Çi hêzeke siyasî a Îranê nahê dêtin ku beşek ji tekoşîna

xwe anîbe Kurdistanê û PDK Îranê jî hevkariya wê nekiribe. Dr. Qasimlo pêngavên weha bona lihevhatin, û hevgirtina tevî hêzên siyasî ên Îranê bi tiştekî baş dizanî. Hekî em dibînin ku di peyamên sersaxiyê yên praniya saziyên siyasî ên Îranî seba terora Qasimloyê şehîd de, rêz û hurmet ji bo tekoşîna wî seba qahîmkirina yekîtiya di navbera hêzên opozisyona xebatkar a Îranê hatiye girtin, ew yeka tiştekî bê sebeb nine. Rêberê me yê şehîd li ser vê bawerê bû ku terzê herî baş bo hevkariya di navbera hêz û sazî û kesayetiyên demokrat û pêşketinxwaz ên di Îranê de pêkanîna eniyeke demokratîk û dijî împeryalîstî ye. Eniyek ku hem rijîma dijîgelî a Axundî sernixûn biket, û hem jî altirnatîweke demokratîk be ku bikare bersîva armancên şoreşa gelên Îranê bidet.

Dr. Qasimlo hekî bo PDK Îranê rêberekî şareza û kêrhatî bû, bo gelên Îranê û bizava seranserî a welatê me jî xebatkarekî mezin û pêşengekî jêhatî bû. Bê şik û guman her çawa ku xelkê Kurdistanê şanaziyê bi rêberê xwe dikin, gelên Îranê jî şanaziyê bi hevwelatiyekî mîna Dr. Qasimlo dikin, û boçûnên wî derheq bizava seranserî a Îranê dikne rêweker û rênîşanderê xwe.

Lewma şehîdbûna wî ne tenê ji gelê Kurd re, belkî bo her Îraniyeke xudanşeref kul û kovaneke mezin bû.

***

Beşa pêncemîn:

- Rolê Dr. Qasimlo di PDK Îranê de

Rolê Dr. Qasimlo di PDK Îranê de

Xizmeta hevalê şehîd Dr. Qasimlo bi PDK Îranê hinde mezin û eyan e ku bo hergav di dîroka PDK Îranê de wê zindî bimîne. Ew bû ku piştî çend salan ku PDK Îranê ji rê derketibû vegerande ser rêbaza pêşketî a wê xwe, û her ew jî bû ku bi tewaya şiayana xwe berevanî ji serxwebûna biryardanê di PDK Îranê de kir û em hîn kirin ku di pêxema vê serxwebûnê de her nirxekê bi erzan bizanin.

Ya rastî eva ye ku baskirina ji rolê Dr. Qasimlo di PDK Îranê de gelek ji vê hindê meztir e ku di çend rûpelên vê pirtûkê de bête cî dan. Ew kesê ku tewaya jiyana xwe a siyasî di refên PDK Îranê de bihurandiye, û gişt salên jiyê PDK Îranê gewahyarê tekoşîna wî a xwedîçeleng in, û li ser hev nêzî 30salî rolê yekemîn di rêberiya PDK Îranê de hebûye, gelek ji vê hindê mezintir e ku di çend xet û rûpelan de basê wî bête kirin. Hekî em bixwazin rolê wî di PDK Îranê de bi heq bas bikin, divêt em basekê bi dirêjahiya van çendîn salan binivîsin ku jiyana PDK Îranê û muqedera Dr. Qasimlo bi hev re girêdaye. Ku wisa bû her hinde ji destê me têt ku em gelek bi kurtî qala çend beşek ji tekoşîna wî di PDK Îranê de bikin.

1- Dewrana piştî kudetaya 28.05.1332'an:

Partiya Tude a Îranê ku piştî sala 1332'an li encama pêkhatina yekîtiya rêxistinî di navbera wê û PDK Îranê de rêberiya partiyê bi kiryar di destê wê de bû, ketibû davka polîs de û dezgeha polîs nifûz kiribû nava refên wê de. Ji alîkî din ve jî PDK Îranê hem serxwebûna biryardanê û hem jî heya radeyeke zaf kesayetiya xwe wekî partiya pêşeng a neteweyeke belengaz ji dest dabû. Di rewşeke hankî de Dr. Qasimlo ku berpirsyariya Komîteya seranserî a PDK Îranê li stûyê wî bû, di konferansa yekemîn a PDK Îranê de pêşniyaza veqetandina PDK Îranê ji Partiya Tude li warê siyasî û rêxistinî ve anî holê, û bi hevkariya komek ji heval û hevbîrên xwe ev pêşniyaz di konferansê de da pejirandin.

Veqetandina PDK Îranê ji partiya Tude di vê rewşa dijwar de ne tenê bibû sedema rizgarbûna refên partiyê ji davka polîsên rijîma Mihemed Rizaşah, belkî bi yekcarî û bo hergav kevirê xîmê serxwebûna siyasî û biryardana PDK Îranê hate danîn, bêy ewê ku

ev partiya ji rêbaza xwe a pêşketinxwazane derkeve û bikeve nava gêjava antîkomonîzmê û nasyonalîzma berçavteng de. Hekî em binihêrne muqedera xembar a Firqeya Demokratîk a Azerbaycanê, ku wextekê gelek ji PDK Îranê xwedîhêztir, û pan û berfirehtir bû, wî çaxî emê têbigihîjin ku veqetandina têkiliya rêxistinî û siyasî ji Partiya Tude ku bi cehd û tekoşîna şehîde nemir Dr. Qasimlo cîbicî bibû, çi xizmeteke mezin bi PDK Îranê û bizava neteweyî a Kurdan di Kurdistana Îranê de kir.

2- Sala 1349'an:

PDK Îranê nêzî 10 salan bû ku bi kiryar ji rêbaza xwe a pêşkevtî derketibû. Usulên hizbî heya ew beşa ku di peyrewa navxwe ya pejirandiya kongireya duyem de hatibû, ew jî bi tewahî pişt guhê xwe ve awêtibûn.

PDK Îranê di encama bizava çekdariya sala 1346-1347'an de ku ji aliyê hinek ji kadroyên şoreşvan ên PDK Îranê ve hatibû rêxistin gelek ji kadroyên xwe ên herî baş ji dest dabûn, rêxistinên PDK Îranê bi kiryar hatibûne hilweşandin û ji tewayan giringtir PDK Îranê bibû peyrewê siyasetên partiyeke dinê a Kurdistanî, û di rastî de şûnwarek ji serxwebûna siyasî û serxwebûna biryardanê nemabû. Di rewşeke weha de Dr. Qasimlo ku rojekê bi haydana beşek ji endamên rêveberiya wî çaxî a PDK Îranê ji Îraqê hatibû derêxistin, ji Ewropayê vegeriya û bo zindîkirina rêxistinên, PDK Îranê , nasandina PDK Îranê bi partî û saziyên Îranî, Kurdistanî û bîhanî, cîgirkirina serûberî, û dîsîplîna şoreşvanî di PDK Îranê de, û vegerandina PDK Îranê bo ser rêbaza wê a pêşketî û di encam de destveanîna serxwebûna biryardanê, zendêt xwe vedan. Karê vê qonaxê sebir, hewsele, kar, û tekoşîneke bê rawestan hewce bû. Lewma Dr. Qasimlo bi hevkariya hinek hevkarên dilsoj ên rêberatiyê bi îradeyeke zaf ve dest bi kar bû. Bo cara yekemîn di dîroka PDK Îranê de Dr. Qasimlo kilasa perwerdekirina kadriyê bi terzeke serûber û nû danî, û beşeke zaf ji dersên kilasa siyasî wî bixwe digotin.

Serbarê nerazîbûna hinek kesan ku adet kiribûn biryaran bidne PDK Îranê , û berevajiyê dijberiya ewên ku adet kiribûn biryaran ji

derveyî PDK Îranê wergirin, bi cehd û tekoşîn û zehmeta Dr. Qasimlo rojnameya Kurdistan, wekî organa Komîteya Navendî hate weşandin. Dr. Qasimlo bi mifah wergirtina ji bername û peyrewa navxwe a çendîn partî û saziyên siyasî û bi berçavgirtina zirûfa taybetî a Kurdistanê terhê bername û peyrewa navxwe a nû ji PDK Îranê re berhev kir, ku bi hevkarî û hevfikriya hevalên wî yên nêzîk bi dawî hat, û bo pejirandinê bire konferansa sêyemîn (Di sala 1350'an de) û kongireya sêyemîn (Di sala 1352'an de). Çareseriya du pirsan di vê qonaxê de zanayî û hurdekariyeke taybetî hewce bû. Ya yekemîn: Zindîkirina deb û resmêt demokratîk ên PDK Îranê û vegerandina PDK Îranê bo ser rêbaza wê ya pêşketinxwazane, bêy ewê ku taybetmendiyên neteweyî danne qeraxê û ev yeka bibe sebebê ji xwe bîhanîbûnê.

Ya duyemîn: Destveanîn û parastina serxwebûna siyasî û biryardana PDK Îranê bêy ewê ku ev kare bibe sebebê pêkhatina dijminatiyê di navbera PDK Îranê û wan aliyên ku pêştir biryar didane PDK Îranê. Lê PDK Îranê niha bi rênîşandan û rêveberiya Dr. Qasimloyê nemir her du pirs bi terzê herî baş çareser kirin û serxwebûna biryardana xwe destve anî, bêy ewê ku bibe sebebê dijminatiya çi aliyekê bi partiya wî re.

Dr. Qasimlo xwestekên neteweyî û demokratîk mil bi milê yektir di bernameya PDK Îranê de cî dan û xebat jêre kir, bêy ewê ku di navbera wan de çi netebayiyek pêk bihêt.

3-Serdemê piştî sernixûniya deshilata Paşatiyê û cîgirbûna deshilata Axundan di Îranê de:

Her partî û saziyeke siyasî bi mifahwergirtina ji rewş û hewayê vekirî yê siyasî, û wê kême azadiya piştî şoreşê, pêkhatina xwe radigehand. Bîr û rayên curbicur berevajiyê yektir û heta dijberî yektir dihatne belavkirin, diruşmên tund û tîj xurt bibûn, yekê daxwaza xulamokiyê bo Sovyetistana berê dianî holê, û yekî din ew welat bi sosyal împeryalîst dihesiband, û nêzîkbûna bi vî welatî suç dizanî. Yekê daxwaz dikir ku bi du rojan dem û dezgehên hukûmeta Axundan- ku bi hukûmeta xelkê û hasila şoreşê jî dihate naskirin - nav hevde bête pêçandin, û yê din ew dewlet dijberî împeryalîzmê

dihesiband û her terze berengariyeke bi vê dewletê re suçeke mezin dizanî. Serbarê vana hemûyan Partiya Tude dîsan sertaze nifûz kiribû nava refên PDK Îranê de û di nava vê partiyê de mijulî tevdaniyê bû.

Rewşeke hankî rêberekî şareza mîna Dr. Qasimlo dixwast ku bikare di nava vê gerava fikrî û siyasî de, rêya rast hilbijêre û ber nedet. Ew ne bi vê hindê razî bû ku partiya wî bibe xulamokê welatên sosyalîstî, ne rê bête dan ku dijminatî tevî welatên sosyalîstî, û berî tewayan tevî Sovyetistana berê di nava PDK Îranê de cî bigire, ne desta ji daxwazên siyasî, civakî û çandî ên gelê Kurd û gelên Îranê bikêşe, ne mafê neteweyî ê gelê Kurd bête jibîrkirin. Ne teslîmî rijîma kevneperest a Axundî be û ne rêya çi terze cehd û tekoşîneke aştîxwazane bo çareseriya pirsa gelê Kurd bête berbendkirin.

Bi vî awayî PDK Îranê di qonaxeke hankî dijwar a xebata gelê Kurd de li jêr rêberatî û rênimayiyên Dr. Qasimloyê nemir de rêbazek xwe re hilbijart ku ji tewayan pitir bersîvderê rewşa jiyan û tekoşîna rizgarîxwazane a gelê Kurd di Kurdistana Îranê de bû. Bihurîna meh û salan jî bi hemûyan da zanîn ku kîjan partî û sazî heta ser wê di qada xebatê de bimîne. Di rastî de rolê Dr. Qasimlo di PDK Îranê de bo tewaya xebatkarên PDK Îranê , û xortên gelê Kurd û rizgarîxwazên Îranê eşkere ye.

***

Beşa şeşemîn:

- Hevpeyvîna Dr. Qasimlo bi weşana **Rahê Eranî** re
- Hevpeyvîna radyoya BBC bi Dr. Qasimlo re

Çend beşek ji hevpeyvîna Dr. Qasimlo tevî weşana "Rahê Eranî" organa Komîteya Navendî a Partiya Demokratîk a Xelkê Îranê di havîna sala 1988'an de

Pirsyar: Diruşma PDK Îranê "Demokrasî bo Îranê û otonomî bo Kurdistanê" ye. Pêşêxistina demokrasiyê bi wateya li pêşbûn û hewcehiya cîgirbûna demokrasiyê û rijîmeke demokratîk di Îranê de ye. Erê gelo di Kurdistanê de bêy guherîneke demokratîk wê otonomî destve bihêt?

Bersîv: Di pirsyara pêşde min beşek ji bersîva vê pirsyarê da, lê ez dixwazim zêde bikim ku em demokrasiyê li pêş otonomiyê de didanên, ew jî bi du sebeban: Ya yekemîn eva ye ku em partiyeke bi tewahî demokratîk in û me bi demokrasiyê li navxwe a partiyê, û piloralîzmê li drveyî partiyê yanî di hundirê welat de baweriyeke zaf heye. Lewma em pitir li ser demokrasiyê tekez dikin. Piştî şoreşê hekî ez nebêjim em yekem sazî bûn, renge em yek ji wan saziyan bûn ku me pirsa demokrasiyê wekî pirseke sereke anî holê. Wî çaxî ku hinek ji saziyan bi hêceta ewê ku rijîma Xumêynî dijberî împeryalîzmê ye, bibûne peyrewê vê rijîmê, me dîsan pirsa demokrasiyê anî holê. Herwisa me qala vê çendê kir ku çi rijîmeke bi rastî dijberî împeryalîzmê nikare bi vî awayî demokrasiyê di sertaserê welat de binpê, û komkujiya xelkê Kurdistanê biket. Bi kiryar jî eyan bû ku em heq bûne. Lê me egereke din jî heye bo evê ku em demokrasiyê danne pêş otonomiyê. Em wisa danên ku em otonomiyê di Kurdistana Îranê de destve bînin. Ji bo parastina otonomiyê em ji du rêyan zêdetir nabînin. Yan divêt em çekdar bin û bi kelaşînkofê berevaniyê ji otonomiyê bikin, yan jî divêt rewşek bête pêkanîn, ku li dirêjheyam de ji otonomiya me re bibe zamin. Em ji bilî demokrasiya seranserî a Îranê û cîgirbûna demokrasiyeke rastîn di Îranê de çi zamineke din ji otonomiyê re nabînin. Lewma em hergav li ser demokrasiyê di navxwe a Îranê de tekez dikin.

Pirsyar: Pirsyara min eva bû ku erê gelo bêy guherînên demokratîk îmkana destveanîna otonomiyê heye an ne?

Bersîv: Têkiliya demokrasiyê bi otonomiyê re têkiliya beş (Cozi) bi gişt (Kol) re ye. Ez naxwazim bikevme nava wajeyên felsefî de, lê di warê felsefî de ev yeka rast e ku gişt (Kol) bingeh e, û dîharî diket, lê

beş (Cozi) jî bandora xwe heye. Di rastî de gişt (Kol) ji beşa (Eczai) pêk hatiye. Yanî em wisa danên ku rojekê em Komara Îslamî neçar bikin ku vê otonomiya em di Kurdistana Îranê de daxwaz dikin bipejirîne, bi bawera me eva bixwe serkevtinek e ji demokrasiyê re. Çimku wî çaxî di beşeke Îranê de demokrasî cîgir bûye. Lê herwisa ku min di bersîva pirsyara pêşde got, ew rewşa yanî Komara Îslamî ji alîkî û otonomî ji alîkî din ve, ew jî otonomiya ku PDK Îranê wekî partiyeke laîk daxwazkarê wê ye, nikarin bo demeke dirêj bi hev re bijîn. Lê ez bawer im ku hekî em rijîma Komara Îslamî neçar bi paşvekêşanê bikin, û bo bîstekê wisa bifikirin ku ew otonomiya ku em dixwazin, ew bipejirîne, wî çaxî eva haydanek e bo tewaya gelên Îranê, da ku ji bo cîgirbûna demokrasiyê xebata xwe tundtir bikin. Ya duyem: Eva ye ku Kurdistan wî çaxî di rewşeke çêtir de wê bibe çeper ji tewaya azadîxwazên Îranê re. Bi vî awayî ez vê yekê mihal nizanim, lê di rastî de li dirêjheyam de hekî em wisa bifikirin ku me otonomî hebe bêy cîgirbûna demokrasiyê di Îranê de, bo me îmkan çinine.

Pirsyar: Ew sedemên ku PDK Îranê neçar kirine da ku daxwaza otonomiyê li çarçoweya Îraneke azad û serbixwe de bîne holê çi ne? Erê gelo eva diruşmeke taktîkî ye, yan daxwaza we ya sitratêjîkî ye?

Bersîv: Ezê ji beşa duyem a pirsyara we de dest pê bikim. Bo neteweyeke belengaz wekî neteweya Kurd pirsa bingehî çî ye? Mixabin di Îranê de heta beşek ji hevalên me jî gelek bala xwe nadne vê pirsê. Hinek li ser vê bawerê ne çimku Kurdistan di warê aborî de paşvemayî ye, divêt em rewşa aboriya Kurdistanê çêtir bikin. Hinek dibêjin çimku xwendegeh kêm hene gereke bihagiraniyeke zaf bi hînkirinê bihête dan. Helbet evne bi tewahî hewce ne, lê çareserkirina pirsa neteweyî li çi yek ji vana de nahête xulasekirin. Tenê neteweyên belengaz dikarin hest bi zilm û zorê bikin, lewma nehêlana zilm û zorê jî dikarin fam bikin û ev jî eva ye ku xelk gereke hest bi vê yekê bikin ku di welatê xwe de ne bîhanî ne, û ne hevwelatiyê pile du ne, û di wê herêma ku tê de dijîn, deshilat di destê wan de ye. Ev hesta ji tewayan giringtir e, û ezê li vir de dest pê bikim. Bi baweriya min mafê dîharîkirina muqederê mafekî bê bas

û gengeşe ye ji bo tewaya gelan. Em jî alîgirê cîgirbûna mafê muqedera xelkê Kurdistanê di Îranê de ne, û di vê rêyê de xebatê dikin.

Eva helbet naweroka daxwaza me ye. Mafê dîharîkirina muqederê nawerok e, û dikare çendîn terzên xwe hebin. Yek ji terzên wê otonomî ye. Em wekî partiyeke berpirs û rastbîn bi li berçav de girtina tewaya rewşa siyasî û erdnîgariya welatê xwe û herêmê, gihîştine vê encamê ku rêçareseriya herî baş ji me re destveanîna otonomiyê ye di Îraneke demokratîk û Kurdistaneke xudmuxtar de, ku hem ew hesta xelkê ku min îşare pê kir, û hem jî mafê dîharîkirina muqederê wê cîgir be. Lê bi giştî avakirina welatên kuşke di dawiya sedsala 20'an de bi çi awayekî tevî pêşketina teknolojî û aboriyê li sertaserê cîhanê de yek nagire û berevajiyê gelek welatan (Lê carê ez li ser bazara hevpar a Ewropayê behs nakim), welatên Amrîkaya Latîn û welatên Erebî û hwd… jî dixwazin ku yekîniyên (Wahidên) meztir pêk bînin. Em li ser vê bawerê ne ku ji xelkê Kurdistanê re ev yeka gelek giring nine ku me nûnerek di saziya neteweyên yekbûyî de hebe, û alaya xwe û wahideke diravî a "Rayic" hebe. Ev qonaxa di rastî de ji hêla dîrokî ve kevin bûye. Ji me re ya giring eva ye ku em bi ser muqedera xwe de zal bin. Di navxwe a welatekî wekî Îranê de wahideke meztir wê bikare hevkariya tewaya gelên Îranê bo aliyê xwe rakêşe. Dema ku mafê wan yê neteweyî bête dan, pêşketina civakî û aborî a Kurdistanê jî wê bileztir bigihîje encamê. Eva çendîn sedsal e ku xelkê Kurdistana Îranê bi gelên Îranê re dijîn. Em xwe Îranî dizanin û bi wan kesên ku carna vira û wir dibêjne me hûn cudahîxwaz in, em dibêjne wan ku bi çi awayekî em vî heqî nadne çi kesî ku xwe ji me Îranîtir bizane. Lê hekî hûn binihêrne bernameya PDK Îranê hûnê bizanin ku diruşma "Demokrasî bo Îranê û otonomî bo Kurdistanê" diruşmeke sitratêjîkî ye, ne diruşmeke taktîkî. Hekî me xwastiba ji Îranê cuda bin, me çi tirsek çinebû. Neteweyên gelek kuşke hene ku daxwaza serxwebûnê kirin û gihîştne serxwebûnê jî. Ew xulyaqeta ku Pulîsarya nûnerê wan e, sed hezar kes in, lê em serxwebûnê naxwazin. Ez dixwazim zêde bikim ku hinek kes dibêjin otonomî qonaxek e di pêşerojê de bona serxwebûnê. Em berpirsyarê ewa ku nivşên dinê bixwazin nînin, her çawa ku nivşên berî me

berpirsyarê daxwazên me ên niha nebûn. Niha karê me siyaset û rastî ye. Dewrana me dewrana otonomî û demokrasiyê ye. Ez bawer im bi sedema aborî û pêşketina teknolojiyê cîhan pitir ber bi aliyê entigrasiyona aborî yan pêkhatina wahidên meztir ên aborî ve diçe pêş.Wisa têtе çavnihêrkirin ku di sala 1992'an de praniya welatên Ewropa a Rojava bibne wahideke aborî a tewaw. Bi vî awayî di rewşeke weha de bi bawera min tekoşîn bona avakirina welatên mînyatorî durust nine. Tevî vana hemûyan jî ez dixwazim bêjim ku mafê dîharîkirina muqederê bo Kurdan, cudahiyek tevî mafê gelên din heye, ew jî eva ye ku Kurd di Îraqê, Tirkiyê û Suriyê de dijîn û parvekirineke destçêkirî li ser xelkê Kurdistanê de hatiye sepandin. Roja ku ev pirsa bête holê, yê wekî mafê yekîtiya Kurdan bête holê. Min nedixwast ku qala vê çendê bikim (Çimku ji xwe bi kêmzanînê dûr e) lê di pirtûkekê de ku 25 salan berî niha hatiye weşandin, min hizra xwe di vî warî de nivîsandiye ku ez di pêşerojê de bo Rojhilata Navîn federasyonekê pêşdîtin dikim. Di vê federasyonê de renge yek ji Komarên Federatîw ên Rojhilata Navîn Kurdistan be. Lê derheq xelkê Kurdistanê ez dikarim bêjim di Kurdistana Îranê de, ne PDK Îranê û ne jî çi girûpeke din a siyasî nahê xûyakirin ku ji bilî otonomiyê daxwazeke dinê hebe. Dema ku piştî şoreşê me pirsa otonomiyê anî holê, hinek ji wan girûpan ev druşma wekî druşma borjewazî û ne ciyê qebûlkirinê ret kirin. Bo mînak Komelê seba evê ku vê druşmê nifûz kire nav civatên xelkê de, û xelkê ev druşma qebûl kir, neçar ma ku di bernameya xwe de otonomiyê cî bidet. Ez dixwazim ku vê yekê jî bêjim ku hinek kes di Îranê de ji otonomiyê ditirsin, nizanim bo çi? Di gelek welatan de otonomî hatiye cîgirkirin û çi cudabûnek jî pêk nehatiye. Bo mînak dewleta Îspanyayê otonomî daye Katalonê. Me yasaya otonomiya Katalonê xwandiye û wergêrandiye.

Başe em yasayeke hankî wekî bingeh qebûl dikin, û heya niha jî we nebihîstiye ku Katalona paytexta Barsilonayê bixwaze ji Îspanyayê cuda be. Pirsa cudabûnê di holê de nine. Bo çi di Îranê de ev pirsa bi vî awayî di holê de ye? Druşma demokrasî bo Îranê û otonomî bo Kurdistanê druşma me a bingehî ye, diruşma me a sitratêjîk e, û bi vî awayî jî di bernameya me da hatiye û qet jî druşma me a taktîkî nine.

Em naxwazin ku ne xwe û ne jî xeelkê bixapînin, û di rastî de hekî diruşma me ji bilî vê yekê ba, me dê bi rohnî ew yek anîba ber bas.

Pirsyar: Ez bawer im ku kongireya we a heştan hevçax bûye tev kongireya "Muesisan" a Partiya Demokrat a Xelkê Îranê, di beşek ji rapora Komîteya Navendî de ku ji partî û saziyên siyasî ên Îranê re hatiye şandin, çi îşareyek bi partiya me nehatiye kirin. Niha ku sened û belgenameyên Kongireya "Muesisan" li ber destê we de ne, kerema xwe ji me re şirove bikin ku helwêst û nirxandina we li ser partiya me çî ye?

Bersîv: Ez divêt gelek bi eşkereyî bêjim ku me hêla nirxandineke bi hurî li ser tekoşîna saziya we nekiriye. Sedema wê jî eva bû ku dem bo vî karî kêm bû. We kongireya xwe pêk aniye, û helbet em di Ewropa de najîn da ku li cî de medrekên we bigihîjne destê me. Tevî vana hemûyan jî pirseke giştî di weşanên we û senedên kongireya we de berçav dikeve, û ew jî berçavgirtina siyaseteke demokratîk e. Em fikir dikin ew sosyalîzma ku hûn di Îranê de alîgirê pêkhata (Saxtara) wê ne, hûn ji demokrasiyê cuda nakin. Çimku druşma dirêjheyam a PDK Îranê sosyalîzma demokratîk e. Bi vî awayî em we saziyeke nêzî PDK Îranê dibînin, û em hêvîdar in ew xeta ku we hilbijartiye hetanî serî bipîvin û serkevtî bin, lê ewa ku girêdayiyê nirxandina serrast û helwêsta fermî a partiya me derheq we ye, ez bawer im ku di pêşerojeke nêzîk, ne hinde dûr de, wê eyan be, û her eva ku ez vira rûniştime û bi we re dipeyvim, hetmen sebebek heye.

Pirsyar: We çi peyamek ji xwendevanên me û hêzên çep ên Îranê re heye? Çavnihêriya we ji hêzên çep û pêşketî çî ye?

Bersîv: Dema ku min got demokrasî berî her tiştî ye, yek ji pirsên bingehî ên demokrasiyê pirsa çep e. Bêy hebûna çepeke serbixwe ,xwedîhêz û azadbîr demokrasî nikare di Îranê de cîgir be. Bi vî awayî em dîsan jî wekî partiyeke demokrat hem seba demokrasiyê û hem seba otonomiyê gelekî hez dikin ku çepeke Serbixwe û xwedîhêz di Îranê de bête avakirin. Çimku mixabin niha tişteke wisa em nabînin. Jevbelavî di nava hêzên çep de gelekî zor e. Em li ser vê bawerê ne ku hekî demokrasî zaminek e ji otonomiyê re, hebûna çepeke xwedîhêz, serbixwe, "xellaq" û azadbîr di Îranê de, di rastî de zaminek e ji otonomiyê re. Ji mêjve ye em gihîştine vê encamê ku

em dikarin vê rijîmê neçar bi paşvekêşanê bikin, em dikarin heta rewşekê pêk bînin ku rijîm ber bi sernixûniyê ve here. Lê em bi çi awayekî nikarin bi tenê di Îranê de altirnatîv bin. Em qet nikarin bi tenê ji Komara Îslamî re bibne cîgir, û çimku me baweriyeke zaf bi piloralîzmê heye, lewma tewaya cehda me eva ye ku li beşên din ên Îranê de em hevalbendan xwe re peyda bikin. Lewma her wekî hûn agehdar in, em cehd û tekoşînên zaf dikin bo evê ku eniyeke pan û berfireh ji hêzên demokratîk û ji kesayetiyan pêk bînin, û emê wan tekoşînan bidomînin. Eva ku hêla enî (Cibhe,bere) pêk nehatiye, bi çi awayekî nabe sedema evê ku em desta ji tekoşînên xwe bikişînin. Çimku em dizanin ku jevbelavî û dijberî zor in, "Dugm" zor e, û di gelek saziyan de demeke zaf hewce ye da ku "Dugm" ji nav herin û rewş ji eniyê re berhev bibe. Ez bawer im pêvajoya wan guherînên ku min pêşdîtin dikirin ku li pêşerojê di welatê me de wê pêk bihên, bi qebûlkirina agirbesê dest pê bûye, û bi çûna Xumêynî wê bileztir here pêş. Di rewş û hewayekî azadtir de îmkanatên pitir ji bo pêkanîna eniyeke hankî wê cîbicî bin, û helbet dîsan emê bêne ser pirsyara we, û ez ducarî dikim ku eniyeke hankî bêy hebûna çepeke xwedîhêz, "Xellaq", serbixwe û azadbîr nikare bi qasê hewce pêş bikeve.

Hevpeyvîna Radyo BBC tevî Dr. Qasimlo 07.12.1988'an

Pirsyar: Kerema xwe li derbarê Saziya Navneteweyî a Sosyalîst û Entirnasyonala sosyalîst me re biaxive?

Bersîv: Entirnasyonala Sosyalîst piştî şerê cîhanî ê duyemîn pêk hatiye û nêzîkî sed partiyên sosyalîst û demokrat û saziyên rizgarîxwaz di vê Entirnasyonalê de endam in an jî zêrevan in.

Pirsyar: Ew mijara ku ji aliyê PDK Îranê ve di kombûna Civata Ewlekariya wan partiyên sosyalîst de hate pêşniyaz an jî pejirandin çi bûn?

Bersîv: Naweroka vê piştevanî ji mafê neteweyî-demokratîk û mirovî ê gelê Kurd bû, û her wisa eva bû ku xelkê Kurdistanê bi awayekî giştî alîgirê aştiyê ne, lê ev aştiya nabe bi zerera çi yek ji gelên Rojhilata Navîn û bi taybetî gelê Kurd be.

Pirsyar: Ji wî çaxî pêde ku di navbera Îran û Îraqê de aştî hatiye ragehandin û agirbes pêk hatiye çi guherînek li rewşa Kurdan de pêk hatiye?

Bersîv: Ji wî çaxî pêde ku agirbes hatiye ragehandin, di Kurdistana Îranê de rijîma Xumêynî xwe ji bo îrişeke pan û berfireh bi dijî pêşmergeyên Kurdistanê hazir kiriye. Lê ev îrişa çimku piştî şer ruhiya efradên çekdar ên rijîmê hatiye xwarê, hinde serkevtî nebûye û di encam de di Kurdistana Îranê de guherîneke zaf pêk nehatiye.

Pirsyar: Di Kurdistana Îraqê de çawa? Erê gelo we kuştara kîmyayî a Kurdan pirotesto kir?

Bersîv: Belê me ew kuştar pirotesto kir, Îranê jî kîmyayî bi kar anî bû, lê ne hindî Îraqê.

Pirsyar: Rewşa Kurdên Îraqê niha çawa ye?

Bersîv: Min hajê rewşa Kurdên Îraqê nine, lê pêka sala borî rewşa wan xirabtir bûye, di kombûna Şêvra Entirnasyonala Sosyalîst de nûnerên YNK'ê jî beşdarî kiribûn.

Pirsyar: Erê gelo girûpên curbicur ên Kurdên Îranî dijberiyên di navbera xwe de çareser kirine an ne?

Bersîv: Di Kurdistana Îranê de ez ji bilî du saziyan çi saziyên din nas nakim, ew jî PDK Îranê û Komele ne. Mixabin di salên borî de hinek şerê çekdarî di navbera wan du saziyan de pêk hat ku ciyê nerehetiyê bû. Lê eva heyamek e ku bi kiryar çi şer çênebûne, renge sedema wê jî eva ye ku saziya Komelê îdî çelengiyeke wisa di nava Kurdistanê de çinine.

Pirsyar: Niha ku qewl û qirar e di navbera Îran û Îraqê de aştî pêk bihêt, erê gelo çi rêyek heye bo aştiya di navbera we û dewleta Îranê de ?

Bersîv: We hetmen hajê heye ku em hergav bi vê yekê hatine gunehbarkirin ku em dixwazin bi dewleta Îranê re rûniştinan pêk bînin, lê di rastî de heya niha çi danûstandinek pêk nehtiye û dewleta Îranê jî siyaseta xwe derheq gelê Kurd di Kurdistanê de neguheriye. Li îdamên van dawiyane di Îranê de, gelek ji endam û alîgirên partiya me jî hatne îdamkirin, bi vî awayî bi vê siyasetê ez nizanim mirov wê çawa bikare tevî rijîmê mozakirê biket û li ser çi bingehekê.

Pirsyar: Çelengiya we niha çawa ye? yanî erê gelo guherînek li terzê çelengiya siyasî an jî çelengiya leşkerî a we de pêk hatiye?

Bersîv: Her wekî min erzî xizmeta we kir guherîneke zaf pêk nehatiye, çimku rijîma Xumêynî di rastî de ew cura ku di bernameya xwe de cî dabû, nekarî tevgera Kurdistanê tepeser biket, di encam de çelengiya me di warê leşkerî de di gund û çiya de, û di warê siyasî dedi nava bajaran de her wisa dom heye, û ez fikir dikim rewşa me roj bo rojê bi taybetî di warê siyasî de baştir dibe, çimku rijîm niha roj bo rojê zêdetir zeifên wê eşkere dibin, û xelkê Kurdistanê ku her ji destpêkê ve bi dijî rijîmê bûn, niha yekparçe di hember rijîmê de rawestane.

Pirsyar: Bi baweriya we pişteveniya partiyên sosyalîst ên navneteweyî yan eslen sazî û girûpên rojavayî ku bi taybetî piştî kuştara kîmyayî ji Kurdan zêdetir bûye çi bandorekê dikare li ser rewşa Kurdan danêt?

Bersîv: Lê binêrin, me di Kurdistanê de gotineke pêşînan heye dibêjin, "Dijminek jî zor e lê hezar dost kêm in", me hewceyî bi peydakirina dostan heye û her kesê pişteveniyê ji xebata me biket emê pêşwaziyê jê bikin. Ez bawer im ku saziya Entirnasyonala Sosyalîst saziyeke gelekî pan û berfireh e. Her wekî min got nêzî 17 partiyan di vê saziyê de xudan dewlet in, û partiyên sosyalîst ên gelek xwedînifûz jî hene ku hêla deshilata siyasî negirtine dest, ku di vê saziyê de jî xwedî çeleng in. Çend roja berî niha bû ku berendamê partiya sosyalîsta Wênzoilayê bû serkomar. Bi vî awayî pişteveniya partiyên sosyalîst û demokrat û helbet her pişteveniyeke din bo me bihagiraniyeke zaf heye, û armanca me eva ye ku em bîr û raya giştî a cîhanê ji ewa ku di Kurdistanê de diqewime agehdar bikin. Çimku mixabin zanyariyên xelkê cîhanê li ser Kurdistanê gelekî kêm in.

***

Beşa heftemîn:

1- Kurdistan û Kurd
2- Baseke kurt li ser sosyalîzmê

"Kurdistan û Kurd", pirtûka bi navûdeng a Dr. Qasimlo

"Kurdistan û Kurd" lêkolîna siyasî û aborî a Dr. Qasimlo ye. Dr. Qasimlo di sala 1957'an de dest bi nivîsandina vê pirtûkê kiriye, û ev pirtûka di sala 1962'an de bo çapê berhev bûye. Di sala 1964'an de bi zimanê Silowakî hatiye çap û weşandin. Di sala 1965'an de bi zimanê Îngilîzî hatiye çapkirin. Vê pirtûkê du çapên Îngilîzî hene, çapa yekem a binkeya akadimiyê li Pragê ye, û çapa din jî a binkeya Kolêtz e di Lendenê de. Çapa Erebî cara yekemîn di sala 1967'an de ji rûyê çapa Îngilîzî ve hatiye wergêrandin. Ev pirtûka li sala 1969'an di Werşoya paytexta Lehistanê de ji aliyê binkeya weşana Polonî (Lehistanî) a "Pirtûk û Zanist"ê ve, ji rûyê çapa Îngilîzî ve bi Polonî hatiye wergêrandin û çap û belav bûye. Di sala 1970'an de çapeke kurtkirî a Erebî ji aliyê navenda weşana Lobnanê ve li Beyrutê hate weşandin, ku ev çapa li ser izna nivîskar bû. Di sala 1973'an de ev pirtûka ji aliyê Mamosta Ebdullah Hesenzade ve bi zimanê Kurdî (Zarawayê Kurmanciya jêrîn) hatiye wergêrandin, û çap û belav bûye. Di sala 1991'an de ev pirtûka ji aliyê Elîşêr ve bi zimanê Kurdî (Zarawayê kurmanciya jorîn) û bi pîtên Latînî hatiye wergêrandin, û çap û belav bûye.

Dr. Qasimlo derheq çapa pirtûka xwe bi zimanê Kurdî weha dibêje: "Çapa Kurdî (Kurmanciya jêrîn) di eslê xwe de ji rûyê çapa yekem a Erebî ve hatiye wergêrandin. Lê mixabin hinek ciyên çapa Erebî ku ji rûyê çapa Îngilîzî ve hatibûne wergêrandin gelekî serrast nebûn û paçvedarê Kurd jî tûşî gelek arîşeyan bibû, lewma ez neçar mam ku careke din jî bera xwe bidme naweroka çapa Kurdî a vê pirtûkê hemûyê, û gelek ciyan jî destêwerdim. Niha çapa Kurdî wekî ewê ye ku ji Îngilîzî ve hatibe wergêrandin. Dr. Qasimlo herwisa dibêje: Pirtûka **Kurdistan û Kurd** wextê xwe bo bîhaniyan hatiye nivîsandin, lewm hinek tiştên wisa tê de hene ku bo xwendevanên Kurd wekî tişteke zêde xuya ye. Lê dîsan jî di vî warî de min nexwast ku destêwerdim û biguherim. Min gelek cehd kiriye da ku ev her çawa ku di destpêkê de hatiye nivîsandin herwisa jî bigihîje

destê xwendevanê Kurd, û ji bilî hinek ciyên gelek hewce min tişteke wisa neguheriye.

Profisor Martînîts di pêşgotina çapa Îngilîzî de nivîsandiye: Pirtûka Dr. Qasimlo **Kurdistan û Kurd** bo nasandina pirsa Kurd bi giştî û hinek warên vê pirsê bi taybetî nirxeke bê hevta heye. Kovara siyaseta navneteweyî -hejmar 10, sala 1965'an Prag –li ser vê pirtûkê nivîsandiye :

Eva cem me kite pirtûkek e (Renge her tenê cem me jî wisa nebe) ku bi dirêjahî basa pirsgirêka aloz a Kurdan diket û her wisa bi awayekî bê hevta esîl û serrast e. Çimku nivîskar aborîzanekî Kurd, û zana û xwediyê ceribandineke zaf a siyasî ye. Ev rêya ku nivîskar li berhevdana pêkhata civakî û aborî de berçav girtiye, hetanî îro jî di wêjeya aborî a me de ku li ser arîşeyên welatên geşekirî lêkolînê diket bê hevta ye, û bingehek e ji bo lêkolîneke weha li ser welatên din. "Kurdistan" kovara salane a xwendekarên kurd li Ewropa, Lenden, sala 1970'an di vî warîde de nivîsandiye: Dr. Qasimlo di nava wan lêkolînên ku li ser Kurdan hatine kirin, ciyekî taybetî heye. Ev terze lêkolîneke pêşeng e, li ser siyaset û civaka Kurdîniyê di tewaya parên Kurdistana parvekirî de. Dr. Qasimlo ne tenê her boçûneke nûjen û zanistî heye, belkî hemû aliyên arîşeyên Kurdan bi hûrî û bi tewahî ber hev dikêşe.

Li ser bergê çapa Silowakî a **Kurdistan û Kurd**, sala 1964'an, Biratsîlawayê hatiye nivîsandin: Me gelek negotiye hekî em bêjin ku xwendevanê Silowak bi vê pirtûkê nivîsîneke kêmxuya dest wî dikeve. Ev pirtûka cehd û tekoşînek e bo eyankirina arîşeyên Kurdan ji dîtingeha marksîstî ve.

***

Baseke kurt li ser sosyalîzmê

Rêberê zana ê PDK Îranê bi weşandina namîlkeyekê li jêr navê "Baseke kurt li ser sosyalîzmê" di sala 1362'an de ku piştî çend mehan di kongireya 8'an de hate pejirandin, tevî îşarekirina bi hewceyiya danîna sosyalîzmê bo destveanîna dada civakî di Îranê û Kurdistanê de, ev sosyalîzma şirove kir ku PDK Îranê dixwaze di paşerojê de cîgir biket.

Naweroka vê namîlkê pêkhatibû ji:

-Pêşgotin
1-Sosyalîzm: Armanca paşeroja partiya me
-Sosyalîzm çima armanca "Paşerojê" ye
2-Sosyalîzm çî ye?
-Sosyalîzm û Sermayedarî
-Sosyalîzm û Kar
-Sosyalîzm û aborî
3-Sosyalîzma Mucud
-Sosyalîzm di Yekîtiya Şorewî de
-Sosyalîzm di welatên Ewropaya Rojhilatî de
-Welatên sosyalîstî û Demokrasî
4-Sosyalîzm û rewşa welatê me
5- Helwêsta me li hember welatên sosyalîstî de
-Kurte qise…

Xwendevanên hêja !

Vira de ezê gelek bi kurtî qala hinek ji beşên vê namîlkê bikim.

1-Sosyalîzm: Armanca paşeroja partiya me

Yekem pirsyara ku tête holê eva ye ku PDK Îranê ku partiyeke Marksîst yan Marksîst-Linînîst yan Komonîst û bi awayekî giştî partiya taybet bi kedkar nine, çima basê sosyalîzmê diket?

Bersîva vê pirsyarê eva ye ku PDK Îranê herçend ku partiyeke demokratîk-neteweyî ye, lê di hemen demê de partiyeke pêşeng e. Pêşeng bi vê wateyê ku dixwaze tevî çareserkirina pirsgirêka neteweyî, yanî destveanîna mafê neteweyî ê gelê me, arîşeyên civakî jî çareser biket. Li danana armanceke weha de me ne tenê bala xwe daye ceribandinên neteweyên din ên cîhanê, belkî me bala xwe daye ceribandinên rabihurî ên gelê Kurd bi taybetî jî.

Ev ceribandinane kîjan in? Ev ceribandinên ku hasila xebata gelê Kurd bûne nîşan dane: Partiyek ku dixwaze hankî gelê Kurd rêberî biket, herçend ku partiyeke nasyonalîste tewaw eyar jî be, yanî tenê bixwaze pirsa neteweyî çareser biket, wê bes bigihîje wê ciyê ku ji alîkî ve arîşeyên civakî çaresernekirî bihêle, û bi vî awayî destveanîna mafê neteweyî dê pirseke bê vêc be, û ji alîkî din ve jî mirov nikare pirs û arîşeyên civakî berçav negire, bes lewma wê partiyeke din bête avakirin ku li ser çareserkirina pirsên hankî tekezê biket, û bi vî awayî beşeke zaf ji zehmetkêşên Kurdistanê dê bikêşe bo aliyê xwe.

Ev partiya her di destpêkê de, yanî ji sala 1946'an pêde partiyeke pêşeng bûye û ji sala 1971'an pêde hetanî niha bernameya wê bi xasmanî li ser bingeha çareserkirina du pirsgirêkên neteweyî û civakî hatiye avakirin.

Pirsa neteweyî: Naweroka vê pirsê di rastî de destveanîna "Mafê dîharîkirina muqederê" ye. Mirov dikare vî mafî bi çend şêweyan destve bîne.

1-Serxwebûn
2-Federalîzm
3-Otonomî

Me bi berçavgirtina rewşa Kurdistanê û zirûfa taybetî a Îranê, û rewşa giştî a gelê Kurd di Rojhilata Navîn de, me otonomî hilbijartiye û em li ser vê bawerê ne ku bi cîgirbûna otonomiyê pirsa neteweyî a gelê Kurd di Îranê de bi awayakî navincî (Nisbî) wê bête çareserkirin, û piştî wê rê ji bo çareseriya pirsên civakî û jinavbirina paşvemayiya civaka me wê xweş be.

Derheq pirsên civakî: Bi bawera me rêçareya pirsên civakî bi awayekî bingehî cîgirkirina sosyalîzmê ye. Bingeha sosyalîzmê di rastî de jinavbirina pelçiqandina (Îstismara) mirov bi destê mirov e. PDK Îranê dixwaze behrekêşiya ji mirov di civakê de bi tewahî bête binbirkirin, lewma PDK Îranê cîgirkirina sosyalîzmê wekî armanca paşeroja gelê me daniye.

Sosyalîzm çima armanca "Paşerojê" ye?

Gereke em bala xwe bidnê ku ji bo gihîştina bi armancê divêt mirov qonax bi qonax here pêş û bo her qonaxekê jî divêt mirov diruşmeke xasmanî hebe. Bi awayekî giştî her partiyeke siyasî sê druşm hene:

1-Diruşma "Roj"
2-Diruşma "Taktîkî"
3-Diruşma "Sitratêjî"

Qonaxa sitratêjîk ji çend qonaxên taktîkî pêk hatiye. Her wekî me îşare pê kir li dirêjahiya çend salên rabihurî de me çend caran taktîka xwe guheriye, lê me diruşma xwe a sitratêjîk ku "demokrasî bo Îranê û otonomî bo Kurdistanê" ye, çi wê demê ku me piştevanî ji rijîma Xumêynî dikir, û çi di wextê şerê sê heyve de, çi wî çaxî ku em bi berpirsyarên dewletê re mijulî hevpeyvînê bûn, û çi jî niha ku me diruşma sernixuniya rijîmê aniye holê, me druşma xwe herwisa wekî xwe hêlaye.

Bi vê pêkê qonaxa sitratêjîk dirêj e û renge 5 , 10, û heta 25 salan û zêdetir jî dom biket. Dirêjbûna qonaxa sitratêjîk sedem û hokarên zaf hene û bi xasmanî bi vê pirsê ve girêdayî ye ku me li qonaxeke taktîkî de çende serkevtin destve aniye û heta çi radeyekê ji taktîkên hewce mifah wergirtiye.

Bi giştî bernama siyasî a her partiyekê bo qonaxeke sitratêjîk berhev dibe, û bernameya partiya me jî hankî ye. Bo cîgirkirina sosyalîzmê sê qonaxên sitratêjîk hene:

Qonaxa yekem destveanîna otonomiyê ye.

Piştî destveanîna otonomiyê pêkanîna rewşa pêdivî bo peyakirina sosyalîzmê qonaxa duyem pêk tîne. Hekî PDK Îranê bikare piştî destveanîna otonomiyê, li dirêjahiya 25 salan de bernameya xwe a niha rêve bibet, serkevtineke dîrokî a gelek mezin destve aniye.

Piştî peyabûna bernameya PDK Îranê emê bernameyeke nû bi merema cîgirkirina sosyalîzmê berhev bikin, ku eva qonaxa sêyemîn e. cîgirkirina sosyalîzmê bi xwe heyamekî zaf hewce ye û renge em jiyana du an sê neslan jê re danên.

Cîgirkirina sosyalîzmê rêçareya bingehî a pirsên civakî ye.

2-Sosyalîzm çî ye?

Em wekî partiyeke şoreşvan û rastmêze (Waqiibîn) cehdê dikin ku bi giştî zilma neteweyî ji nav bibin, da ku xelkê me hest bi vê yekê biket ku bi ser muqedera xwe de zal e û dikare çanda gelê xwe pan û berfireh biket. Lê di hemen demê de jî em cehdê dikin ku berî her tiştî zehmetkêşên Kurdistanê ku piraniya gelê Kurdistanê pêk tînin,

bigehînne mafên wan xwe yên aborî û civakî, û rêya gihîştina bi hêviyeke weha ji bilî cîgirkirina sosyalîzmê çi tişteke din nine.

Beşa heştemîn:

- Şehîdbûna Dr. Qasimlo

Kul û kovaneke mezin

Roja înê 22.04.1368 (13.07.1989)'an ku roja Cêjna Qurbanê yekemîn cêjna mezin a bisilmanan bû, nûçeyeke dilêş kul û kovaneke mezin êxiste dilê hemû xebatkarên PDK Îranê, civatên xelkê Kurdistana Îranê û bi giştî xortên gelê Kurd. Nûçeya şehîdbûna rêberê mezin ê gelê Kurd Dr. Qasimlo sekreterê giştî ê PDK Îranê, heval Ebdullah Qadirîazer endamê Komîteya Navendî û nûnerê partiyê li Ewropayê, û Dr. Fazil Resûl Kurdê Îraqî û rûniştiyê Utrîşê, û mamostayê zanîngehê li Viyenê, bi destê terorîstên Komara Îslamî a Îranê. Vê nûçeyê cejn û xweşî li Kurdan kire şîn û tazî, çimku di rastî de kul û kovaneke mezin bû.

Dr. Qasimlo çawa kete tevlikê de, û çawa bû ku bi piyê xwe çû kuştargehê? Bidawîhatina şerê Îran û Îraqê di gelek kom û komikên siyasî de ev nîgeraniye pêk anîbû ku renge ev du dewletane piştî çareseriya aloziyên di navbera xwe de wegerne Kurdan û bo jinavbirin û tepeseriya tevgera Kurdan li her du parên Kurdistana Îran û Îraqê de bi hevre hevkariyê bikin. Ji alîkî din ve Xumêynî tevî vê hemû serhişkiya ku li şerê Îran û Îraqê de ji xwe nîşan da bû, li jêr derba rastiyan de cama jehrê vexwaribû û biryarnameya hijmare 598'ê ya Civata Ewlekariyê a Saziya Neteweyên Yekbûyî derheq agirbesa li şerê Îran û Îraqê de qebûl kiribû.

Di vê rewşê de Komara Îslamî ji rêya hinek ji hevalan ve pêşniyaza hevpeyvînê bo çareseriya pirsa Kurd di Îranê de dida PDK Îranê . Dr. Qasimlo, û tev wî jî Deftera Siyasî têne ser vê baweriyê ku herçend rabihuriya Komara Îslamî di vî warî de pir e ji durûyî û firt û fêlan, lê niha ku tev dijmineke bîhanî hazir bûye aştiyê qebûl biket, dikare tev Kurdan jî ku beşek ji xelkê Îranê ne, pêk bihêt. Di halekê de jî ku ji gelek aliyan ve tevgera Kurd li jêr tirsê de ye, retkirina pêşniyaza hevpeyvînê kareke dirust nine. Çimku hekî ev hevpeyvînane bibne sebebê agirbeseke dirêjheyam, dikare bi qazancê tevgera Kurd hem li Îranê û hem jî li derveyî Îranê, bi taybetî di Îraqê de be. Eva jî dikare berhevdaneke serrast be.

Lê eyba vî karî li ciyeke din de bû. Komara Îslamî daxwaz kiribû ku ev hevpeyvîna divêt bi tewahî nepenî be û tevî şexsê Dr. Qasimlo jî be, bi vê hêcetê ku dewlet dixwaze ew kesê ku tête ser maseya hevpeyvînê, kêrhatî be û baş jî şarezayê xwestek û daxwazên partiyê û xelkê Kurdistanê be. Mixabin Deftera Siyasî û Dr. Qasimlo serbarê biryara rohn a Komîteya Navendî li warê retkirina hevpeyvînên nepenî, vê pêşniyazê qebûl dikin û bêy evê ku guhê xwe bidne vê hindê ku kê ji aliyê dewletê ve dê bihêt û tevî berpirsê yekem yê partiyê dê hevpeyvînan biket, bi vê yekê razî dibin ku Dr. Qasimlo here Viyenê û tevî bi nav nûnerên Komara Îslamî rûnê. Gera yekem a rûniştinan di roja yekemîn a sala 1989'an de bi berhevbûna Mam Celal sekreterê giştî ê YNK'ê û li jêr parêzgariya endam û alîgirên YNK'e li Utrîşê û herwisa bi beşdariya axayê Ehmed bin Bila serkomarê pêşîn ê Elcezayirê li Viyenê pêk têt.Vê carê nûnerên dewletê (ku wisa dîhare rewşê ji bo cîbicîkirina pîlanêt xwe baş nabînin) daxwazê dikin ku PDK Îranê pêşniyazên xwe bo çareseriya pirsa Kurd bas biket, da ku ew binivîsin û bidne navendê bona vê çendê ku berpirs bîr û raya xwe li ser wan pêşniyaran eşkere bikin. nezerê li ser bidin. Dr. Qasimlo jî bi hûrî hemû boçûnên partiyê wan re şirove diket û pêşniyazên partê didane ber destê wan û ev gera hevpeyvînan bi vê çendê bi dawî têt.

Ciyê heyrîmanê eva ye, Komara Îslamî ku hinde pê li ser nepenîbûna hevpeyvînan dadigirt, ji rêyên curbicur ve belav dikir ku hevpeyvîn hebûye û nûnerên PDK Îranê û dewletê li Utrîşê hevdîtin pêk anîne. Lê hevçax wisa nîşan dida ku eva YNK ye ku nûçeya hevpeyvînê belav kiriye, bo evê ku wisa nîşan bidet ku YNK qise xwe devê wan de nagirin, lewma nabe YNK di hevpeyvîneke nepenî de berhev be.

Di buhara sala 1368 (1989)'an de şehîd Dr. Şerefkendî seferek bo derveyî welat kir. Dema ku Komara Îslamî daxwazê diket ku qonaxa duyemîn a hevpeyvînan dest pê biket, Deftera Siyasî dibêje çimku niha Dr. Şerefkendî li derveyî welat e bila qonaxa duyem a hevpeyvînan bi wî re bête kirin. Lê Komara Îslamî ku bixwe du meimurên derece sê û çar şandibûne ser maseya hevpeyvînê, vê pêşniyazê ret dike û radigehîne ku tevî şexsê D.r Qasimlo nebe hazir

nine ku hevpeyvînan biket. Hevçax radigehîne ku naxwaze YNK jî beşdarî civînan be, bi vê egerê ku dewlet dixwaze hevpeyvîn nepenî be û rêberên YNK'e jî qise xwe devê wan de nagirin û her çi hebe bas dikin. Bo bextreşiya Kurdan çi yek ji vanan Dr. Qasimlo hişyar nake û bala wî bo aliyê pîlana rijîmê bo jinavbirina wî ranakêşe.

Li rojên dawiyê ên buhara sala 1368'an de Dr. Qasimlo bo karûbarên partiyê bi taybetî bo beşdarî di kongireya Entirnasyonala Sosyalîst de sefera Ewropayê diket. Rayedarên rijîmê ku dizanin Dr. Qasimlo li Ewropayê de ye cehdê dikin da ku bi wî re têkiliyan pêk bînin û li jêr navê dirêjîdana bi hevpeyvînan wî bêxne tevlikê de. Li ber ewê jî ku pêştir ragehandine naxwazin YNK di civînan de beşdar be, ji rêya Dr. Fazil Mela Mehmûd ve cehdê dikin da ku peyama xwe bigehînne Dr. Qasimlo. Dr. Fazil bi telefonê bi Dr. Qasimlo re qise dike û qerarê didanên ku Dr. Qasimlo roja 11.07.1989'ê here Utrîşê.

Hêjayî gotinê ye ku Dr. Qasimlo li Feransayê de ji bilî xanima Hêlîna Qasimlo (Xuşke Nesrîn) yanî hevjîna xwe çi kesî agehdar naket ku çima diçe Viyenê. Dema jî ku xuşke Nesrîn lê dipirse erê ma tu hest bi tirsê nakî, Dr. Qasimlo wê xatircem dike ku hemû têbîniyeke ewlehiyê berçav hatiye girtin û ciyê nîgeraniyê nine. Bi vî awayî roja 11.07.1989'an Dr. Qasimlo diçe Viyenê û mêhvanê yek ji hevalên partiyê dibe. Roja paştir bê ewê ku bihêle hevalên wî ên hizbî di Viyenê de çi kes tevî wî here, yan jî heta bêje wan ku diçe kuderê, tevî kak Ebdullah Qadirî diçne nêzîkî wî ciyê ku terora Viyenê qewimî. Ew hevalê ku bi tirombîlê wan herduka digehîne wir, li ser izna Dr. Qasimlo wan cî dihêle û herduk diçne ciyê hevdîtinê. Dîhare di ciyê hevdîtinê (her wî ciyê terorê) de, tevî Dr. Fazil û terorîstên Komara Îslamî yektir dibînin, û wê rojê pêkve hinekê qise dikin û bi berçav bo tewawkirina hevpeyvînan qerarê didanên da ku roja paştir her li wir yektir bibînin. Qerarê bo demjimêr 5'ê piştînîvro didanên.

Roja 13.07.1989'an Dr. Qasimlo, kak Ebdullah Qadirî û du sê hevalên din gazî diket da ku nanê nîvro li xwaringehekê li derveyî Viyenê de bi hev re bixon. Lê kak Ebdullah her ji sibezû ve nerehet û perîşe dibe û dema dixwazin herin, dibêje ez nesax im û nikarim bêm. Dema ku Dr. Qasimlo dibêjê tu divêt her tevî me bêyî, kak

Ebdullah bi dilgermî ve dibêjê hekî ez bi keyfa xwe bim ez nayêm, lê hekî bi zorî jî be eva tiştekî dinê ye. Aqibet kak Ebdullah di mal de dimîne, û Dr. Qasimlo û hevalên din diçne derê. Vira de îsbat dibe ku kak Ebdullah ji rabûn û rûniştina roja borî a terorîstên bi nav dîplomat ketiye şik û gumanê. Ji tirsê evê ku nebe bêjnê tu ditirsî, yan jî Dr. Qasimlo gazinda lê biket ku bo çi nepeniyan eşkere diket, negotiye kesê ku hevdîtineke bi vî awayî heye, û heta rûyê wî negirtiye ku bêje Dr. Qasimloyê nemir ku ez hest bi tirsê dikim.

Êvariya wê rojê Dr. Qasimlo her ji wî hevalê pêştir daxwazê diket ku bi tirombîla wan bigehîne ciyê diyarîkirî. Dema digihîjne ciyê diyarîkirî, ew heval dibêje ez jî dixwazim tevî we bêm, lê Dr. qebûl naket. Paşê dibêje baş e, ezê vira bim heta ku hûn tên, Dr. Qasimlo dîsan jî razî nabe û dibêjê here û demjimêr 7'ê êvarê were dû me. Ew heval diçe û demjimêr 7'ê têtе dû wan. Lê dema digihîje ciyê diyarîkirî, dibîne wir tijî bûye ji polîs û rewşeke aloz pêk hatiye. Dema tirombîla xwe radigre polîs tê hinda serî û jê dipirse te çi karek heye? Dibêjê min hevalek heye û qirar e ku em vira yektir bibînin. Îca ew ji polîs dipirse çi bûye? Polîs jêre bas dike ku li van nêzûkatiya çend kes hatine kuştin û renge tu li nasîna wan de bikarî hevkariya me bikî. Dema ku hevalê me bi polîs re diçe ciyê bûyerê, termê di nav xwînê de sorbûyî ê Dr. Qasimlo û hevalên wî dibîne, û polîs re bas diket ku evne kî ne. Dîhare polîs vî hevalî dibe navenda polîs û heta direngiyeke şevê jêpirsînê lê dikin û piştî hingê izna wî didin ku here.

Guhdana bi wan şirîtên ku hevpeyvîna Dr. Qasimlo û terorîstên Komara Îslamî tê de hatine cî dan, bi rohnî vê yekê îsbat diket ku berevajiyê ewê ku rijîmê radigehand ku kesanek ji derve re hatine û teqe li wan kirine, çi kes ji derveyî ciyê rûniştina nûnerên PDK Îranê û terorîstan ve nehatiye jor de û her tiştek ji pêşda hatiye amadekirin. Tevî evê ku gotina ev hevdîtina bo vê hindê bûye ku heyeta rijîmê bersîva daxwazên PDK Îranê ji aliyê dewletê ve bi Dr. Qasimlo û hevalên wî ragehînin, ew di qisên xwe de bi çi awayekê basê vê pirsê nakin û dêjin me çi peyamek ji aliyê dewletê ve neaniye û em hatine bizanin kanê hûn vê pirsê çawa dibînin û daxwazên we çi ne? Dr. Qasimlo jî bi dirêjî daxwazên xelkê Kurdistanê û

naweroka otonomiyê wan re şirove dike û dixwaze da ku bi wan bide zanîn ku cîgirbûna mafê neteweyî yê gelê Kurd di xizmeta qahîmbûna biratî û hevbendiya di navbera gelên Îranê de ye. Ji nişkêve qisêt wan qet dibin û dengê çend şilpînên kûşke têt ku dîhare dengê wan çeka ye ku dengweşêr (Seda xefêkon) li ser de bûye, herwisa dengekî gelek sivik yê şerê destewyexê têt, ku her wekî di lêkolîna polîs de jî wextê xwe hate ragehandin, divêt encama berêkaniya şehîd Ebdullah Qadirîazer be ku piştî şehîdbûna Dr. Qasimlo îrêş kiribe ser bikujan.

Çavkanî : Nîw sede têkoşan

***

Şehîdbûna Dr. Qasimlo û hevalên wî ji zimanê kesekî ve ku bi çavên xwe ciyê bûyerê dîtiye

Ji berahiyê gote min demjimêr 7:15 were dû min, piştî wê biryara xwe guherî û gote min 7:30. Demjimêr 7:15 piştînîvro pêka qerarê ez çûm. Diviya min Dr. Qasimlo biriba bo mala hevalekî. Çimku hemû haval li wir kom bibûn û qerar bû Dr. Qasimlo me re qise bike. Nêzîkî nîv demjimêrî ez çavnihêr mam. Dema demjimêr bû 7:30, min di dilê xwe de got eva bê eger nine. Piştî 7:30 heta qasekê min hest bi nîgeraniyê kir. Lewma ez siwarê tirombîlê bûm û çûm da ku bi telefona giştî zengekê lêdim. Min telefon bo mala wî hevalî kir. Dr. Qasimlo li wir nebû. Dîsan ez wegeryame ciyê qerarê. Dema ez vegeriyam min dît xelkekî zaf kom bûye. Polîsan xiyewan (Şeqam) girtibûn. Lewma tirafîkeke mezin çêbibû. Min dorek lêda û dîsan min ji hevalên xwe re telefon kir û min gote wan: Dr. Qasimlo nehatiye û maye direngî. Polîsan ew tax hemû girtine, hetmen tiştek qewimiye. Bilez du kes ji hevalên wî rê ketin û xwe gehandne min. Dema ku çavên me kete wê avahiyê ku polîsan çardoranêt wê girtibûn yek ji hevalan bi navê "Hawar" got: Dr. Qasimlo şehîd kirine.Vira mala Fazil e. Paşê me bilez xwe bi polîs da nasandin. Polîs gote me ku sê Ereb hatine kuştin û yek jî birîndar bûye. Karta pênasê ya kak Ebdullah di destê yek ji polîsan de bû. Eva jî nîşana vê yekê bû ku kak Ebdullah yek ji qurbaniyan e. "Hawar" bo nasîna birîndaran çû nexweşxanê. Polîs em –ku du kes bûn- birne nava avahiyê de û piştî wê bo dîtina apartimana serê em serketin. Apartiman tarî bû. Em li ber deriyê apartimanê ragirtin û nehêlan em herne jor, bo evê ku bi çûna me belge û devsa bi cî mayî ji beyn neçe. Di pêşde îcaze dane Feryar (Far Yar) da ku bera xwe bide ciyê bûyerê. Navbirî termê Dr. Qasimlo dît û nas kir. Lê nekarî termên dinê nas biket. Piştî wî govya min hat. Min li ciyê bûyerê nihêrî. Dr.

Qasimlo li ser kanapayekê rûniştibû û li ber germa havînê çakîtê xwe êxistibû, kak Ebdullah jî çakîtê wî ber de nebû. Dr. Qasimlo her li ser wî ciyê ku rûniştibû bê ewê ku cî biqilqile, şehîd bibû. Kirasê wî yê sipî bi tewahî sor bibû. Tenê milê çepê ê kirasê wî sipî mabû. Gelek ji nêzîk û rûbirû teqe lê kiribûn. Lewma her gelek zû şehîd bibû. Meytê wî bi ser pişta kanapayê de xwar bibû. Kak Ebdullah di nîweka odê de ketibû ser erdê. Kak Fazil li nêzîkî derî li ser taqa piştê ketibû ser erdê. Nîveka odê gelek aloz bibû. Tiştên jor de kanapayek bû ku Dr. Qasimlo li ser rûniştibû, û çend korsî û mîz jî tê de bûn. Hem mîz û hem korsî vegeriyabûn û eva jî nîşan dide ku levdan di navbera wan de çê bûye. Ez bêjim Ebdullah tevî wan destewyexe bibû. Çimku Ebdullah gelek gulle lê ketibûn. Ebdullah 14 gulle lê ketibûn, Dr. Qasimlo 3 gulle lê ketibûn, gulleyek pişt patikê û 2 gulle jî li serê wî ketibûn. Termê Fazil min bi başî nedît. Lê paşê birayê wî gote min ku 5 gulle lê ketibûn ku hemû jî aliyê piştê re lêdabûn. Çend gulle jî dîwar girtibûn. Pêka rapora polîs, gulle ji aliyê kesaneka ve hatibûne awêtin ku li jor de rûniştibûn. Ku wisa bû çi kes ji derve re nehatibû û teqe nekiribû. Li jor de tenê ev sê meytane hebûn. Polîsan nehêlan ku em beşên dinê ên apartimanê bibînin. Serokê taqma dijî terorê yê polîsê Utrîşê di nava tirombîla xwe de li pêşberî wê avahiyê bû. Min gotê ku Komara Îslamî a Îranê ye ku ev kuştara hovane bi rêve biriye û bikuj jî xulamokên Komara Îslamî a Îranê ne. Serokê taqma dijî terorê yê polîsê Utrîşê bilez li ber çavên me ferman da ku sînorên Utrîşê li ser tewaya Îraniyan de bigrin. Wî got: "Heta hekî 5000 kes jî bin, nabe bihêlin ew herne derê".

***

Bûyera Viyenê

Nûnerên Komara Îslamî li ser maseya hevpeyvînê ev kesane bûn:

1- Mihemed Ceifer Sehrarudî xwediyê pasporta dîplomatîk.

2- Mistefa Ecudî xwediyê pasporta dîplomatîk.

3- Emîr Mensurê Bozorgiyanesl xwediyê pasporta xizmetê.

Belge û lêkolînên destpêkî ên polîsê Utrîşê eşkere kir ku terorîst di kombûnê de bûn û her ev kesane bûn ku wekî nûnerê fermî ê Komara Îslamî di vê civînê de beşdar bûn.

Di wextê terorê de wisa xuya ye ku şehîd Ebdullah Qadirî ji ciyê xwe rabûye û xwastiye derba xwe biweşîne, ku di vê navberê de çend gulle bi şaşî li Sehrarudî digrin û dest û devê wî birîndar dibe.

Piştî rêveçûna pîlana wan, terorîst direvin. Mistefa Ecudî dikare xwe xulas biket û dighîje balyuzxaneya Tehranê ku gelek ji ciyê bûyerê dûr nebû. Bozorgiyan di pêş de dixwaze ku hevkariya Sehrarudî biket û wî derbas bike, lê dema ku dibîne nikare vî karî biket paketekê ji Sehrarudî werdigere ku 9000 dolar tê de bû, û dixwaze xwe havêje ku ji nişkêve polîs dighîjê û wî digre.

Sehrarudî bi birîndarî xwe digehîne ser xiyewanê. Di vî çaxî de polîs ku ji aliyê cîranên ciyê bûyerê ve tête agehdarkirin, dighîje cî û Sehrarudî digre û bo dermankirinê dişîne nexweşxanê.

Polîs dest diket bi lêkolînê û gelek zû jê re îsbat dibe ku bernameya terorê ji aliyê Komara Îslamî ve hatiye darêtin û ji aliyê nûnerên fermî ên rijîmê ve di civînê de rêve çûye. Lewma hukmê girtina her sê kesan ji aliyê dewleta Utrîşê ve hate dan. 2 kes ji sûçbaran di destê polîs de bûn. Sehrarudî di nexweşxanê de bû, û Bozorgiyan jî hatibû girtin.

Komara Îslamî ku rewş bi vî awayî dît, bi lez dest kir bi dana qewl û sozan, û daxwaz ji Utrîşê kir da ku hukmê girtinê hilweşîne û rê bi

Sehrarudî bête dan da ku bo dermankirinê wegere Tehranê û Bozorgiyan jî bête berdan.

Balyuzxaneya Komara Îslamî li Utrîşê di daxuyaniyekê de tevî pejirandina hevdîtina nûnerên dewleta Îranê û PDK Îranê gelek riyakarane ew teror pirotesto kir û ragehand ku ev terora karê dijminên Îranê ye. (Rojnameya Kêyhan 25.07.1989'an). Mehmud Waizî kargêrê giştî ê şalyariya karûbarên derve a Îranê, teror pirotesto kir û ragehand ku dewleta Utrîşê li şopandina vê pirsê de gelekî micid nine. (Rojnameya Kêyhanê Lenden 20.07.1989'an).

Zext û givaşa Îranê û danûstandinên bazirganî bûne sedema evê ku dad û mafên mirov bêne binpêkirin. Dewleta Utrîşê bi hêceta evê ku Sehrarudî û Bozorgiyan pasporta dîplomatîk hene berdan û wegeryane balyuzxanê. Roja 23.07.1989'an hersêk sûçbar bi îskurtiya balyuzxaneya Îranê, û bi agehdarî û piştevaniya dewleta Utrîşê bo balafirgehê hatne birin û piştre çûne Îranê.

Her di destpêka lêkolînê de qisêt Sehrarudî û Bozorgiyan yek nebûn. Ecudî revî bû. Bozorgiyan digot: "Ez li çaxê teqekirinê di kombûnê de nebûm, û bo sandiwîckirînê çûbûme derê, lewma min hajê pirsa terorê nine". Sehrarudî li jêpirsînê de dibêje: "Gotûbêja me tewaw bibû û qerar bû roja paştir em kom bin ku ji nişkêve derî hate vekirin û du yan sê kes hatne jor de û dest bi teqê kirin. Di çaxê teqekirinê de Ecudî û Bozorgiyan li wir bûn û destê xwe dabûne serê xwe û digiriyan".

Lêkolînê eşkere kir ku piştî teqekirinê ji nêzîk ve tîra xilasê li hersêk qurbaniyan dabûn, bi awayekî ku li ser eniya wan li ber gurriya çekêt wan devsa şevitînê xuya dikir. Ew çekên ku teror pê hatibû kirin du demançên Barata û Lama bûn ku dengbir li ser de bûn. Çek piştî terorê li nav kîseyeke naylonî de pêça bûn û awêtibûne nava satileke aşxaldaniyê de, li xiyewanekê (Şeqamekê) li nêzîkî ciyê bûyerê. Polîsan çek û kîfekî destî jî peyda kirin, ku qebzeke kirîna mutursîklêteke Sozokî bi rêkevt 10.01.1989'an (Dewra yekem a hevpeyvînan) bi navê kesekî Tirk tê de bû. Ewê ku mutursîklêt firotibû, nîgarê Sehrarudî wekî kiryarê muturê nas kiribû. Terorîst piştî ewê ku bi rêz û hurmet ve wegeryane Tehranê, hatne xelatkirin û berpirsyariyên serwetir di dezgehên hukûmetî de bi wan hatne dan.

Bi taybetî Sehrarudî pileya bilind a leşkerî ji Supaha Pasdaran wergirt û bû karnasê pirsên girêdayî bi Kurdistanê.

Ciyê heyrîmanê eva ye ku Komara Îslamî heya niha çendîn caran bi dizî û bi eşkere Sehrarudî wekî berpirsê şanda Îranê şandiye Kurdistana Îraqê û bûye mêhvanê rêxistinên Kurdî. Bê şik û guman merema bingehîn a rijîmê ji vî karî tenê bêhurmetîkirina bi xelkê Kurdistanê û laqidîkirina bi pirsa Kurd e.

Çavkanî: Pirtûka "Seferî bê geranewe"

***

Qisên dawiyê ên Dr. Qasimlo

Heşt salan piştî terora rêberên PDK Îranê li Utrîşê, aqibet polîsê Utrîşê kasêta hevpeyvînê ya rûniştina Dr. Qasimlo sekreterê pêşîn ê PDK Îranê tevî nûnerên Komara Îslamî a Îranê ku bi dengê çend gulleyan bi dawî têt, da destê PDK Îranê . Di vê terora ne camêrane de ji bilî Dr. Qasimlo, kak Ebdullah Qadirîazer û Dr. Fazil Resûl jîl hatne kuştin. Qisên dawiyê ên Dr. Qasimlo, berî evê ku ew bikeve ber gulleyên xulamokên mirovkuj eva bû: "Divêt ev cesuriya hebe ku pêka usul û yasayên wekhev pirsên navxweyî ên Îranê bo hemûyan, bo Ereban, Belûçan, Turkemenan û Kurdan bêne çareserkirin. Hekî îrorojê em nekarin van arîşeyan çareser bikin di pêşerojê de wê bo welatê me bibne karesat". Qisên dawiyê ên Dr. Qasimlo di dîroka hemû gelên Îranê de wê bête cî dan. Di nava hemû gelan de dê rêz û hurmet ji kesayetiya wî bête girtin, ne tenê seba berevaniya Dr. Qasimlo ji mafên wan, belkî seba nîşandana rêya rast bi reşbîran û hemû wan kesên ku çi ji rûyê têgihîştin ve, an jî ji rûyê nezaniyê ve, haşayê ji hebûna çend neteweyan di welatê zaf gelî, zaf çandî, û çend zimanî di Îranê de dikin. Qisên dawiyê ên wî kesayetiyê Kurd bê şik û guman rengê qisên dawiyê û berevaniya xebatkarekî didet ku berî gullebarankirinê bo berevanî ji bîr û bawerî û armancên xwe van qiseyan tîne zimên.

Çavkanî: Kovara "Îl gun" hejmar 5 (Belavoka ser bi Turkemenên Îranê)
Pirtûka: Rêberêkî Modern û Şorişgêrêkî Demokrat

***

Rê û resma teslîmî axê kirina termê şehîd Dr. Qasimlo

Piştî belavbûna nûçeya dilêş a şehîdbûna rêberê mezin ê PDK Îranê Dr. Qasimlo û hevalên wî, Deftera Siyasî biryar da li ber rewşa nebaş a niha ya Kurdistanê van du şehîdên mezin bi awayekî demî di welatê Feransayê de teslîmî axê biket. Bo beşdariya di rê û resma teslîmî axê kirina şehîdan de, Deftera Siyasî du hevalên hizbî bi nûneratiya hemû heval û dersxwanên rêberê me yê jidestçûyî şande Feransayê.

Êvariya roja çarşemiyê 28.04.1368 (19.07.1989)'an termê pîroz ê şehîdan ji Utrîşê ve gihîşte Parîsê û piştî wê birne bal pizişkê qanûnî. Demjimêr 8'ê sibezûya pêncşemiyê 29.04.1368'an termê pîroz ê şehîdan di rê û resmeke mezin de ji pizişkê qanûnî ve hate veguhastin bo Enstîtuya Kurd li Parîsê, bo evê ku dost û alîgirên PDK Îranê bikarin bo cara dawiyê xatirê xwe lê bixwazin.

Hêjayî gotinê ye ku piştî belavbûna nûçeya şehîdbûna Dr. Qasimlo û kak Ebdullah Qadirîazer, bi hezaran kesî bi name û bi tiligram, û têkiliyên telefonî tevî bîroya PDK Îranê li Parîsê, sersaxî li xelkê Kurdistanê, PDK Îranê û malbatên şehîdan kirin û hevderdiya xwe tevî xebatkarên rêya demokrasî û otonomiyê eyan kirin. Bo roja bi axê sipartina şehîdan jî nêzîkî sed qefkên gula ji aliyê partî û rêxistin û kesayetiyên navdar ên Kurd, Îranî û bîhanî ve hatne pêşkêş kirin.

Demjimêr 10'ê sibezû rê û resma xatirxwastina ji şehîdan dest pê kir. Li sê demjimêr û çarîkekê de pitir ji hezar û pênsed kesên Îranî, Kurd, Tirk, Ereb, û Ewropayî ji aliyê xwe ve yan jî bi nûneratiya partî û rêxistinên siyasî, sinfî û civakî, li ser termê pîroz ê şehîdan berhev bûn, û tevî rêz û hurmetgirtina ji riha paqije şehîdan, û xatirxwastina ji wan, sersaxiya xwe bi malbatên şehîdan û nûnerên PDK Îranê ragehandin.

Demjimêr 2'ê piştînîvroya hemen wê rojê termê pîroz ê şehîdên rêya rizgariyê ji meydana Rîpoblîk a Parîsê ve bi rêpêwîneke hêdî ku pitir ji 3000 kesî tê de beşdar bûn, ber bi cimata Pîrlaşêz, cimata şehîdên Komona Parîsê û kesayetiyên siyasî û toreyî ên navdar yên Feransewî û bîhanî birin. Hejmareke yekcar zaf ji nûnerên partî û rêxistin û sendîka û kesayetiyên navdar ên Kurd, Îranî, Tirk, Ereb û Ewropayî bi pê, yan jî bi tirombîla xwe gehandne Pîrlaşêzê û li ser qebrê şehîdê mezin Dr. Qasimlo berhev bûn.

Demjimêr 4'ê piştînîvro piştî bernameyeke kurt a gotarxwandinê ku Dr. Bêrnard Kuşnêr wezîrê karûbarên mirovî li Feransayê, û axayê Tomas Hamîrbêrg sekreterê giştî ê Komîteya Swêdî bo piştevanî ji mafên mirovî ên xelkê Kurdistanê, û Patrîk Budwan sekreterê giştî ê federasyona mafên mirov, û nûnerekî Deftera Siyasî tê de beşdar bûn, termê şehîdan bi rêz û hurmet ve bi axa xerîbiyê hate sipartin û ew rê û resm bi dawî hat.

Hêjayî gotinê ye, beşdariya hevalên hizbî ên rûniştiyê welatên curbicur ên Ewropayê di vê rê û resmê de ku piraniya wan bi unîforma pêşmerge ve hatibûn û beşeke berçav ji wan kêmendam bûn, û herwisa beşdariya nûnerên Deftera Siyasî û axavtina wan bi zimanê Kurdî di vê rê û resmê de, û ji vê yekê jî zêdetir hêdî û serûberbûna rêpêwînê, bala Ewropayiyan bo aliyê xwe rakêşa bû.

Bi sedan kesên wênegir, fîlmhilgir û nûçegihan bo berhevkirina nîgar û fîlm û raportan di vê rê û resmê de beşdar bûn û nûçeya vê bûyerê bo seranserê cîhanê belav kirin. Êvariya vê rojê û pêşnîvroya roja paştir nûçeya bi axê sipartina Dr. Qasimloyê mezin bi awayekî pan û berfireh di çapemenî û radyo û tilvîzyonên bîhanî de hate belavkirin.

***

Beşa nehemîn:

- Peyama hevalê xebatkar Dr. Seîd Şerefkendî sexmeratî şehîdbûna Dr. Qasimlo

Peyama hevalê xebatkar Dr. Seîd Şerefkendî sexmeratî şehîdbûna Dr. Qasimlo

Hevwelatiyên xudan şeref!
Xelkê dilsoj û emegdar ên Kurdistanê !

Ez bi erkê li ser milê xwe dizanim ku bi navê PDK Îranê , ji aliyê rêveberî, endam, û kadr û pêşmergeyên vê partiyê ve, spasiyeke germ bo vê hevderdiya we bikim ku we seba şehîdbûna rêberê xweştivî ê partiya me, Dr. Qasimloyê nemir ji xwe nîşan da, û herwisa bi awayekî pan û berfireh, û bê mînak, ev hevderdiya dirêjî heye.

Eşkere ye ku ev hevderdî û ev hesta paqij nîşana emegdariyekê ye ku ji bîr û bawer ve çavkanî digre, bîr û bawer bi rê û şopa xebatkarane û di hemen demê de usulî, û bîr û bawer bi serxwebûna partê, û bîr û bawer bi wan armancên ku rêberê me ê mezin, di pêxema destveanîna wan de serê xwe danî, û canê xwe gorî kir. Ev hevderdiya nîşana vê çendê ye ku hûn xelkê têniyê azadî û demokrasiyê daxwazên PDK Îranê bi daxwazên xwe dizanin û wekî xortên xwe ên xweştivî dinihêrne xebatkarên PDK Îranê.

Eva, dîhare her di vê demê de ku bo me endamên PDK Îranê bi giştî ciyê şanaziyeke mezin e, erkekî gelek giran jî diêxe ser milêt me. Erkê domandina sadiqane a rêya şehîdan û erkê cehdkirineke zaf, bo evê ku hertim ciyê bawerî û hejêkirinê bin!.

Lewma ez hewce dizanim ku di vê rewşa dijwar û dîrokî de careke din we xelkê xudan şeref û azadîxwaz ên seranserê Îranê bi giştî û Kurdistanê bi taybetî xatircem bikim ku em xebatkarên PDK Îranê , partiya şehîdan, vê erkê giran ku ketiye ser milêt me, gelek bi başî em hest pê dikin û gelek bi zanebûn ve me biryara yekcarî da ye ku hemû hêz û şiyana xwe bi kar bînin bo pêvîna rêya Dr. Qasimlo, yanî rêya xebata bê westiyan di pêxema azadî, demokrasî û mafên mirov, da ku di vê rêkê de –ku rêya sorxelat a şehîdan e –emê yan serkevin, yan jî bi şanazî ve wekî şehîdên xwe yên ezîz emê serê xwe danên.

Hevwelatiyên azadîxwaz ên Îranê!

Rijîma xwînxwar a Xumêynî bi şehîdkirina Dr. Qasimlo nîşan da ku naxwaze li naweroka reftar û kiryarên xwe ên dijîgelî û dijîÎranî de, çi guherînan pêk bîne. Erê gelo ma Dr. Qasimlo li çi rêyekê û li dû çi armancekê de kete tevlika rijîma cellad de, û hate terorkirin?

Dr. Qasimlo dixwast xelkê Kurdistana Îranê bi wergirtina otonomiyê berî her tiştî hest bi kesayetiya xwe a mirovî bikin, hest bi vê yekê bikin ku gelê Kurd di Kurdistaneke xudmuxtar de ye, û bi rastî û bi kiryar dikare hest bi biratî û wekheviyê tevî gelên din ên Îranê biket, û bi dilekî germ erkê xwe ê nîştimanî bi vî cureyî ku li ser milêt welatperwerên rastîn e, bi encam bigehîne, û di avedankirina welatê xwe, Îrana kavil û perîşe ya îro de rolekî bi bandor hebe.

Dr. Qasimlo hêviya wî eva bû ku çi zanayî, ceribandin û lêhatiya xwe wek xortekî hilkevtî ê vê av û axê, û xebatkarî û mandînenasiya xebatkarên PDK Îranê ku ji xortên herî dilsoj ên Kurdistana Îranê ne, û piştî vana jî hemû hêz û şiyana gelê Kurd danête xizmeta serxwebûna siyasî û ber bi pêşda birina Îranê, di warên aborî, civakî, çandî, zanistî, senetî û hwd… de!

Lê perwerdebûyiyên xwîn û îxanetê bi vê cenayeta mezin nîşan dan ku ne li fikra Îranê de ne, û ne jî gelê Kurd di Îranê de bi Îranî dizanin. Wan careke din bi rohnî ragehandin ku çi bihagiraniyekê nadne usulên exlaqî û mirovî, yasa û prensîpên navneteweyî, û têkiliyên di navbera gelan û dewletên cîhanê de.

Em wekî PDK Îranê serbarê evê ku bi kiryar hêza herî çeleng a opozisyuna Îranî di qada xebata çekdarane di navxwe a Îranê de bûn, û niha jî em her ew hêza ne, em aştîxwaz in û hekî me dest bo çekê biriye, bo berevanî ji xwe ye, çimku şer bi ser me de sepandine. Em ji şer û xwînrêtinê bêzar in, çimku em wateya şer bi başî dizanin û her lewma hertim em li ser vê bawerê bûne ku pirsa Kurdistanê hindî ku ji destê me bihêt ji rêya aştîxwazane ve çareser bikin. Lê kevneperestên dûr ji mirovanetî û eqlê selîm bi vî karê xwe dane selimandin ku bona çareseriya arîşeyên îro ên Îranê çi rêyekê bi navê aştîxwazane nas nakin û di navbera xwe û xelkê Îranê de tenê zor û tund û tîjiyê bi hakim dizanin û bes!

Belê! rijîma Axundî, gelên Îranê bi eşkere bo meydana şer û berêkaniya tevî xwe gazî diket, niha maye ser me ku em kengê û çawa şikestnexarina hêza xwe a yekgirtî nîşanî wê bidin û şikest û sernixûniyê pê bidne tamkirin.

Xortên emegdar û xebatkar ên neteweya kurd!

We hesta welatperwerî û emegdariya xwe bi rêvîngên rêya azadî û rizgariyê baş selimandiye, lê hest herçend gelek girîng e lê bi tenê bes nine. Hest divêt şiklekî maddî û destçêkirî bi xwe ve bigre da ku bikare di qada kiryarê de bi awayekî bi bandor xwe nîşan bidet.

Me her di destpêkê de ku piyê xwe daniye rêya dijwar û pir evraz û nişîw a xebatê de, me biryar daye ku heta nefesa dawiyê û axir dilopa xwînê, vê rêyê bidomînin. Ev biryara jî dîhare me seba dilgermiya bi piştevaniya we daye. Niha jî em bi hemû hest û hebûna xwe vê biryarê tevî we nû dikin, û em xatircem in ku aqibet bi piştevaniya we emê serkevin. Çimku em dizanin hêza gel a yekparçe qet tûşi şikestê nabe.

Em neteweyeke belengaz in ku gelek zilm li me tête kirin. Zordar bi kuştina Dr. Qasimlo dixwazin vê yekê bêjne me ku tenê wextekê we mafê bêhnwedanê heye ku li jêr dest û lepê me de bin. Lê ji mêjve ye gotine ku qebûlkirina zilmê ji zilmkirinê xirabtir e. Hekî em bixwazin hemû dersên Dr. Qasimlo li dersekê de kurt bikin ev dersa eva ye ku bala me bo aliyê hêza xwe rakêşe, û em hîn kirin ku hekî me bawerî bi xwe hebe û pişta yektir bigrin, em xwediyê şiyaneke mezin in ku cendekê zordaran dilerizîne û wan tûşî derdê mirinê diket!.

Divêt em vê dersa bi nirx li ber çav bigrin!

Bila dayîkên Kurdistanê xortên xwe li himbêza xwe a germ û pir ji dilovanî de bi hesta germ a welatperwerî û azadîxwaziyê perwerde bikin, û çîronga jiyana Dr. Qasimlo û şehîdên din ên rêya rizgariyê di guhê wan de bixwînin.

Bila babên Kurdistanê dersa cesurî û xebatkariyê hînî zarokên xwe bikin û bi wan bidne zanîn ku çende xweş e ku ew ciyê hêviya civak û gelê xwe bin.

Bila xortên Kurd -keç û kur- baş bizanin ku jiyan di êxsîrî û jêrdestiyê de, û bi serşorî û şermezarî, çende bê qedr û qîmet e, û li hember de hilmijîna hewayê paqij yê serfirazî û azadiyê çende xweş û dilrevîn e.

Bila xortên nevest ên Kurdistanê refên PDK Îranê bi hatina xwe ciwantir ji pêşde bixemilînin, û bi hilgirtina çeka şeref û serfiraziyê, hêza pêşmerge ku qet tûşî şikestê nabe, gelek ji niha xwedîhêztir bikin.

Eşkere ye ku neteweya Kurd xwediyê dehan û sedan Qasimloyan bûye û heye. Taybetmendiya Qasimlo eva bû ku lêhatî û zanayiya xwe danîbû xizmeta rizgarî û azadiya gelê xwe de. Lewma niha em hemû baş dizanin ku di vê rewş û hewayê pir ji zext û givaş, serberedayî û reşekujiya îro ya Îranê de çi pêşerojeke rohn bo kesê xuya naket û heta sîbera vê dîktatoriya kevneperestane bimîne, jiyaneke edetî, bêdeng û bê derdiser bo kesê îmkan çinine, û hekî jî bi berçav îmkan hebe, li ser her mirovekî rastîn hewce ye ku vê jiyanê - herçende dirêj bi encama wê ve- tevî jiyana kurt lê pir ji şanazî û di dîrokê de cî dayî ya xebatkarên qada xebatê û şehîdên rêya rizgariya gel, wekî şehîd Dr. Qasimlo û kak Ebdullah Qadirîazer binirxîne û bîr û raya xwe li ser jiyana wî eşkere biket.

Hevwelatiyên evîndarê azadiyê!

Dr. Qasimlo di tewaya jiyana xwe de, wekî teyrekî ji hêlûnê derkirî, dilê wî hertim bo nîştimana wî a ezîz, û êvirîna di vê nîştimanê de lêdida. Lê mixabin Dr. Qasimlo nîştimana me di rewşeke wisa de nedît ku em termên pîroz yên şehîdên xwe ên ezîz bi xatircemî ve pê bispêrin. Lewma carê me termê wî bi emanet daniye ciyekî dûr ji Kurdistanê, hetanî wê roja ku li jêr sîbera xebat û tekoşîna wî de, axa pîroz a nîştimana me himbêza xwe ne tenê bo xortên xwe yên fîdakar û emegdar, belkî bo her mirovekî xebatkar ê ogirê azadiyê weket!

Bi hêviya wê roja pîroz!

Çavkanî: Rojnameya Kurdistan, hejmar 152

***

Beşa dehemîn:

- li ser gora şehîdan

Axavtina birêz Ebdullah Hesenzade li ser gora şehîdên Viyenê

Xuşk û birayên birêz!

Nûnerên partî û saziyên siyasî û civakî!

Kesayetiyên azadîxwaz û mirovhez!

Em vira de kom bûne da ku termê pîroz yê du şehîdên rêya rizgariyê, Dr. Ebdulrehman Qasimlo sekreterê giştî ê PDK Îranê û kak Ebdullah Qadirîazer nûnerê PDK Îranê li Ewropa teslîmî axê bikin. Beşdariya we di vê rê û resmê de rêz û hurmetgirtin e ji vê xebata pîroz ku Dr. Qasimlo pitir ji 40 salî temenê xwe jêre danî. Me ev civîna bo vê yekê pêk aniye da ku em şoreşvanekî mezin û navdar ê Kurd bi vî awayî ku hêjayî wî ye, di nav xwe de rêkin.

Dr. Qasimlo şehîdê rêya rizgariya Kurdistanê û seranserê Îranê, rêberekî lêhatî û xebatkarekî nevest bû ku dîroka xebata rizgarîxwazane a gelê Kurd û gelên Rojhilata Navîn kêmtir kesayetiyên wekî wî bi xwe ve dîtine. Dr. Qasimlo siyasetvanekî zîrek û lêhatî, xebatkarekî gernas, kesayetiyekî mezin ê zanistî, û şoreşvanekî bê heval bû. Dr. Qasimlo di rêya destveanîna azadiyê û dada civakî de tekoşîn dikir. Wî cehd dikir da ku pelçiqandina mirov bi destê mirov bo heta heta nemîne, û muqedera gelan bikeve destê nûnerên wan yên rastîn de. Wî îmaneke zaf bi demokrasiyê hebû. Wî bo cîgirkirina demokrasiyê li nava refên partiyê û di nava civakê de bi hemû şiyana xwe tekoşîn dikir û hekî carna jî di encama ber bi pêşdebirina demokrasiyê zererek bigihîştiba PDK Îranê , digot eva nirxa demokrasiyê ye û her kesê demokrasiyê bixwaze divêt nirxa wê jî bidet.

Dr. Qasimlo welatperwerekî Kurd bû. Wî baweriyeke tewaw bi muqedera hevbeş a gelê Kurd hebû û serkevtin û şikesta gelê Kurd di her beşeke Kurdistanê de bi serkevtin yan şikesta hemû beşên Kurdistanê dihesiband, û di vê rêyê de jî gelek caran ev yeka bi baş

dizanî ku qazancên PDK Îranê bikete goriyê qazancên sitratêjîk ên neteweya kurd. Wî Çaxî ku tenê daxwaza mafê neteweyî bo neteweya Kurd bi guneh dihate hesêbandin, û dijminên neteweya Kurd navê cudahîxwaziyê li ser didanîn, wî çaxî Dr. Qasimlo di pirtûka xwe a bi nav û deng "Kurdistan û Kurd" de hewar dikir ku Kurd neteweyeke cuda ji neteweyên dinê ye, û hekî rojekê wekî hemû neteweyên azadîxwaz û bextewer ên cîhanê muqedera xwe destve bigre, eva hevgirtin e, ne cudabûn. Dr. Qasimlo herwisa welatperwerekî mezin ê Îranî bû, û izn nedida çi kesî ku xwe ji wî Îranîtir bizane. Wî îman bi yekîtiya muqedera gelê Kurd û gelên din ên Îranê hebû, û digot: "Gelê Kurd di Îranê de bêy hevkariya gelên din ên Îranê nagîje armancên xwe ên berheq. Lewma wî bi dil û can ve bona hevkarî û xwe rêkxistina bi hêzên welatperwer ên seranserê Îranê re cehd û tekoşîn dikir, û pêkanîna eniya hevgirtî a hêzên nîştimanî ên Îranê bi şert û mercê eslî ê serkevtinê dizanî. Dr. Qasimlo bizava neteweyî-demokratîk a gelê Kurd bi beşek ji bizava rizgarîxwazane a gelan di seranserê cîhanê de dizanî, lewma jî bona qahîmkirina têkiliya bi hemû bizavên rizgarîxwaz re cehd dikir, û bona rakêşana pişteva niya bîr û raya giştî a cîhanê ji xebata xelkê Kurdistanê tekoşîn dikir.

van sifetên taybetî û gelek sifetên baş ên mirovî, exlaqî û şoreşvanî, Dr. Qasimlo kiribûne kesayetiyekî mezin ê cîhanî, ku tenê milkê xelkê Kurdistanê û Îranê nebe. Ev rê û resma bi coş jî ku îro bi hevkarî û beşdariya we birêzan bo bi axê spartina Dr. Qasimlo pêk hatiye, rengvedaneke xweza (Siruştî) ye bo vê kesayetiya cîhanî a Dr. Qasimlo. Spas bo we û silav li Dr. Qasimlo.

Tu jî ey xebatkarê qet nemir, ey mamostayê zana û rêberê xwedî şiyan! Bi xatircemî ve serê xwe danê û bi asûdeyî razê. Çimku te bi cehd û tekoşîna dehan sale ya xwe welatek hejand û neteweyek rakire ser pêyan. Dersxwan û hevçeperên te li ser peymana xwe mane û rêya te bernadin. Hevalê min ê şehîd! Bo ji destdana te bi hezaran pêşmerge û dehan hezar endamên partiya te, sedan hezar dost û alîgirên rê û şopa te û bi milyon kesî ji xortên neteweya te kovandar bûn û rondik rijandin. Lê ne li ber bê hêvîtiyê, çimku neteweyek ku xortekî wekî te perwerde kiribe bê hêvîtiyê nas naket.

Ew bo te girîyan da ku bi ava çavên xwe û bi axa rêya te heriyekê bo serê hemû wan kesan bigrin ku wan jêve ye bi mirina Qasimlo neteweya Qasimlo û rêbaza Qasimlo jî dimire.

Dizanim hem bo te û hem bo me çêtir bû ku em te di dilê mezin ê axa Kurdistanê de û li cem pêşmerge û hevalên te ên hizbî yên şehîd, teslîmî axê bikin. Lê niha ku Kurdistan li jêr çekmên xulamokên kevneperestiyê de ye, me hêjayî kesayetiya te ya mezin zanî ku te di cimata şehîdan û li cem kesayetiyên edebî û zanistî û hunerî ên Feransayê teslîmî axê bikin û te bikne cînarê şehîdên hertim zindî ên Komona Parîsê, û hozanvanê mezin û şoreşvan ê Kurd Yêlmaz Gûney û kesayetiyên toreyî ên mezin yên Îranê wekî Hidayet û Xolamhosêyn Saidî hetanî wê rojê ku hêvî û xwaziyên te destve tên û em dibne xwediyê Îraneke azad û demokrat û Kurdistaneke xudmuxtar. Hingê xatircem be ku xortên te dê te bibne welatê te, û gora te a pîroze wê bikne hêjageha dilsojên Kurd û welatperwerên Îranê.

Rêberê payebilind yê şoreşvanên Kurdistanê!

Bê şik û guman hemû heval û hevçeperên te hez dikirin îro li cem te ban. Lê wisa meslehet zanîn ku di roja bi axê spartina te de hemû di wê ciyê bin ku tu bixwe hez dikî hemû xebatkarên partiya te li wir bin, çepera xebat bo azadî, demokrasî û xudmuxtariyê. Lewma wan em şandin da ku em bi nûneratiya tewayan bo cara dawiyê xatirê xwe ji te bixwazin û te xatircem bikin ku em bi armancên te her wisa emegdar in û rêya te qet bernadin.

Hevalên xweştivî!

Beşdariya we di rê û resma teslîmî axê kirina Dr. Qasimlo de rêz û hurmetgirtin e ji xebat û cangorîtiya ewên ku di pêxema gel de dijîn û di rêya welat de serê xwe datînin.

Rê bidne min ku ez bi navê PDK Îranê spasê ji we hemûyan, û ji dewlet û xelkê Feransayê bikim, seba evê ku li pêkanîna vê rê û resmê de gelek hevkariya me kirin. Feranse hertim sitara azadîxwazan û sitara wan kesan bûye ku di pêxema bîr û bawera xwe de ji axa bab û kalên xwe derbider dibin. Lewma xebatkarên Kurd û civatgeha cîhanî ji welatê Feransayê re pir hez dikin û rêz û hurmetê jêre didanên. Lewma Dr. Qasimlo şehîdê hemû azadîxwaz û

mirovhezên cîhanê ye. Rê bidne min da ku ez ji aliyê Partiya Dr. Qasimlo, PDK Îranê ve sersaxiyê li we û li tewaya ogirên azadiyê di seranserê cîhanê de bikim.

Silav li riha paqij a hevalên şehîd, Dr. Qasimlo, Ebdullah Qadirî, û hemû şehîdên rêya rizgariyê.

Spasê ji we dikim û her bijîn.

Çavkanî: Rojnameya Kurdistan, hejmar 152

***

Axavtina Dr. Birnard Kuşnir li ser gora şehîdên PDK Îranê di Pîrlaşêza Parîsê de

Dostên Kurda û hevalên Ebdullah û Ebdulrehman nikarin vê tawanê, vê destrêjiya pîs û qirêj, û vê pîlana bi sam ku dawî bi jiyana mirovên têgehiştî û pêşkevtinxwaz û bêhnfireh anî ji bîr bikin.

Bo wan kesên ku Kurdan nas nakin ev pirse destrêjiyeke pîs û qirêj e bo ser canê du xebatkaran, bo ewên ku Kurdan nas dikin, ev jidestçûna tişteke gelek dilêş e. Lê bo hemû Kurdan, çi li gundan û çi di malên bombedumankirî de, û çi li bajar û ordugehên koçberan de, jidestçûna van du kesan xesareke mezin e û nahête cobrankirin.

Em vira de gewahyarê hovîtiyekê ne. Çende zehmet e em bikarin bawer bikin ku rêberên siyasî ên wisa jî hene ku kiryarên wan ên rojane û emraza eslî a deshilatdariya wan, mirovkuştin be.

Hukûmeta Feransayê ku ez bi nûneratiya wê vira me, li hember wan cangoriyên ku bi neheqî hatine kuştin, serê rêz û hurmetê ditevîne û sersaxiyê li malbatên wan, li hevjîna Dr. Qasimlo (Hêlên Qasimlo) û herdu keçên wê diket û piştevaniya xwe ji wan eyan diket.

Ebdulrehman Qasimlo!

Dema ku ez te bi bîr tînim, berî her tiştî keniya te tê pêş çavên min. Te dikarî li hember her tiştî û her kesekî de devkenî bî. Ez bîr ji çanda te ya dewlemend dikim, bîr ji dîtingeha te wekî dîroknivîs û wekî mirovekî têgihîştî dikim ku te li her tiştî dinihêrî da ku bikarî mifahê jê wergirî û berhevdanêt hûr û baş dest xwe bêxî. Tu di cîhana sêyem de mirovek bûyî ku min ji hemû kesî pitir hejê te dikir. Tu her di wî çaxî de ku millîtan, azadîxwaz, û emegdar bi

sitratêjiyekê bûyî, û di halekê de ku li dû rêbazeke siyasî de bûyî, qet naweroka merema te ku demokrasî bû, ji bîr nediçû.

Dr. Qasimlo û dostên wî daxwaza otonomiyê bo Kurdistanê dikirin û hazir bûn da ku li ser otonomiyê hevpeyvînê bikin. Wî dixwast li ser otonomiyê tevî cîgirên Xumêynî hevpeyvînê biket, her lewma jî çûbû bajarê Viyenê da ku li ser pirsa Kurd bigihîje rêçareyeke aştîxwazane. Ew ji peyama aştiyê ditirsiyan, lewma pêxemberê aştiyê kuştin. Eva ye karê taqmekê ku bi ser beşek ji cîhanê de hukûmetê dikin.

Ebdulrehman Qasimlo!

Wisa tête pêş çavên min, ku bê şik û guman min tu li her derê dîtî. Çimku tu berjeng û sembolek bûyî. Tu vira di welatê xwe de ninî, lê tu di ciyekî de bi axê hatî spartin ku ne hinde dûr î ji gullebaran kiriyên Komona Parîsê, ku goriyên hinek berêkaniyên din in. Ew berêkaniyên ku te gelek baş dizanîn ku çi ne, û te rêz û hurmet jê digirt. Lê dîsan jî tu niha ji mala xwe dûr î.

Ey koçberê hertimî!

Gelo te malek heye? Lê hêvîdar im ku tu vira, di nav me hevalên xwe de, tu hest bikî ku di mala xwe de yî.

Hevalê min Ebdulrehman Qasimlo!

Deh rojan berî niha te gote min ku xebat dijwar e, bi taybetî wî çaxî ku em li dora hev kom dibin û dibînin ciyê hinek hevalên me betal e. Ew hevalên ku me pêkve xebat dikir û di vê rêyê de hatine şehîdkirin.

Çend dijwar e!

Ebdulrehman! Bo bîstekê li cem me bimîne, û tu jî Ebdullah heya wî li cem me bimîne ku mêrên rêdîn reş û sipî, û jinên reşpoş destê hevaletiyê bo aliyê xelkê dinê dirêj dikin, îca çi bêjim bo vê hemû kuştara ku dikin û navê xwedê bi şahid nagrin.

Çavkanî: Rojnameya Kurdistan, hejmar 152

***

Beşa yazdehemîn:

- Dr. Qasimlo berbijarê xelata Aştiya Nubêl

- Yad û bîranîna kongireya Qasimlo

Dr. Qasimlo berbijarê xelata Aştiya Nubêl

Civata dostên neteweya Kurd li Utrîşê di 31.09.1989'an di civîna xwe de bi dengê giştî biryar da rêberê şehîd ê PDK Îranê Dr. Ebdulrehman Qasimlo bo wergirtina xelata sala 1990'an bi Komîteya xelata Aştiya Nubêlê bide naskirin. Civata dostên neteweya Kurd bo vê meremê komîteyek ava kirin ku sened û belgeyên hewce bo berbijarkirina wî berhev biket û bide komîteya xelata Aştiya Nubêlê.

Komîteya dîharîkirî piştî berhevkirina vê pêşniyarnameyê dest kir bi pêkanîna têkiliyan tevî wan kesayetiyên ku pêka usulên pejirandî ên xelata Aştiyê heqê piştevanîkirina ji berendametiya berbijarên wergirtina vê xelata cîhanî bi wan hatiye dan. Ew kesane evne bûn:

1-Pirofisorên: Felsefe, Dîrok, Zanistên Siyasî û mafê gelan.
2- Nûnerên parlemanê.
3-Ewên ku bixwe xelata Aştiya Nubêlê wergirtine.
4- Endamên dadgeha navneteweyî

Di encama têkiliyên komîteya navbirî de çend kesayetiyên kêrhatî di çend welatên Ewropayî de piştevaniya xwe ji pêşniyarkirina Dr. Qasimlo bo xelata Aştiyê eyan kirin ku evne bûn:

-Li Utrîşê 7 pirofisor û 16 nûnerên parlemanê.
-Li Îtalyayê 11 senator û nûnerên parlemanê.
-Li Çikislowakiyê 4 pirofisor ku yek ji wan nûnerê parlemanê bû.
-Li Almana Rojawa 2 nûnerên parlemanê.
-Li Feransayê 2 nûnerên parlemanê.
-Li Îslendê 1 pirofisor.
-Piştî evê ku van kesayetiyan piştevaniya xwe ragehandin, komîteya hilbijartî a Civata Dostên Gelê Kurd li Utrîşê hemû ew sened û belgeyên hewce ku pêkhatibûn ji pêşniyazname, îmzaya ewên ku piştevanî ji vê pêşniyarnameyê kiribûn, jiyannameya şehîd Dr. Qasimlo û gulbijêrek ji qise û nivîsînên Dr. Qasimlo, di roja 24.01.1990'an de şandne komîteya Xelata Aştiya Nubêlê li Norwêjê.

Li beşeke pêşniyarnameya Civata Dostên Gelê Kurd li Utrîşê de hatibû: Dr. Qasimlo çendîn salan li herêmekê de sekreterê giştî ê

PDK Îranê bû ku deshilatdaran dixwast pirsa Kurd ji rêya tepeseriyê ve çareser bikin, lê wî hertim dixwast ku mafên mirovî û siyasî ên gelê Kurd di Kurdistana Îranê de bi awayekî demokratîk, û ji rêya aştîxwazane ve destve bîne. Ev helwêsta li diruşma "Demokrasî bo Îranê û otonomî bo Kurdistanê" de xwe nîşan dide.

Di vê xebata parastina rewa de jî ku ji 10 salên rabihurî pêde ji aliyê rijîma serberedayî ve bi ser gelê wî de hatiye sepandin, wî hertim terorîzm û her karekî dijî mirovî bi tewahî ret dikir. Bi egera baweriya wî a zaf bi vê yekê ku "Demokrasiyê nirxa xwe heye û kesê ku demokrasiyê bixwaze divêt nirxa wê jî bidet", tevî nûnerên rijîmekê bo çareseriya aştîxwazane a pirsa Kurd kete hevpeyvînê ku bi eşkere ew mehkum bi mirinê kiribûn.

Em xatircem in ku dana xelata Aştiya Nubêlê bi Dr. Qasimlo, piştî şehîdbûna wî ji bo her cehdeke aştîxwazane li tewaya herêmê de wê haydaneke giring be.

Çavkanî: Rojnameya Kurdistan, hejmar 158

***

Yad û bîranîna kongireya Qasimlo

Dîharîkirina piştînîvroya roja 30.09.1370'an bo destpêkirina kongirê her bi vê meremê bû ku yekemîn roja kongirê bikeve yekemîn şeva zistan (Şeva Yelda)ê, salvegera jidayîkbûna wî rêberê şehîd. Lewma bernameya yekem roja karê kongirê bi wekirina kongirê û xwandina rapora Komîteya Navendî ji aliyê cîgirê lêhatî yê Dr. Qasimlo, yanî Dr. Sadiq Şerefkendî ve bi dawî hat, û wextê dinê jî bo yad û bîranîna Dr. Qasimloyê nemir û baskirina beşek ji rênimayî û şîretên wî ên bi nirx hatibû danîn.

Hetanî wî çaxî ku Dr. Qasimlo li nav me de bû hemû salê di roja jidayîkbûna wî de hevalên wî ên herî nêzîk cêjneke kûşke, lê di hemen demê de germ û xwexweyî digirtin û pîrozbahî li hev dikirin. Sala 1364'an jî ku kongireya heftemîn a PDK Îranê bo rêz û hurmetgirtina ji xebat û gernasiya pêşmerge li roja 26'ê Sermawezê, roja pêşmergên Kurdistanê de hate girtin û di roja 30'ê sermawezê de dawî bi karên xwe anî, Cêjna bidawîhatina kongirê tev cêjna jidayîkbûna rêberê mezin ê partiyê, tevlihev bû û beşdarên kongirê bi giştî pîrozbahî li mamosta û rêberê xwe dikirin.

Danîna navê Qasimlo li ser kongireya 9'ê û wekirina kongirê di salvegera jidayîkbûna Dr. Qasimlo de, herduk nîşaneyek bûn ji emegdariya dersxwan, hevxebat, û hevçeperên Dr. Qasimlo di hemberî kesekî de ku 20 salan bi zanayiya xwe PDK Îranê ber bi pêşkevtinê ve rênimayî kir. Lewma jî yad û bîranîna salvegera jidayîkbûna Dr. Qasimlo di civîna kongireya 9'ê de bi derfeteke baş zanîn bona bi bîranîna şîret û gotinên wî yên bi nirx. Di civîna yad û bi bîranîna Dr. Qasimloyê mezin de heval û hevçeperên wî hinde bîranînên şirîn û şîretên bihagiran yên Dr. Qasimlo bas kirin ku beşdarên kongirê hest bi vê yekê dikirin ku rêberê wan yê jidestçûyî di nava koma wan de ye û ev rêberê jidestçûyî li nav koma xwe de didîtin. Bi vî awayî yad û bi bîranîna mamostayê rêvîngên rêya demokrasiyê bi awayekî di nav dilê nûnerên kongirê de hate zindîkirin ku heya bidawîhatina kongirê jî ogirên dersên Qasimlo,

hest dikirin ku Dr. Qasimlo li rex wan e, û guhê wan bi dengê şîretên wî zingîn lê dihat.

Pêkhatin û bidawîhatina kongireya 9'ê di gelek waran de bo partiya me serkevtinek bû. Berî her tiştî li ber evê ku pêvajoya demokratîk a xebata partiya me berdewam bû. Eva yek ji şanaziyên PDK Îranê ye ku ji sala 1358'an pêde tevî evê ku gelê Kurd di Kurdistana Îranê de şerekî nexwastî bi ser de hatiye sepandin û PDK Îranê xebateke dijwar a çekdarî rêve dibet, hertim kongireyên partiyê bi vî awayî ku di peyrewa navxwe de hatiye, pêk tên û nûnerên rêxistinên curbicur ên PDK Îranê bi awayekî demokratîk li ser muqedera bizavê û çawaniya xebat û tekoşînên xwe biryara didin.

Serkevtina kongireya Qasimlo di vî warî de jî bo PDK Îranê bi serkevtin tê hesêbandin ku berevajiyê xewna aloz a neyarên bizava rizgarîxwazane ya xelkê Kurdistanê, PDK Îranê hevgirtîtir û yekparçetir ji caran di kongireya 9'an de hate der.

Çavkanî : Rojnameya Kurdistan, hejmar 193

***

Beşa dozdehemîn:

-Dr. Qasimlo ji dîtingeha kesayetiyên siyasî ve

Beşek ji gotara birêz kak Mistefa Hicrî di rê û resma dehemîn salvegera şehîdbûna Dr. Qasimlo û hevalên wî de

Gelî hevalên birêz ! Deh salan berî niha rijîma Komara Îslamî a Îranê bi xeyala jinavbirina tevgera gelê Kurd di Kurdistana Îranê de ev cenayeta mezin encam da. Lê erê gelo xewn û xeyalên wê ser girtin? Bo bersîva vê pirsyarê hewce ye hekî bi kurtî jî be, em tevgera Kurd ji alîkî ve û rewşa Komara Îslamî a Îranê ji alîkî din ve hilsengînin:

Rast e ku di vî heyamî de, bi taybetî di van çend salên dawiyê de bizava çekdarî di Kurdistana Îranê de kêmreng bûye, lê hemû xelkê Kurdistanê, hemû cînar û berî hemûyan jî Komara Îslamî bixwe baş dizanin ku ev kêmrengiya ne di encama xwedîhêzbûna rijîmê, û bê şiyaniya xortên gelê Kurd li dirêjîdana bi şerê çekdarî dijberî vê rijîmê, yan bêhêziya PDK Îranê di rêberîkirina bizava çekdarî a gelê Kurd di Kurdistana Îranê de ye, belkî sedema vê kêmrengiyê divegere ser hinek sebebên, coxrafiyayî û siyasî ên deverê. Ev sedemane jî çimku gelek rohn û eşkere ne, ez vira de basê nakim. Ku wisa bû tevgera Kurd di Kurdistana Îranê de bi giştî û PDK Îranê bi taybetî, dikarin di rewşa hewce de xebata çekdarî dest pê bikin.

Herwisa PDK Îranê hertim şerê çekdarî bi terzeke dasepayî yê xebatê zaniye, û her di wî çaxî de jî qet ev terzê xebatê bi kite rêya berêkaniya tevî Komara Îslamî nezaniye û nizane. Belkî li ser vê bawerê bûye ku li dijayetiya tevî rijîmê de gereke ji hemû terzên xebatê, ku terzê çekdarî jî yek ji wan e mifahê wergire. PDK Îranê her pêka vê bawerê jî çûye pêş, lewma kariye di vî heyamî de belengaziya gelê Kurd di Kurdistana Îranê de û rastiya berêkaniya gelê xwe tevî rijîmê, çêtir bi cîhanê bide naskirin, rûyê pîs û qirêj ê sîstema paşverû a zal bi ser gelên Îranê de baştir bo bîr û raya civatên xelkê cîhanê eşkere biket, û cîpêyeke qahîmtir ji pêşde di nav civatgeha cîhana pêşkevtî de xwe re peyda biket ku endametiya di Entirnasyonala Sosyalîst de yek ji wan cîpêyan e.

Di navxwe a welat de, gel zêdetir ji caran PDK Îranê re hez diket, û vê partiyê bi rizgarîderê xwe dizane. Dîsan jî ez dixwazim îşarê bi vê yekê bikim ku rijîm zêdetir ji her kesekî din ji van rastiyan agehdar e.

Lê Komara Îslamî niha piştî deh salan ku bi ser terora Dr. Qasimlo û hevalên wî re derbas dibe, ji her demekê zêdetir bêhêz bûye.

Di warê aborî de rewşa rijîmê ne baş e, bêkarî, dahata kêm û giraniyê, jiyan ji xelkê tal kiriye. Fesada îdarî, neşarezayî di rêveberiyê de, û duberekî ku di encama vê sîstemê de pêkhatine, alîgir û heta hinek ji rêveber û berpirsyarên pêşîn ên vê rijîmê bêzar kirine. Rijîm rojbirojê pitir di nava qofyekê de ku bixwe pêk aniye, bat dibe. Siyaseta terorîstî jî ne tenê her rijîm negehandiye bi armancên xwe, belkî ev siyaseta yek ji sebebên lawazî û ber bi nemanê ve çûna rijîmê bûye.

Hevalên birêz!

Komara Îslamî a Îranê 10 salan berî niha bi terorkirina Dr. Qasimlo her tenê rêberekî PDK Îranê şehîd nekir, belkî mamostayekî siyaseta nû şehîd kir ku li herêmê û bi taybetî di nav neteweya Kurd de kesayetiyekî bê heval bû. Siyaset bo Dr. Qasimlo bi wateya xwe ya îroyî zanist bû, lewma jî bi mejiyekî zanistî û akadimî li siyasetê dinihêrî. Ji vê dîtingehê ve wî hinek diyarokên nû anîne nava siyaseta bi kiryar de, ku heta niha jî di herêmê de mixabin kêmtir rêve diçin. Lê dersxwanên vî mamostayî di vî warî de dersên baş jê hîn bûn, û ev dersane kirne meşxela rêya dûr û dirêj a xebatê, û qet ji bîr nakin.

Yek ji van diyarokane geşandina îdealên mirovî di siyasetê de bûn. Tund û tîjiya tevî girtiyan, bi rehîngirtina mirovan, teqandina bombeyan di wan ciyên ku îmkana gihîştina zererê bi xelkê sivîl heye, û zordarîkirin li xelkê, ji wan diyarokane bûn ku Dr. Qasimloyê şehîd hertim dijberî wan bû. Di kelekela şeran de ku gundên Kurdistanê li jêr bombedûman û topbarana hukûmetê de dişevitîn, û jin û zarok, û pîr û ixtiyarên bê sûç, dibûne goriyên bêrehmiyên Komara Îslamî, di wî çaxî de ku pêşmergeyên herî gernas di şerê dijberî rijîmê de şehîd dibûn, û gurriya hêrs û toleya pêşmergeyan bilind dibû, rêniwîniyên mamostayê me ê mezin li berçavgirtina mafê êxsîrên şer bû. Renge kêm kes bawer biket ku

heyamekî dûr û dirêj xwarina pêşmergeyên parêzvanên girtîgehê û xwarina girtiyan, yek cure xwarin bûye û niha jî her wisa ye. Dr. Qasimlo baweriyeke zaf bi vê yekê hebû ku girtî û êxsîrên şer pêka yasa û prensîpên pejirandî ên navneteweyî hinek maf hene û ew maf divêt berçav bêne girtin û hurmet bo wan mafan bête danîn, û bêne parastin. Bo cîgirkirina van mafan di nava PDK Îranê de kêm nebûn ew berpirsên ku bi egera rêvenebirina van rêniwîniyan, û binpêkirina mafê girtiyan û êxsîrên şer bi tundî hatne ciza dan.

Encama vê siyasetê û li berçavgirtina rêniwîniyên Dr. Qasimlo, bû sedema evê ku girtîgeha PDK Îranê bibe xwendegeha demokratnasiyê. Bi sedan efser û serbazên rijîmê ku li şerê Kurdistanê de hatine girtin, piştî derketina ji girtîgehê bûne baştirîn "mubelix" bo nasandina PDK Îranê li seranserê Îranê de, û ew zilm û cinayetên ku derheq gelê Kurd hatine kirin, eşkere kirine. Hejmareke yekcar zaf ji ciwanên xeyrî Kurd ên neşareza, ku Axundên deshilatdar gelê Kurd û pêşmergeyên PDK Îranê wekî kafir û hov bi wan dabûne nasandin, û mejiyê wan şiştibûn, piştî evê ku di girtîgehên PDK Îranê de tevî reftara mirovî a pêşmergeyan rûbirû dibûn, ji direv û boxtanên Axundan bêzar dibûn, û her li wir peşîman dibûn, û heta hejmareke berçav ji wan hatne nava refên pêşmergeyên PDK Îranê de û beşek jî di şerê dijberî rijîmê de şehîd bûn, û praniya ewên ku wegeryane mala xwe, bi PDK Îranê re ketne nava têkiliyan de.

Yasayên dinê ên navneteweyî jî di siyaseta Dr. Qasimlo de ciyekî taybetî hebûn. Bi rehîngirtina mirovan yek ji wan yasayan bû ku di her şikl û şêweyekê de mehkum bû. Dr. Qasimlo, û bi peyrewî ji wî PDK Îranê, ne tenê her di tewaya heyamê şerê tevî rijîma Komara Îslamiya Îranê de çi kes bi rehîn negirtin, belkî wî çaxî jî ku di sala 1358'an de balyuzxaneya Welatên Hevgirtî ên Amrîkayê di Tehranê de ji aliyê kargêrên Komara taze bi deshilat gihîştî a Îslamî ve dest bi ser de hate girtin, û meimurên Amrîkayî bi rehîn hatne girtin, PDK Îranê yekem saziya siyasî bû ku ev kiryara dijberî yasa û pirensîpên navneteweyî zanî, û ev kiryara protesto kir. Eva di çaxekî de bû ku praniya herî zaf a partî û saziyên siyasî ên Îranê ew kiryara Komara Îslamî bi kiryareke baş û bi terzek ji xebata dijberî Empiryalîzma

Amrîkayê nav dibirin, û bi helwêsta PDK Îranê re nebûn, lê piştre her bo wan taqm û saziyan eyan bû ku PDK Îranê di vê helwêstê de çende hûrbîn bûye. Heta carna Dr. Qasimlo rehînên bîhanî bi pare û bi zehmeteke zaf azad kirine û bi silametî ew şandine welatên wan bixwe.

Qazanc û berjewendiyên neteweya Kurd bi giştî, û di vê çarçoweyê de parastina berjewendiyên Kurdistana Îranê bi tewahî, xîmê fikrî û bingehîn ya siyaseta Dr. Qasimlo pêk dianî, û bi çi awayekî amade nebû ku vê eslê ji bîr biket. Parastina berjewendiyên neteweya Kurd û avakirina serxwebûna partiyê li ser vê bingehê yek ji wan cudahiyên zeq ên li navbera Dr. Qasimlo û di encam de PDK Îranê tev hinek ji partiyên din ên herêmê bû. Vê siyaseta nû sitratêjiyeke wisa bo PDK Îranê danî ku niha jî wekî armanceke bilind li ber çav e, û yek ji sebebên çûne serê a hitbar û piristîja PDK Îranê di herêm û cîhanê de ye.

Ji bilî diruşma "Demokrasî bo Îranê û otonomî bo Kurdistanê" ku diruşma sitratêjî a PDK Îranê ye, û nîşanderê ogiriya PDK Îranê bi seranserê Îranê ye, Dr. Qasimlo bo serxwebûna Îranê û bexteweriya gelên vî welatî cehd û tekoşîn dikir û zaf caran basê vê rastiyê dikir ku demokrasî di Îranê de baştirîn zamina destveanîn û parastina otonomiya gelê Kurd û gelên din yên Îranê ye. Wî di pêxema vê boçûnê de jî gelek cehd dikir da ku nexweşiyên navbera hêzên seranserî bi rûniştin û ji hev halîbûnê bi dawî bîne, û wan dijberî Komara Îslamî a Îranê wekî dijminekî eslî ê hemû gelên Îranê hevgirtî biket, û bi vî awayî xebata PDK Îranê tevî xebata seranserî a gelên Îranê bi hev re girêdet. Sedaqet û rastbêjiya Dr. Qasimlo û PDK Îranê di vê siyaseta Îranîbûna wan de ew hinde xwedîhêz bû ku heta boxtanên hijmareke berçav ji Îraniyên şowînîst jî wekî guneha cudahîxwaziyê, nekarîn kêmtirîn bandorê li ser vê bîr û bawerê danên û her lewma jî Dr. Qasimlo yek ji wan kesayetiyên herî xweştivî ên siyasî di nava wan azadîxwaz û rewşenbîrên Îranî de bû, ku ew nas dikirin.

Di serdemekê de ku Sovyeta berê û siyaseta eniya sosyalîstî di cîhanê de, ji aliyê beşeke zaf ji partî û kesayetiyan ve wekî tişteke pîroz lê dihate nihêrîn, û lomekirina ji wan siyasetan wekî kofr û

xulamokiya ji empiryalîzmê re dihate hesêbandin, di çaxekî de ku berjewendiyên gelan ji dîtingeha berjewendiyên partî û hukûmetên deshilatdar, di van cure welatan de lê dihate nihêrîn, di çaxekî de ku dîktatoriya partiyên deshilatdar û dîktatoriya hukûmetan di gelek ji welatên sosyalîstî de wekî demokrasiya gelî hatibû naskirin, û li jêr vê navê de şûnwarên demokrasiyê birandibûn, Dr. Qasimlo ragehand ku, berjewendiya gelê Kurd li serweyî her tiştekî ye. Wî got: "Hekî di navbera qazancên neteweya Kurd û eniya sosyalîstî de dijberî bête pêş, emê qazancên neteweya Kurd hilbijêrin". Bi vî awayî sosyalîzma mucud xiste ber gazinda û sosyalîzma demokratîk anî holê. Şikandina vê tabûyê ji aliyê şehîd Dr. Qasimlo ve kete ber êrîşa hijmareke zaf ji rêxistinên bi nav çep ên herêmê, ku tenê xwe bi mîratger û şirovevanê marksîzmê dizanîn.

Li ber ronahiya vê siyasetê sînorê navbera dost û dijminên neteweya Kurd bo Dr. Qasimlo gelekî rohn û eşkere bû, û ew hetanî şehîdbûnê jî qet amade nebû vî sînorî têk bidet, û berevajiyê hinek kesan ku dijminên gel bi dost nav dibin û dostan jî bi dijmin, û bi vî awayî rastiyan ji xelkê diveşêrin, Dr. Qasimlo bo carekê jî ne bi nivîsîn û ne bi qise serê xwe bo dijminên neteweya Kurd şorr nekir û ew bi dost nehesêbandin. Ew qet amade nebû çi têkiliyekê tevî wan dewletên ku Kurd bi ser de hatine parvekirin, li ser hisaba Kurdên vê beşê û bi zerera wan pêk bîne.

Demokrasî û mafên mirov bo Dr. Qasimlo emrazek bo xwe mezinkirinê nebû. Wî bi hemû bîr û bawera xwe ve basê van mesela dikir û bi kiryar jî pêngav jê re hildigirt, yek ji wan pêngav hilgirtinan jî geşekirina demokrasiya nav partiyê de bû. Pêkanîna kongireyan, konferansan, û pilînomên partiyê li ser wextê xwe, û haydana hevalan bo beşdariya çelengane di wan civînan de, û eyankirina bîr û raya azad, belgeyên rohn û eşkere ne di warê baweriya zaf a Qasimlo bi demokrasiyê.

Mamostayê şehîd ê neteweya Kurd, wekî şoreşvanekî rastîn dijberî tewaya wan diyarokan bû ku nîşana kevneperestiyê bi wan ve ye, û sebebê eslî ê paşvemayiya neteweya Kurd in. Wî di tewaya heyamê tekoşîna xwe de jî bo nehêlana wan diyarokan di warê çanda civakî a Kurdîniyê de cehd dikir. Ew dijberî perçiqandina jinan û

cudahîdanîna di navbera keç û kuran di malbatê û civakê de bû. Heyamê deshilatdariya PDK Îranê li Kurdistanê, û rêvebirina yasaya taybet bo pişteva nî ji mafê jinan, û cizadana wan kesên ku berevajiyê wan yasayan dimeşiyan ji aliyê PDK Îranê ve, serbarê hemû wan astengên li ser rê, nîşana baweriya tewaw a Dr. Qasimlo û partiya wî bi van mafan bû.

Belê hevalên giranqedir!

Mamostayê zana û xwedîşiyan ê siyasetê, bi vê bîr û bawera pêşkevtî û bikaranîna wê di qada kiryarê de, xîmê PDK Îranê wisa qahîm daniye, ku ne xedra dijminan, ne pîlana neyaran, û ne heta şehîdbûna cîgirê wî Dr. Sadiq Şerefkendî jî, nekarî wî bêxe qedema. Hekî PDK Îranê her wisa xweştiviyê gelê Kurd li Kurdistana Îranê, û ciyê hitbar, bawerî, û hurmeta demokrat û azadîxwazên cîhana pêşkevtî ye, sedem rêniwînî û dersên Qasimlo ne. Lewma niha jî bi xatircemî ve em dibêjin, Dr. Qasimlo di bîr û rêbaza xwe de her zindî ye.

Ew bîr û bawerên pêşkevtinxwazane û mirovî, û rêvebirina wan di qada kiryarê bûne sedema evê ku dijminên azadî û pêşkevtinê, neyarên gelê Kurd, kevneperest û dilreş bi taybetî kore peleçengên xwînmij ên deshilatdar di Tehranê de ku ji têgihîştina şehîd Qasimlo ditirsiyan, seba mirina Dr. Qasimlo cêjnê bigrin. Lê Qasimlo ew kotrê per û bal xunîn bû ku li Viyenê, di nava dilê Ewropaya azad û demokrat de hewara aştî, biratî û belengaziya netewa xwe bi cîhanê ragehand. Wî bi mirina xwe bi cîhanê da zanîn ku ewên bi navê Îslamê di Îranê de deshilat destve girtine, aştîxwazan bi firt û fêl û îxanetê dikujin. Ew Hellacê serdem bû ku banga "Enelheq" a demokrasiyê gehande guhê cîhanê. Kî ne ku ew dengê zelal guhdarî nekiribin?

Bi vî awayî Qasimlo bû ew xwîna ku di nava demarê her azadîxwazekî/ê de digere, bû xweştiviyê dehan milyon Kurdên bextreş û êxsîr di destê zordaran de. Ew bû meşxela di destê xebatkarên rêya xwe de. Lewma em dibêjin ey mamostayê me ê zana, tu nemirî, ew kesane mirin e, ku tu kuştnî. Emên demokrat her wisa emegdar in bi vê ehda ku deh salan berî niha li ser emegdariya bi rê û şopa te me daye, û em te xatircem jî dikin ku rêya te hetanî

gihîştina bi armancên te bidomînin, û alaya xebata te herwisa qît ragirin, û em hêvîdar in ku em hejayî vê yekê bin ku bikarin rêvîngên heta ser yên rêya te bin.

Çavkanî: Rojnameya Kurdistan, hejmar 273

Ew rêberê ku di hemû warî de lêhatî bû

N: Dr. Kemal Mezher

Buhara sala 1959'an yanî çil salî berî niha, bo yekemîn car navê Enwerî, ku yek ji naznavên Dr. Qasimlo bû, ber guhê min ket. Xwendekarên beşa Kurdî a zanîngeha Bexdayê, ku taze ew zanîngeh hatibû wekirin, bi rêz û hurmeteke zaf ve mehta vî mamostayî dikirin û basa dersên wî ên dewlemend dikirin, û di vî warî de pileya yekemîn dabûne wî û Goranê helbestvan.

Helbet naskirina rewşenbîrekî hankî pêşkevtinxwaz û payebilind, hêvî û xweziya her Kurdekî/ê dilsoj bû. Ji rêya birayê xweştivî Dr. Izeddîn Mistefa Resûl ve her zû derfeteke wiha bo min pêk hat. Wê roja ku min bo cara yekemîn ew li mala wî bixwe di taxa Kerade Meryema Bexdayê de dît, min hest kir ku Dr. Qasimlo di gişt warî de bi rastî Kurdekî kêm hevta, qisezan, qisexweş, welatperwer û zanayekî dûrbîn e.

Gelek nekêşa ku di encama nexweşiya kujek a "Derdê Kurda" de, Dr. Qasimlo ji Îraqê hate derêxistin. Vê biryarê dilê min hinde êşand ku min tab nekir û min zû gotareke tund li jêr nav û nîşanê "Bo çi" nivîsand û min tê de gelek bi soz ve basa lêhatiya bê reje a şehîdê mezin kiribû, ku gereke hertim deriyên Îraqa piştî şoreşa Gelawêjê jêre vekirî bin. Sernivîskarê wî çaxî ê rojnameya **Jîn** Ehmed Ziringî newyê Pîremêrd ew gotara min hinde bi dilê wî bû ku ew gotara min kire serxeta rojnameya **Jîn**. Wisa dîhar bû ku gotara min gelek kerbê nebimbarek yê yek ji wan birayên Kurd wekirbû, û mîkroba "Derdê Kurda" tevlî xwîna hemû demarên cendekê wî bibû, lewma gelek bi tundî li ser rûpelên rojnameya Jîn bersîva min dabû û gelek bêhurmetî bi Dr. Qasimlo kiribû. Lê mirov heq bêje, wî nav û nîşaneke baş bo bersîva xwe a nebaş hilbijartibû, ku ew jî "Çimku" bû. Dema bersîva wê "Derdê Kurdawî" çap bû, ez gihîştibûme welatê Sovyetistana berê bo xwandina bilind. Dr. Qasimloyê şehîd rojnameya Jîn ji Pragê min re şande Muskoyê, û wekî caran çend

xetek jî rênimayî û şîret tevî vê rojnameyê min re şandibûn. Ez bêjim nêzîkî dawiya sala 1960'an, yan destpêka sala 1961'an bû ku şehîd Qasimlo hate welatê Sovyetistana berê bo komkirina zanyariyan li ser basên têza xwe a doktorayê. Wê salê ez jî li wir mijulî Xwandinê bûm. Min didît ku wî çawa serê xwe kiriye nava pirtûkan de û mijulî lêkolînan e, û çende nevest bû. Her di wan rojan de jî bû ku min zanî kêm kes di cîhanê de hindî wî zimanên Rojhilatî û Ewropayî dizanin. Wî wekhev her du zarawayên sereke ên Kurdî, Farsî, Azerî, Tirkî, Erebî, Îngilîzî, Feransewî, Rusî, Çikî, Silowakî û hwd… baş dizanîn.

Min li rûniştinekê li mala xwe di Bexdayê de Dr. Qasimlo dît ku çawa tevî Mobîk (Kirîs Koçîra) û hevjîna wî, wekî bilbilê bi Feransewî dipeyvî, û hetanî ku wan pêkve qelpikek digotin, wî çar qelpikên ji wan xweştir digotin û îca her pênc jî me re dikirne Kurdî û em hemû keyfxweş dikirin. Ew hertim gula meclîsê bû, li çi tiştekî de kêm nedianî. Ew di gişt waran de -siyaset, dîrok, wêje û hwd…de- çelenge siwarê meydanê bû, heta terzê qisekirina wî jî pêka basan diguherî. Lewma ewên ku ew nas nedikirin, nedizanîn ku ew egîde mirovekî siyasî ye, yan helbestvan, torevan, zana, dîrokzan û zimanzan e. Çimku di rastî de ew di gişt waran de şareza bû.

Ez dehan carî bi wî re rûniştime, min kêm kes wekî wî zimanpak, rihsivik û birumet dîtine, wî qet xwe mezin nedikir û qet jî hez nedikir ku bi mirovên pûç re têkilî hebe. Heta di wextê hewce de jî bi xirabî basê kesê nedikir, agirxweşker nebû, bi berevajî li pêkanîna hevgirtinê di navbera dijberan de şareza bû. Di vî warî de kes wekî wî mamosta nebû.

Min hejmareke zaf ji wan hevpeyvînên ku rojnamevanên Rojhilatî û Rojawayî bi wî re pêk anîne, xwendine. Hemûyan bi soz ve basa zanayiya wî di gişt warî de kirine û wekî rêberekî dûrbîn, demokrasîxwaz, gernas, cangorî, serrast, aştîxwaz, edebdost û qisexweş bas lê kirine. Hemû jî bi destkevtên pirr ji zanyariyên hûr û kêmxuya û bi dilekî pir ji mohbet ve xatirê xwe jê xwastine. Ewa ku Kirîs Kuçêra û Hoda Elhosêynî û zaf kesên din li ser Dr. Qasimlo dibêjin, şanazî ye bo her Kurdekî dilsoj û welatperwer.

Xwazî ku rêvîngên rêya Dr. Qasimlo ev hemû berhemane di pirtûkeke serbixwe de diweşandin, ku ez xatircem im wê bibe

rêberekî kêmxuya û hewce bo neteweya Kurd. Gotinên wî bi Rojawayiyan re gelek bi seng, nirxandinên wî bi cî, û boçûnên wî hûr bûn. Dr. Qasimlo nûçegehanên derekî hisabî diêxistne tengawiyê de, dema ku digote wan: "Kurd jî dikarin balafira bidizin û rehînan bigrin û bibin, û xwîna xelkê bê sûç birêjînin. Heta kengê hûn van rastiyan fam nakin û bala xwe nadne wî gelê belengaz?…"

Hekî ez bême ser basa berhemên wî yên bingehîn û kêm xuya, ez dikarim gelek bêjim, bi taybetî li ser têza wî a doktorayê, ku hetanî niha seba bihagiraniya zaf a vê têzê, ev têza bi çend zimanên Ewropayî û Rojhilatî hatiye çapkirin. Li wextê xwe di rojnameya "Elteixî" de min gotareke taybetî di vî warî de belav kir, û min ew berhem bi yek ji pirtûkên zanistî di warê Kurdnasî de hesêband.

Evîna şehîd Dr. Qasimlo bi Kurd û Kurdistanê bê sînor bû. Çi kesî berî wî nekarîbû wekî wî têna vê evîna pîroz bigehîne Ewropayê. Wî hesta dehan siyasetvan û kesayetî û rojnamevanên Ewropayî ên navdar bo aliyê doza neteweyî a Kurdan rakêşa. Herwisa Dr. Qasimlo welatparêzekî Îranî û mirovekî mezin ê cîhanê bû. Bê şik û guman dîrok bi kerb û kîn ve dê binêre wan destên pîs û qirêj ku gelek hovane, û li jêr bandora kerb û kîna bi cî mayî ji sedsalên navîn ev heqa dane xwe ku me, xwe, û xelkê dinê jî, ji ronahiya vê stêra bilind a esmanê Kurdistan, Îran û turanê weqetînin. Ew stêra geş ku Bêrnard Kuşnêr şalyarê karûbarên mirovanetiyê ê Feransayê di çaxê avabûna wî de bi dilekî pir ji keser û çavên pir ji rondik ve gotê: "Di tewaya cîhana sêyem de kes wekî te bi dilê min nebû".

Çavkanî: Rojnameya Kurdistan hejmar 272
Pirtûka: Rêberêkî Modêrn û Şorişgêrêkî Dîmokrat

***

Dr. Qasimlo parêzvanê rastîn ê sosyalîzma demokratîk

N: Rewez

Şik û guman di vê yekê de nine ku hekî serhildana yekemîn dewleta sosyalîstî a cîhanê li Sovyetistana berê di kelekela şerê yekemîn ê cîhanî de yek ji wan bûyerên giring û ciyê heyrîmanê ên sedsala 20'an bû, hilweşiyana nizama sosyalîstî di praniya welatên

Eniya Rojhilat de, piştî bihurîna pitir ji 70 salî bi ser avabûna sosyalîzmê, bûyera herî mezin a siyasî û civakî ya dehka dawiyê a sedsala 20'an bû, bûyerek ku hem guherîn bi ser erdnîgarî (Coxrafiya) a siyasî û muqedera praniya gelên wan welatan de anî, û hem jî bû sedema vejiyana sertaze ya wan arîşeyên ku sosyalîzma mucud nekarîbû bi awayekî bingehî wan çareser biket, ew arîşeyên ku niha jî piştî bihurîna çendîn salan pêsîra mirovahiyê ber nedane.

Eva ku bo çi piştî bihurîna vî heyamê dûr û dirêj bi ser avabûna sosyalîzmê di praniya welatên sosyalîstî de, û di çaxekî de ku dijminên serhişk ên urdugeha sosyalîzmê jî çavnihêr nebûn, nizama sosyalîstî tûşî vê muqederê bû, eva pirsyarek e ku her kes pêka dîtingeh û îdeolojiya xwe ya xasmanî bersîva wê didet. Hizirvan û şarezayên pirsên sosyalîzmê serbarê hebûna hinek cudahiyan di bîr û boçûnan de, li ser du rastiyan derheq şikesta sosyalîzma mucud hevdeng in, ya yekemîn: Sepandina dîktatoriya partiyên komunîst di welatên sosyalîstî de, û nebûna demokrasiya siyasî û piloralîzma fikrî. Ya duyemîn: Xurtnebûn û di encam de sekinîna aboriyê li sosyalîzma mucud de, û bê şiyanî li hevrikiya tevî cîhana sermayedariyê di praniya waran de.

Ji bilî dijmin û neyarên urdugeha sosyalîstî ku dijberî her terze bîreke dadperwerane ne, û herwisa ji bilî wan rêxistin û kesayetiyên ku peyrew û çavlêkerên welatên sosyalîstî ên berê û bi taybetî Sovyetistana berê bûn, û her terze gazindeyek ji sosyalîzma mucud bi dijminatiya tevî sosyalîzmê û mehtkirina sermayedariyê dihesibandin, partî û rêxistin û kesayetiyên wisa jî hebûn ku tevî vê hindê ku baweriyeke qahîm bi dada civakî û sosyalîzmê hebûn û dijayetî tev her terze nizamekê dikirin ku li ser bingeha perçiqandina mirov bi destê mirov hatibe avakirin, modêla sosyalîzma mucud di Sovyetistana berê û welatên din ên urdugeha sosyalîstî de rawestayî û bi dûr ji her terze sosyalîzmeke mirovî dizanîn û lome li kêmasiyên wê dikirin. Di nava vê beşê ji hêzên çep ên serbixwe de PDK Îranê û şehîdê nemir Dr. Qasimlo ciyekî taybetî di nava partî û rêxistin û kesayetiyên siyasî ên Îranê û Kurdistanê de hebû.

Rêberê zana yê PDK Îranê bi weşandina namîlkeyekê li jêr navê "Baseke kurt li ser sosyalîzmê" di sala 1362'an de ku piştî çend

heyvan di kongireya 6'an de hate pejirandin, tevî îşarekirina bi hewcehiya cîgirkirina sosyalîzmê ji bo destveanîna dada civakî di Îranê û Kurdistanê de ew sosyalîzma şirove kir ku PDK Îranê dixwaze di pêşerojê de ava biket.

Dr. Qasimlo di vê namîlkê de tevî îşarekirina bi kêmasî û ji rê derketina nizamên sosyalîstî ên Eniya Rojhilat ji vê sosyalîzma ku armanca rêberên bizava kedkarî bû, herweha nebûna demokrasiyê di sosyalîzma mucud de bi zerereke mezin dizanîn û pê li ser vê yekê dadigirt ku her di bingeh de her nizameke îdolojîkî û her terze îdolojiyeke deshilatdar li her form û nawerokekê de be, bi neçarî dibe dîktatoriya îdolojî, û partiya deshilatdar, û di encam de dibe dîktatoriya bi bê qise ya rêveberiya partiyê.

Rêberê PDK Îranê tevî retkirina her terze dîktatoriyekê bo mînak dîktatoriya piroltarya bi piştrastiya bi nivîsînên bizava kedkarî, Marks û Engils ev rastiya anî ber basê ku di çaxê cîgirkirina sosyalîzmê de demokrasiya sosyalîstî di hemû waran de, çi demokrasiya siyasî a kitekesî û çi jî demokrasiya siyasî a giştî û civakî divêt rêve herin.

Dr. Qasimloyê nemir bi îşarekirina bi karesatên xunîn ên welatên wekî Mecaristan, Almana Rojhilat û Çikislowakiyê ku bixwe ji nêzîk ve agehdarê hinek ji wan bûyeran bû, gihîştibû vê rastiyê ku heta aboriya sosyalîstî nehête demokratîzekirin, heta ku ew azadiyên ku beşek ji destkevta şoreşên borjiwa demokratîk ên welatên Rojawayî bûn, tevlî dada civakî nehêne kirin, sosyalîzm nikare pêvajoya xurtbûn û pêşkevtina xwe bidomîne û bi tewahî cîgir be.

Ji alîkî din ve rêberê zana ê PDK Îranê di vê namîlkê de îşare bi destkevtên bi seng ên nizama sosyalîstî bo pêregihîştina bi aliyên perwerde û hînkirinê, saxlemiyê, hevkarîkirina bi malbatên desteng, pêkanîna dem û dezgehên çandî û hunerî û hwd… diket û vê rastiyê qebûl diket ku sosyalîzmê kariye gelek zêdeyî (Imtiyaz, çûr) ên bêdadiyê ji nav bibet. Ew derheq diruşma PDK Îranê dinivîse: "Otonomî, Demokrasî, Sosyalîzm. Ku wisa bû em daxwazkarê nizameke sosyalîstî ne ku bi rewşa welatê me re yek be, ku hem mafê diyarîkirina muqederê bi terzê xudmuxtarî, demokrasî û azadiyên demokratîk tê de cîgir bin, û hem jî di encama jinavçuna

perçiqandina mirov bi destê mirov de, têkiliyên sosyalîstî bi ser mirov de zal bin".

Sekreterê giştî ê PDK Îranê di rewşekê de namîlka "Baseke kurt li ser sosyalîzmê" nivîsand ku, ya yekem: Çi kesî pêşdîtin nedikir ku xîmê sosyalîzma mucud ku qahîm dihate berçav, hankî hilweşe. Ya duyem: Zirûfa zal bi ser tevgera çep di Îranê de ku bi giştî li jêr bandora teblîxata bi firt û fêl a hinek partiyên wekî Partiya Tude de bû, nedikarî lome û gazindeyekê ji urdugeha sosyalîstî û sosyalîzma mucud qebûl biket. Di vî warî de em bi ciret ve dikarin bêjin ku rêberê zana ê PDK Îranê di refa vê hejmara kêm ji kesayetiyên Îranî û Kurdistanî de bû ku serbarê vê hindê ku gelek naznavên kirêt didanîne ser, lê dîsan jî wî di rewşeke hankî de kêmasî, şaşî, û ji rê derketinên sosyalîzma mucud anîne ber bas, û rastî jî her bi vî terzî ku hebûn bas kirin.

Ji bilî vê yekê jî belavkirina vê namîlkê di nav bizava neteweya Kurd, û di nava PDK Îranê de jî, wî çaxî bihagiraniyeke zaf hebû. PDK Îranê wekî partiyeke demokratîk û neteweyî, her di vî çaxî de ku xwe bi pêşengê tewaya xelkê Kurdistanê û bi taybetî kedkaran, cutkaran, zehmetkêşan û rewşenbîrên Kurd dizanî, qet ev deiya nedikir ku partiyeke îdolojîkî û xwediyê cîhanbîniyeke taybetî ye, ku wisa bû her Kurdekî/ê Îranî û her yek ji rûniştiyên Kurdistana Îranê bi mercekê ku bernameya PDK Îranê qebûl bikin, bi bê berçavgirtina bîr û rayên wan dikarin di nav partiyê de û hevpêngav tev partiyê bo destveanîna armancên partiyê û gel tekoşînê bikin. Ev rastiya bibû sedema vê yekê ku rê bo serhildana pêvajoyekê di nav partiyê de xweş be ku rast dirêjîderê pêvajoya naskirî bi "Tudêîsm" ê bû, ku hingê bi giştî per û balê xwe bi ser bizava çep di Îranê de kêşa bû. Belavkirina namîlka "Baseke kurt li ser sosyalîzmê" cudakirina refa demokratên rastîn ji refa wan kesane bû ku bi her awayekî xwe xişikandibûne nava refên partiyê de, û ciyê xwe di nav bizava Kurd de xweş kiribûn.

Rêberê şehîd Dr. Qasimlo berevajiyê hinek ji partî û rêberên wan ku berjewendiyên xelkê bi qazanc û berjewendiyên welatên sosyaslîstî ve girê dabûn, û bi kiryar nîşan didan ku seba qazancên urdugeha sosyalîstî û sosyalîzma mucud hazir in pişta xwe bidne

berjewendiyên xelkê, di vê namîlkê de îşare bi têkiliya partiyê bi welatên sosyalîstî ên berê re diket û dibêje, PDK Îranê û neteweya Kurd di Kurdistana Îranê de wekî her partî û neteweyeke xebatkar rêz û hurmetê ji hevaletiya xwe û welatên sosyalîstî û li serweyî hemûyan Yekîtiya Sovyetê digre, û cehd û tekoşînê diket ku ji vê hevaletiyê bi qazancê ber bi pêşvebirina xebata neteweya me mifahê wergire, lê naxwaze bi nirxa domandina vê têkiliya dostane serxwebûna siyasî a xwe û netewa xwe binpê biket, û hekî rewşek bête pêş ku ji van du rêkan rêkekê hilbijêre, bêy çi şik û gumanekê wê berjewendiya netewa Kurd û serxwebûna siyasî a PDK Îranê hilbijêre. Partiya me berevajiyê hinek partiyên paşbend, ne ji dîtingeha berjewendiyên urdugeha sosyalîstî ve dinihêre berjewendiya neteweya Kurd, û ne jî bona gihîştina bi armancên neteweya Kurd hazir e hewara xwe bibe ber her tiştekî.

Herçend ku nêzîkî 10 salî bi ser hilweşiyana urdugeha sosyalîstî û sosyalîzma mucud re derbas dibe, û herçend ku namîlka "Kurte basek li ser sosyalîzmê" li serdemê deshilatdariya urdugeha sosyalîzmê de -ku tev rabihûrî çû- hatiye nivîsandin û pejirandin, lê wekî belgeyeke dîrokî ku nîşana têgihîştina serast û rastmêze (Waqiibînane) ya PDK Îranê û rêberê şehîd ê PDK Îranê ji sosyalîzma demokratîk e, giring û bihagiraniyeke taybetî heye.

***

Dr. Qasimlo Ensîklopîdyayeke zindî bû

Hevpeyvîna rojnameya Kurdistan, organa Komîteya Navendî a PDK Îranê tevî Kirîs Kuçêra nivîskar, rojnamevan û dostê neteweya Kurd, seba dehemîn salvegera şehîdbûna Dr. Qasimlo

Pirsyar: Birêz Kirîs Kuçêra! Em hez dikin bizanin ku cara yekemîn tu çawa tev Dr. Qasimlo nasyar bûyî? Li kuderê, û we bi hev re çi hevpeyvîn pêk anîn?

Bersîv: Hevdîtineke ciyê heyrîmanê bû. Ez di sala 1971'an di Derbenda Çoman li mêhvanxaneya Barzanî de tevî Dr. Qasimlo nasyar bûm. Wî çaxî ez bo dîtina Barzanî çûbûme wir. Di vê mêhvanxaneyê de min mirovekî bi rumet dît ku kincên Ewropayî ber

kiribûn. Çimku min jêve bû çi kes zimanê me nizane, min bi zimanê Feransewî ji hevjîna xwe pirsî: "Erê tu bêjî ev kesa bi me re nanê taştê bixot yan ne? Ji nişkêve min dît wî bi zimanê Feransewî bersîva min da û got: "Belê, ev mirove dixwaze tevî we nanê taştê bixot"!. Ez pirr heyrî mam. Dema nanxwarinê li ser siyasetê me pêkve qise kir. Wî gelek zû ez kirme ogirê xwe, çimku wî zanyariyên yekcar zaf hebûn. Min ji wî kesî ku wekî beled tevî me bû pirsî, erê eva kî ye? Got: "Dr. Qasimlo ye". Min ji Dr. Qasimlo pirsî, erê ez dikarim di Bexdayê de te bibînim? Wî hejmara telefona xwe da min. Bi vî awayî ew yekemîn mamostayê min bû di nasandina dîroka Kurdistanê de. Ew li ser çûna bavê xwe bo Bakûyê û herwisa li ser Komara Mehabadê min re axivî. Wî li ser Barzanî gelek zanyariyên hûr, û têr û tijî dane min. Di rastî de ew Ensîklopîdyayeke zindî bû. Her di vî çaxî de jî wî hez dikir qelpikên xweş bêje û bikene. Mirovekî gelek rûxweş bû. Wî ceribandinên serdemê xwendekariya xwe di Parîsê de min re bas kirin. Bi kurtî me bingeha hevaletiyeke qahîm ji xwe re danî.

Pirsyar: Her wekî me bihîstiye, piştî yekemîn hevdîtina we tevî Dr. Qasimlo, tu û hevjîna xwe, we li Bexdayê seredana binkeya PDK Îranê kir. Dibêjin te li wir soz da Dr. Qasimlo, ku li ser pirsa Kurdên Îranê bi rayedarên Îranê re hevpeyvînê bikî, Erê gelo ev derfet te re pêk hat? Te bi kîjan yek ji rayedarên rijîmê re karî hevpeyvînê bikî? Tu gihîştî çi encamekê?

Bersîv: Di rastî de min Howêyda dît. Dixwast here Zahidanê, wî daxwaz kir ku em pêkve herne Zahidanê, min di nav balafirê de tevî wî hevpeyvîn kir û derheq pirsa Kurdan jî, min hinek pirsyar lê kirin. Ez bêjim ev sefera di sala 1973'an de bû. Ev hevpeyvîn di kovara **Îkspirîs** de hate çapkirin. Tewaya hevpeyvînê nayê bîra min. Ez bêjim Howêyda got: "Me di Îranê de pirsek bi navê pirsa Kurdan çinine". Ev hevdîtina heyamekî berî lihevhatina Îran û Îraqê bû. Lê Howêyda tişteke wisa bas nekir. Min deqê tewaya vê hevpeyvînê di arşîva xwe de parastiye. Lê muxabin ev hevpeyvîn bi tewahî di bîra min de nine. Howêyda siyasetvanekî zîrek bû. Wî baş dizanî ku çawa xwe li ber bersîvdana bi pirsyarên hesas hawêje.

Li serdemê deshilatdariya Şah de, ez çend caran çûme Îranê. Ev xwaringehên ku em tê de diman -çimku mîkrofonên nepenî tê de danîbûn- wextê ku me basa Dr. Qasimlo dikir, me yekem pîta navê wî û naznavê wî (ARG) bi kar dianî. Niha jî li Ewropayê û di kombûnên dostane de, em bo bîranîna wî, van pîtan bi kar tînin. Hevjîna Dr. Qasimlo bixwe jî wextê ku bi me re diaxivî, her ev pîtane bi kar dianîn.

Pirsyar: Erê gelo nasyariya te tevî Dr. Qasimlo û PDK Îranê bû sedema vê çendê ku hûn xwe pitir bi doza Kurd û xebata Kurdan ve bivestînin?

Bersîv: Her wekî min di bersîva pirsyara yekem de got, Dr. Qasimlo kesayetiyeke yekcar balrakêş hebû. Wî li ser dîrok û çanda neteweya Kurd hinde zanyariyên bi nirx û balrakêş dane min, ku di rastî de ez bûme ogirê vê pirsê. Her wekî min bas kir em bûne hevalên hevdu yên herî nêzîk. Gelek caran me yektir didît. Ez çend caran li Bexdayê mêhvanê wî bûm. Em siwarê pêjoya wî a kevn dibûn û pê digeriyan. Carna wî digot: "Hûn dibînin?! Dijminên min dibêjin Dr. Qasimlo siwarê bênza axir sîstim dibe".

Dr. Qasimlo ez tevî çend kesayetiyên Kurd ên navdar, wekî Hejar û Hêmin nasyar kirim. Bi Hêmin re ji bilî şerabê me çi xalên hevbeş çinebûn, lê dîsan jî me zaf şevên xweş bi hev re bihurandin. Ji bilî vê yekê jî wî hinek kesayetiyên din, wekî Hemze Ebdullah bi min dane nasandin. Ev pirsa bo min gelekî giring bû. Çimku nasyarî û hevdîtina tevî kesayetiyên mezin hertim bo min giringiyeke taybetî hebûye. Bo nûçegihanekî/ê gelek giring e ku destê wî/ê kesayetiyên kilîdî re bigihîje. Dr. Qasimlo derheq doza Kurd kilîdeke giring bû, bi taybetî ku gelek zana bû û hesteke bê binî û mirovî hebû.

Pirsyar: Min bihîstiye ku pilînomeke Komîteya Navendî a PDK Îranê li mala we di Feransayê de hatiye girtin ku Dr. Qasimlo serperestê wê civînê bûye. Hekî hûn dikarin me re bas bikin, em hez dikin bizanin ku çawa bû we izin da ku ev civîna di mala we de pêk bihêt?

Bersîv: Min di pirtûka xwe a duyemîn de ku li ser doza Kurdan nivîsandiye, min îşare bi vê yekê kiriye. Em li dolekê li nêzîkî **şambur** di koşkeke mezin de dijiyan. Me ciyekî pan û berfireh hebû,

wî çaxî rewşa malî a PDK Îranê baş nebû. Min gote Dr. Qasimlo, ew cî ciyekî gelek baş e, tu dikarî bi hevalên xwe re bêy wir. Pîrejinek ku li wir dijiya, gelek baş Dr. Qasimlo nas dikir. Vê jinê di wan sê çar rojên ku civîna Komîteya Navendî berdewam bû, karê xwarin û vexwarina mêhvanan dikir. Beşdarên pilînomê gelek hejê vê pîrejinê dikirin, û hevkariya wê dikirin. Lê vê pîrejinê nedizanî ku ev kesane xebatkarên siyasî ne, ku bi dijî rijîma Şah xebatê dikin.

Pirsyar: Piştî sernixûniya rijîma Paşatiyê, te çend caran seredana Îran û Kurdistanê kiriye? Hindî ku em dizanin, carekê di kelekela şerê rijîmê û gelê Kurdistanê (Şerê sê heyve) de, tu hatî Kurdistanê. Bê şik û guman wî çaxî jî te bi Dr. Qasimlo re hevdîtin û hevpeyvîn hebûye, te çi bîranînek ji vê seferê heye û hevpeyvînên we pitir li ser çi pirsekê bûn?

Bersîv: Di rastî de meha Septembera sala 1979'an bû ku min seredana Kurdistana Îranê kir. Wî çaxî ne şer hebû û ne aştî. Di gundê **Pişkawê** de çavê min kete Dr. Qasimlo. Ew di xaniyekî (ku pê kevira hatibû avakirin) de dijiya ku tenê odik hebû. Wî digot: "Eva yekem car e ku ez dibme xwediyê xaniyekî hankî. Wî kincên Kurdî xwekiribûn, û hefttîrek jî girê dabû. Wî digot: "Pêşmergeyan gotine min ku çawa gulla bi vê demançê biteqînim, lê hêla jî ez hîn nebûme ku çawa vê demançê bi kar bînim!".

Me şansekî baş hebû ku di wan rojan de em li wir bûn. Çimku piştî çend rojan em bi xwe re birne mîtîngeke mezin li Mehabadê. Wî li wir gote min, ku Qazî Mihemed vira îdam kirin û bi hezaran kesî vira kom bibûn. Vê bûyerê bandoreke zaf li ser min danî, bi rastî jî ciyê heyrîmanê bû. Çimku li ser girên qeraxa bajarê Mehabadê, tang xuya dikirin. Ez bêjim eva cara dawiyê bû ku min Hêmin dît. Min nîgarekî gelek ciwan ê Dr. Qasimlo, û birayekî wî û Hêmin girt. Ew nîgar her niha jî li ser maseya min a nivîsînê ye. Di vê seferê de min hinek ji yekîniyên (Wahidên) pêşmergeyan dîtin ku gelek serûber bûn û bi başî hatibûne rêxistin. Di civîneke Komîteya Navendî de min beşdarî kir. Sê heftiyan em li wir bûn.

Pirsyar: Erê gelo Dr. Qasimlo derheq doza Kurd qet ji te wekî rojnamevan û şarezayekî pirsa Kurd, pirs an hevpeyvîn dikir?

Bersîv: Me di vî warî de gelek bi hev re qise dikir. Lê ez bêjim di heddê min de nebû ku ez wî rênimayî bikim. Ew mamosta bû û ez dersxwan. Lê zaf caran li ser sitratêjiya bizava Kurd, armanca pêşeroja xebata Kurdan, û li ser têkiliya PDK Îran û Bexdayê, û hinek pirsên hankî me pêkve behs û gengeşe dikirin. Min bawerî bi yekîtiya herçar parçeyên Kurdistanê heye û ez li ser vê bawerê me ku ew yekîtiya divêt bibe armanca pêşeroja Kurdan.

Pirsyar: Axayê Kirîs Kuçêra! Dema ku te nûçeya şehîdkirina Dr. Qasimlo bihîst, te hest bi çi kir ?

Bersîv: Wî çaxî em di Îrlendê de bûn, hemû sibezûyan me guhdariya radyoyê dikir. Sibezûyekê me ji radyoyê bihîst ku sê kes ji rêberên Kurdan hatine kuştin. Piştî wê navê wan jî got. Vê nûçeyê em pirr nerehet kirin. Hevjîna min dest bi giriyê kir, min nedizanî çi bikim. Jidestdana hevalekî wekî Dr. Qasimlo derdekî giran bû, û nerehetiya zaf a hevjîna min jî hatibû ser. Her wekî min pêştir bas kir, Dr. Qasimlo bo min dostekî gelek nêzîk bû. Min di rewşên curbicur de ew dîtibû: Wekî koçberekî siyasî û wekî rêberê bizaveke çekdarî û xwedîhêz. Lê ew hertim di dostatiyê de germ û rûken bû, û qet xwe mezin nedikir.

Pirsyar: Te bixwe çi xasmaniyek li Dr. Qasimlo de didît ku ew ji rêberên dinê cuda dikir?

Bersîv: Dr. Qasimlo kite rêberê Kurd bû ku li Ewropayê ders xwandibû, wî çend zimanên bîhanî bi başî dizanîn, wî xelkê Ewropayê baş nas dikir û dizanî çawa bi wan re reftarê biket. Wî şiyan û lêhatiyeke zaf li pêkanîna têkiliyên dostane bi rêberên siyasî re di Ewropayê de hebû. Mêrekî çandevan û siyasetvanekî bi tewaya wateya peyvê bû. Bi baweriya min hekî ew maba, renge rewşa Kurdan di Kurdistana Îraqê û Kurdistana Tirkiyê de jî guherî ba.

Çavkanî: Rojnameya Kurdistan hejmar 272
Pirtûka: Rêberêkî Modêrn û Şorişgêrêkî Dîmokrat
Î

***

Qasimloyê zana balyuzekî çeleng bo tevgereke bê yar û bê pişteva
N: Mark Kirawîts

Rojnameya Lîbirasiyun, 07.07.1989'an

Ebdulrehman Qasimlo ku li 13'ê July a sala 1989'an di Viyenê de hate terorkirin, hem wekî rêberê yek ji bizavên rizgarîxwaze neteweyî ên herî kevn û gelerî, hem di warê balrakêşbûna kesayetiyê ve, herwisa di warê hitbar û nifûza navneteweyî de jî, bi vê şiyan û lêhatiya kêm heval, hekî em nebêjin bê heval, li şirovekirina çand û xebata neteweyeke hezarsalî, di çarçoweya bihagiraniyên axir salên sedsala bîstan de, ku navbirîne ji: Azadî, demokrasî, û entirnasyunalîzim, mirovekî bê hevta bû. Lê bo xelkê [Cîhanê] hinde naskirî nebû, û renge hejmareke zaf ji xelkê ji hebûn û mirina wî hevçax agehdar bibin.

Dr. Qasimlo ne karên wî veşartî bûn, ne jî jiyaneke pir ji nepenî û remz û raz hebû. Ew ku sekreterê giştî yê PDK Îranê bû, hekî hewce ba serkirdeyekî şer, û ji vê hindê jî zêdetir rêberekî siyasî bû, ogirê diyalog, behskirin, û hebûna têkiliyeke baş bû. Ew bo tevgera xwe balyûzekî çeleng û xwedîhest bû, û bona çêtir nasandina vê tevgerê sefer bo seranserê cîhanê dikir. Lê wî hejê jiyana li nav koma pêşmergeyan di xaniyekî -li kurahiya dolekê û li ser sînorên navbera Îran û Îraqê- de dikir. Herêmek ku Dr. Qasimlo zû-zû neçar dibû ciyê xwe li wir biguhere, lê pirtûkxaneya wî hertim bi wî re bû.

Ogir û evîndarê pirtûkan û şeraba baş bû. Dîhare gelek bi hêsanî dikarî desta ji şerabê bikêşe, lê qet desta ji pirtûkan nedikêşa. Her çawa bi hêsanî li ser maseya xwarinê, di Parîsê de dirûnişt, her bi vê sanahiyê jî taba tenêtî û jiyana sade li hewayê sar yê zivistanên hişk di çiya de dianî. Dr. Qasimlo her ev hinde ku li ser bîr û raya xwe tekez dikir, ewhinda jî mêrê qada kiryarê bû. Wî bi sanahî dikarî tund

û tîjiya hewce bo xebateke siyasî-çekdarane tevî şik û gumaneke çavkanîgirtî ji jiyana xwe a zanistî tevlihev biket.

Qasimlo di aboriyê de pileya doktorayê hebû, ogirê dîrok û wêjeyê bû. Di helbestên Kurdî, Farsî, û Erebî de gelekî şareza bû. Ji bilî vê yekê jî wî gelek bi sanahî gotinên Wîktor Hogo, Bodlîr, Walt Wîtmenya, Tî. S Îlît wekî mînak dianîn. Wî gelek bi sanahî dikarî bi şeş heft zimanan biaxive û binivîse. Herwisa wî gelek keyf bi qelpik û qisên xweş dihat. Bi her kesî re biaxivîba û rabûn û rûniştin heba, çi bi alîgirên bizava [li jêr rêberiya] xwe re, çi bi rewşenbîr, doktoran, wezîran, balyuzên mezin û siyasetvanên çep û rast re, bandoreke wekhev li ser wan didanî.Wan hemûyan jî heta hekî gelek berî niha jî hevdîtin û hevpeyvîn bi wî re pêk anîbin, pê li ser vê yekê dadigirtin ku kesayetiya Dr. Qasimlo bandor li ser wan daniye û bala wan bo aliyê xwe rakêşaye. Di vê sedsalê de kêm kes heye ku hemû kes li ser kesayetiya wî hevdeng bin.

Qasimlo jiyana xwe a siyasî wekî komonîstekê di Partiya Tude a Îranê de, dest pêkir û heta radeya rêberiyê jî di vê partiyê de çû pêş. Piştî 15 salan gotina dersa aboriyê li zanîngeha Pragê, li meha Uta sala 1968'an de li ser pirsa destêwerdana sovyetistana berê di nava karûbarên Çikislowakiyê de desta ji Partiya Komonîst kêşa. Herçend ku wî bîr û raya têkel bi serhişkî û dugmatîkê ya marksîzmê wêde da, lê wî qet haşa ji rabihuriya xwe nekir, belkî wî cehd kir ku şaşiyên xwe cubran biket.Wî bo têgihîştina ji vê pirsê ku li kuderê û kengê dadperwerî tevî bê dadiyê û rastî tevî direwan - û heta tevî teror û wehşetê- tevlihev bûn, zirûf û rewşên siyasî ên cuda şirove dikirin û berhev didan. Wî bi taybetî zîrekatî û hesteke wisa hebû ku dizanî arîşeyên xebata siyasî di civakeke paşverû de çi ne? (bixwe hemû carê peyva paşverû bi kar dianî). Civakek ku bi sedema nebûna her terze têkiliyekê bi cîhana derve re, û bi sedema bêpariya ji mafê bîr û ra eyankirin û biryardanê, heta di warê destpêregihîştina bi çanda xwe jî paşve ma ye. Wî nedixwast ku vê paşvemayiyê bikete hêceteke îdolojîkî, bo evê ku hewara xwe bibe ber zêderewiyên curbicur ên wekî geşandina tund û tîjiyê, tenê li ber nefsa tund û tûjiyê, giringîdan bi perêztina kesayetiya rêber (Kîşê şexsiyet) li

rêxistineke siyasî de, an dîktatoriya partiyeke siyasî bi ser neteweyekê û hwd…. de.

Ji bilî vê yekê jî, ew bi vê boçûnê re nebû ku giring nine li têkiliyên giştî û li hevpeyvîna bi ragihandinên giştî re bi cureyekê qise bike, lê di qada kiryarê de wan qisa ji bîra xwe bibet.

Şanaziyeke mezin ku ew qet ji ducarîkirina wê nediwestiya, eva bû ku digot, ew hinda ku derfet hebe, divêt bihagiranî û îdealên mirovî di tekoşîn û karûbarên rojane a bizavê de rengvedan hebe. PDK Îranê qet tevî hepsiyan reftara xirap nekiriye. Li têkilîî û rabûn û rûniştina bi xelkê re hewara xwe nebiriye ber zorê. Qet rehîn negirtine, qet balafir nerevandine, yan di nav utubusekê, bazarekê yan yek ji bajarên dijmin de bombe neteqandine. Dîhare hisaba cî û herêmên leşkerî cuda ye. D.r Qasimlo herçend ku mirovekî cesûr bû, lê di rastî de dijberî terorîzmê bû, herçend gelek baş dizanî ku divêt çi nirxeke giran seba helwêsteke hankî bidet. Lewma gelek caran tevî îşarekirina bi vê pirsê, nerehetiya xwe eyan dikir ku ragehandinên giştî girîngiyeke wisa nadne pirsa Kurd. Carekê li ciyekî nivîsandibû: "Taqmeke kûşke dikare ji rêya rehîngirtinê ve, yan danîna bombekê navûdengekî zaf xwe re peyda biket, eva jî di halekê de ye ku bizavên rizgarîxwaz ên neteweyî ku hewara xwe nabne ber terorîzmê, bi tewahî hatine jibîrkirin".

Dr. Qasimlo di meha Novembera 1979'an de her li yekemîn roja bi rehîngirtina dîplomatan û kargêrên balyuzxaneya Amrîka di Tehranê de, ev kiryara şermezar kir. Bi baweriya Dr. Qasimlo, rizgariya Îranê li jêr deshilata Amrîka, yan rizgarbûna cîhana sêyem ji zilhêzeke împeryalîstî, her wekî di bernameya PDK Îranê de hatiye armanca dirêjheyam a xebateke siyasî ye ku yê azadî û demokrasî ji hemûyan re bi dûre hebe.

Bi vî halî jî serbarê boxtanên rijîma Tehranê, Waşingtonê guh neda pirsa Kurd. Herçend dîplomasiya Amrîka li şerê tev dewleta Îraqê de (1961–1975'an) xwedîçeleng bû, bi wan egerên ku Kîsîncir şirove diket û di mejiyê xwe de bi meremeke xirap fikrê lê dike, dewleta Amrîkayê çi karek bi merema xizmet bi vê pirsê nekir. Hetanî heyvekê berî şehîdbûna Qasimlo jî wîzaya çûna bo Amrîkayê pê nehatibû dan. Rast li rojên berî sefera bo Viyenê wî xwe bo sefera

Amrîkayê amade dikir, welatek ku ev hêvîdar bû ku bo nasandina pirsa Kurd cehdeke zaf di wir de biket. Herçend ku encamên siyasî ên sefereke wisan jî gelek nerohn nebû. Wî baş dizanî ku hevpêywendî û hevderdiya beşeke xwendevanên cîhanê bi doza Kurd re (ne tenê her bi 5 milyon Kurdên Îranê re, belkî bi 25 milyon Kurd re ku bi ser çend welatan de hatine parvekirin) herçend pan û berfirehtir jî be, qet nikare dîplomasiya deshilatên mezin û heta dîplomasiya Ewropayiyan jî bi qazancê Kurdan bimeşîne. Çimku ew hertim li fikra qazancên xwe de ne.

Wî bi sedema wan hemû seferên ku bi taybetî bo Ewropa kiribûn, ev rastiya jêre eyan bibû. Çimku herçend bi giştî rêz û hurmet jêre didanîn, bi vî halî jî gelek bi kêmî di kom û civînên fermî de dihate wergirtin, wî herwisa bi mifahwergirtin ji dostiniya kevnar û têkiliya [partiya] xwe bi Entirnasyonala Sosyalîst re, carna dikarî kêmekê yarmetiya mirovdostane gelê xwe re destve bîne, yan ji rêya hevalekî xwe ve arîşeyên ku bo wî giring bûn çareser biket. Jan Firanswa Dînaw yek ji wezîrên kabîneya Jîskar Dîstîn, bi hesteke heta radeyekê dostane ve basê vê yekê dikir ku wextekê Dr. Qasimlo ev êxistibû jêr zext û givaşê, da ku aqibet kariye ferhengeke Feransewî - Kurdî ku ji mêjve bû çavnihêrê çapa ducarî bû, sertaze çap biket.

Dr. Qasimlo mirovekî rialîst bû. Baş bîra min e ku carekê got: "Di dawiya sedsalekê de ku yek ji taybetmendiyên wê sedsalê yên berçav eva ye ku neteweyên curbicur dixwazin nasyonalîzmeke sist û lerzok cîgir bikin, her terze cehd û tekoşînek bona nehêlana nexşê coxrafiyayê ku izin bi kurdan bihête dan da ku li ser kavilkiriyên sê neteweyên din welatekî serbixwe pêk bînin, nikare tişteke dilxwaz be. Lewma otonomî ji Kurdên Îranê re dixwast, ne serxwebûn. Lê dijminan di Tehranê de fikir dikirin ku eva taktîkek e bo lêbandina wan, taktîkek ku ew bi awayekî naşiyane bo weşartina bîr û rayên cudahîxwazane tîne holê, lê newêre eşkere biket, û yekemîn pêngav e bo pêkanîna "Kurdistana mezin" û hevgirtina Kurdên Îran, Îraq, Tirkiye û heta Kurdên Suriyê û Sovyeta berê.

Di vî warî de heta kesekî neruhanî, wekî Benîsedir jî bi Axundên kevneşop re tewaw hevhizir bûn.

Biryara kuştina Dr. Qasimlo di sala 1979'an de hate dan wî çaxî ku ew wekî tenê keseke neruhanî bo Meclîsa Damezrêneran(Moesisan) hatibû hilbijartin û bi egerên êmnahiyê neçû Tehranê. Ayetullah Xumêynî li hevpeyvîneke tilvîzyunî de bi eşkere nerehetiya xwe seba nehatina Dr. Qasimlo eyan kir û got: "Xwezî hatiba, min wisa danî bû ku hekî ew bihatiba minê ew vira ragirtiba".

13'ê julay roja cêjna mezin a bisilmanan [Cêjna Qorbanê] bû, herwisa şîeyan di vê rojê de rêz ji çilê Xumêynî digirtin. Erê gelo eva tişteke bi rêkevt bû? Erê gelo ew bikujên ku kincê nûnerên aştiyê kiribûne ber xwe de, û ji aliyê Haşimiyê Refsencanî ve meimûriyet bi wan hatibû dan û bi pasporta dîplomatîk ve ku Wilayetî [Wezîrê karê derve yê Komara Îslamî] îmze kiribû, û ji Tehranê ve hatibûn, bi qestî di vê rojê de ku roja taziyê bû, biryara kuştina wî cîbicî kirin?!

Çavkanî: Rojnameya Kurdistan hejmar 272
Pirtûka: Rêberêkî Modêrn û Şorişgêrêkî Dîmokrat

***

Tevgera Kurdistanê bo gelek ji destkevtên xwe qerdarê zanayî û zîrekatiya siyasî a Dr. Qasimlo ye

N: Mêhdî Xanbaba Têhranî

Bi baweriya min tevgera Kurdistanê bo gelek ji destkevtên xwe, qerdarê zanayî û zîrekatiya siyasî a Dr. Qasimlo ye. Piştî tewawkirina zanîngehê li Parîsê, bi salan ew di Çikislowakiyê de jiya bû, û piştî hatina mêhvanên nexwestî ên Sovyetistana pêşîn bo wir, di sala 1968'an de neçar ma ku vî welatî bi cî bihêle. Qasimlo bi pirsên girêdayî bi welatên Ewropayî re nasyar e û hajê rewş û siyaseta welatên Rojhilata Navîn jî heye. Mirovekî dunyadîtî ye. Di rastî de ceribandinên wî ên dewlemend arîkariyeke zaf bi geşekirina PDK Îranê di warê siyasî de kiriye.

Di rastî de ez dikarim bêjim Dr. Qasimlo yek ji siyasetvanên herî lêhatî ên Îranê ye. Eva ku di çaxê mana min di Kurdistanê de bandor li ser min danî, eva bû ku min didît li têkiliyên di navbera rêberan û kesên sade û pêşmergeyên partiyê de çi cudahiyek çinebû.

Pêşmerge bi roj diçûne emeliyatên leşkerî û şevê jî li dewra yektir kom dibûn, û bi saz û sitranan digirtne dîlanê û keyfxweşî dikirin. Dr. Qasimlo digot: "Şoreş xemxwarinê naxwaze. Mirov bo şehîdbûnê şoreşê naket, û şehîdbûn her di cî de armanc nine. Mirov divêt cehdê biket da ku di qada xebatê de bîr ji jiyanê biket. Hekî şehîd jî bû eva tiştek e ku di xebatê de tête pêş. Lê merem ji cehd û tekoşîna mirov jiyaneke çêtir e û hertim divêt mirov bîr ji jiyanê biket."

Ez dixwazim bêjim ku Dr. Qasimlo ev terzê bîrkirinê, biriye nava tevgera Kurdistanê de. Bîrkirineke nû ku bi baldan bi paşvemayiya aborî û civakî a Kurdistanê, giringiyeke zaf heye. Aliyê dinê yê vê terzê bîrkirinê, pêkhatina derfetê ye bo evê ku her kesek bikare azadane bîr û rayên xwe eyan biket. Di nav PDK Îranê de ne tenê hebûna neyaran tête tabkirin, belkî herkes dikare bi azadî bîr û boçûna xwe eyan biket. Bi baweriya min eva ji wan destkevtan e ku Dr. Qasimlo di pêkanîna wan de rolekî berçav hebûye. PDK Îranê ev siyaseta girte pêş, lewma qet nebûye êxsîrê siyasetên kevneşopiyê. Ev siyasetên ku peyrewiyê ji berjengeke taybetî dikin, yan ji dîtingeha berjengeke dîharîkirî ve dinihêrne şoreşê û serkevtina xwe di piştevaniya deshilateke derekî de dibînin.

Çavkanî: Pirtûka "nigahî ez derun bê conbişê çepê Îran"

***

Kurtiyek ji axavtina Nesrîn Qasimlo

Hevalên birêz!

Deh sal bi ser şehîdkirina Ebdulrehman Qasimlo, Ebdullah Qadirî û Fazil Resûl bi destê wan terorîstên ku ji aliyê Komara Îslamî û serkomarê wî çaxî, Refsencanî ve hatibûne şandin, derbas dibe.

Mixabin hetanî niha dad (Edalet) di vî warî de rêve neçûye. Niha ku em di vê rojê de rêz û hurmetê ji yad û bîra wan digrin, gelek giring e ku em nehêlin ev pirsa ji bîr here. Ez nizanim ku çima Dr. Qasimlo şehîd kirin.

Niha ku pirsa Kosovo û Yûgislawiyê hatiye holê û Nato dijberî dîktatoriyê û ji bo cîgirkirina demokrasiyê pêngav hilgirtiye, erê gelo

ma nabe piştî deh salan ku terorîst berdan û şandne Îranê, karekî bikin?

Çi kesanek di vî karî de berpirsyar bûn? Çi kesaneka nehêlan edalet rêve here? Îro Pîtir Pîlç, xelkê dinê û bîr û raya giştî hewara rêveçûna edaletê dikin, nabe ji vê hindê zêdetir pirsên aborî li ser rêya rêveçûna edaletê astengan pêk bînin. Herçend hetanî niha û piştî deh salan ev pirse her nehatiye çareserkirin, lê ez xatir cem im ku rojekê rastî dê eşkere be û edalet yê rêve here.

Çavkanî: Rojnameya Kurdistan, hejmar 273

***

Axavtina Hayins Fîşir serokê parlemana Utrîşê

Hatina min bo vê rê û resmê nîşana vê yekê ye ku ez dixwazim dostatiya xwe bi gelê Kurd û Kurdên rûniştiyê Utrîşê re nîşan bidim. Dema ez dinihêrme rojhijmêra sala rabihurî, ez dibînim ku demjimêr dehê roja 14.07.1989'an, min qerara hevdîtinê bi Dr. Qasimlo re hebû, lê ser negirt, çimku roja pêştir hatibû terorkirin. Min Dr. Fazil Resûl û malbata wî nas dikir. Di mala wî de bi Ehmed bin Bila re em rûniştibûn da ku basa dostên xwe ên Kurd, ne tenê her di Îranê de, belkî di tewaya Kurdistanê de guherîna bîr û rayan bikin.

Min Dr. Qasimlo wekî sosyal demokratekê nas dikir. Ew yeka li Stokholmê di hevdîtineke hevbeş bi Wîlî Birant re bo min eyan bû. Qasimlo mirovekî azad û demokrat bû. Jêre giring bû ku pirsa Kurd ji rêya siyasî û aştîxwazane ve bête çareserkirin. Wî hertim xebata çekdarane bi tişteke neçarî û dasepayî dizanî. Di çend salên derbasbûyî de jî me dîtiye ku bi şer û hêza leşkerî û binpêkirina mafê mirov çi arîşeyek nahête çareserkirin. Îro bihagiraniyeke zaf bi pirsa mafên mirov tête dan. Her wekî di Kosovoyê de me dît eva bo tewaya Ewropayê kevirê mehekê ye. Ew mafên ku bo neteweyekê hebe divêt bo hemûyan hebe. Mafê hemû mirovan dibe wekhev be. Daxuyaniya cîhanî a mafên mirov dibêje: Îca çi Albaniyayiyên di Kosovoyê de bin, çi Erebên Filistînê bin, yan Kurdên Kurdistanê bin. Hekî Qasimlo jî ma ba wê her wisa gotiba.

Şik tê de nine ewa ku qewimî, cinayeteke tewaw bû. Mixabin ronkirina vê pirsê neçû pêş. Divêt em bi kul û keser ve basê bikin. Ceribandineke tal e. Ez spasiya wan kesana dikim ku ev rê û resma pêk anîn. Di dawiyê de ez dibêjim ev kese miriye ku kes bîrê naket.

Hemen çavkanî

***

Axavtina Dr. Bêrnard Koşnêr wezîrê saxlemî û karûbarên civakî ên Feransayê

Xanima serok!

Axayê Hesenzade sekreterê giştî ê PDK Îranê !

Xanima Qasimlo!

Hevalên birêz!

Me gelek bîranîn pêkve hene. Careke din jî wekî endamên malbatekê em li dora hev kom bûne da ku di dehemîn salvegera şehîdbûna Dr. Qasimlo de rêz û hurmetê ji yad û bîranîna wî bigrin. Deh sal çend zû derbas bûn. Hêşta gotinên deh salan berî niha ên mamosta li cimata Pîrlaşêzê li bîra min in, ku digot: "Qasimlo! Îro hemû [rêvîngên rêya te û dost û alîgirên rê û şopa te] bo te digirîn û rondikan dirêjînin. Lê ne li ber bêhêvîtiyê. Çimku neteweyek ku xortekî wekî te perwerde kiribe, bêhêvîtiyê nas naket. Ew bo te giriyan da ku bi ava çavên xwe, û bi axa rêya te heriyekê bo serê dijminên azadiyê bigirin."

Belê Dr. Qasimlo!

Gelek ji hevalên te îro vira li hev civiyane û gelek hevalên din jî li paytextên dinê ên Ewropayê kom bûne û kom dibin.

Deh salan berî niha, komek mirovên bîrmend, pêşkevtinxwaz û zana, di Viyena paytexta Utrîşê de hatne terorkirin.

Bikuj her ew kesane bûn ku sê hevalên me Şerefkendî, Ebdulî, û Erdelan di 17.09.1992'an de li Birlînê şehîd kirin.

Belê, hemû bi destê berpirsên welatê xwe yanî Îranê hatne şehîdkirin, ew berpirsên ku bo parastina deshilata xwe bi her nirxekê terorîzma dewletî dijberî hevwelatiyên xwe, dijberî azadiyê û dijberî kesyetiyên welatê xwe bi kar tînin.

Lê li ser hovîtiyê:

Kurd ji her kesekî dinê çêtir dikarin di vî warî de biaxivin. Çimku eva bi sala ye ku Kurd bûne goriyê vê diyarokê û hemû rojê tev vê diyarokê berengar in û bi tewahî hest pê dikin, bi taybetî di Tirkiyê de.

Belê, Dr. Qasimlo!

Kurdistana Îranê niha jî ku niha ye, hêla otonomî destve neaniye. Lê Kurdistana Îraqê ku te baş nas dikir û tê de dijiyayî, û em jî bi te re bûn, hetanî radeyekê xudmuxtar e. Lê ev hêviya kêm ku li jêr sîbera Saziya Neteweyên Yekbûyî di vê beşa Kurdistanê de pêk hatiye, wê heta kengê dirêjî hebe? Li ser diruşma "Demokrasî bo Îranê û otonomî bo Kurdistanê" jî divêt ez bêjim demokrasî di Îranê de ku yek ji hêvî û xweziyên te bû hêla cîgir nebûye, lê xebata te di pêxema cîgirbûna demokrasiyê de, bi dawî nehatiye, çimku partiya te, PDK Îranê herwisa dirêjiyê dide xebatê, û rêvîng û xebatkarên dinê, rêya te didomînin. Lewma şik û guman tê de nine, direng an zû armancên te wê destve bihên.

Belê Qasimlo! Mafê destêwerdana mirovî ku wî çaxî cîbicî nebibû, nêzîkî sê heyva ye ku bûye pirseke cîhanî. Neteweyên demokrat aqibet biryar dan ku herne şerê hovîtiyê, herne şerê dîktatorekê ku heymekê berî niha bi encamdana cinayetan dijberî mirovatiyê hate sûçbarkirin. Vê carê demokrasî serkevtî ye. Eva ku koçber dikarin tenê sê heyvan piştî ewê ku ji mal û hêlûna xwe hatibine derêxistin, dikarin wegerne ser axa xwe, bûyereke bê heval e di dîrokê de. Em vê yekê jî dizanin ku hêla gelek pirs çareser nebûne.

Îro ne sibê, Saziya Neteweyên Yekbûyî dê vê pirsê wekî maddeyeke yasayî bipejirîne, û wî çaxî ye ku wê berbikevin! Eşkere ye ku di zirûfa niha de, ev pirsa tenê taybet bi Ewropa ye. Lê em dizanin ku ev pêngava bo pêşeroja mafên mirov û mafên kêmaniyan pirseke yekcar mezin û giring e.

Dr. Qasimlo!

Bi nemana te ku tu mirovekî jîr û zana, rexnegir, qisexweş, xwediyê çandeke dewlemend û keniyeke bi bandor bûyî, em hest bi kêmasiyê dikin. Te jiyana xwe di rêya neteweya Kurd û di pêxema azadî û demokrasiya cîhangîr de gorî kir.

Li ber ewê ku em dostê te bûn em hest bi şanaziyê dikin. Divêt em cehdê bikin ku me lêhatiya cehd û tekoşînê di pêxema destveanîna bîr û boçûn û armancên te de hebe. Belê xebata te xebata me jî bû, wê her xebata me jî be, û neteweya te aqibet rojekê wê bigîje azadiyê.

***

Gotara Dr. Kendal Nezan serokê Enstîtuya Kurd li Parîsê

Ez wekî dostekî kevnar ê Dr. Qasimlo qise dikim. Qisên hevalên Îranî û kesên dinê ku Qasimlo nas dikirin, bandoreke zaf li ser min danîn. Ez bêjim eva edetê mirovên mezin ên huner û siyasetê ye ku dibne xudîkeke mezin di hember gel û civaka xwe de, da ku hemû bikarin xwe tê de bibînin. Vira de dostên Îranî û Feransewî rêz û hurmetê ji kesayetiya Dr. Qasimlo girtin. Renge hekî Erebek li Îraqê, Tirkek li Tirkiyê, Azeriyekê û Aşurî- Keldaniyekê jî qise kiriban, meremên xwe her bi vê hest û sozê eyan kiriban, û Dr. Qasimlo ji xwe zanî ban. Çimku ew ji netebayî û cudahiyên herêmî, neteweyî û olî gelekî mezintir bû. Ew hêza ne diyar a îro ku em li dora hev kom kirine, hemû ew bihagiraniyane ne ku Qasimlo bingeha xebat û tekoşîna xwe li ser danî bû, yanî azadî, demokrasî û dadperweriya civakî.

Dema li sala 1976'an di Parîsê de ez tevî Dr. Qasimlo nasyar bûm, neteweya Kurd bûyereke neteweyî bi ser de derbas dibû. Çimku serhildana jiniral Barzanî, hêviyeke zaf di dilê xelkê de pêk anîbû, lê piştî lihevhatina Elcezayirê di navbera şahê Îranê û Seddam Husêyn de, û nîşandana çiraya kesk ji aliyê Amrîkayê ve, vê serhildanê şikest xwaribû. Ji bilî vê yekê jî Kurd gewahyarê piştevaniya Amrîkayê ji rijîmên dijî gelî ên Îran û Tirkiyê bûn. Her lewma dijkiryara hêzên siyasî ên Kurd bo mînak qorixçiyan eva bû ku sîstema Şorewî bikne rûgeha xwe, û rêbaza xwe li ser bingeha sosyalîzma zanistî yanî marksîzm -linînîzmê, ava bikin. Dr. Qasimlo ku ji Piragê hatibû û sîstema sosyalîstî gelekî baş nas dikir,

ceribandinên zaf hebûn. Ez bixwe çend caran çûme welatên Rojhilatî û xatircem bûm ku modêla şorewî gihîştiye bonbestê. Lê vî çaxî eyankirina dîtingehekî wisa li kom û komikên Rojhilata Navîn de gelek bi zehmet bû û heta bi curek kofir û îxanet dihate hesêbandin.

D.r Qasimlo baweriyeke zaf bi demokrasiyê hebû û li ser vê bawerê bû ku demokrasî tiştek nine ku taybet bi hindek welatan be. Belkî destkevteke mirovanetiyê ye ku hemû alî û bi xasmanî welatên cîhana sêyem mafê vê yekê hene ku hebin û mifahê jê wergirin. Ji dîtingeha wî ve demokrasî emrazek bû bo hevgirtîkirina neteweyeke wekî neteweya Kurd ku bi sebebên curbicur hatiye parvekirin. Wî dixwast ji rêya diyalog û halîkirinê ve Kurdan li hev nêzîk bike û wan hevgirtî biket, ne ji rêya zorê ve.

Wî demokrasiyeke nivîşkan wekî demokrasiya borjiwazî, yan ewa ku dibêjnê demokrasiya siyasî ji serberedayî yan dîktatoriya xelkî û piroltarya ya herî baş, çêtir dizanî. Lê ew li ser vê bawerê bû ku divêt ev demokrasiya pan û berfirehtir jî be û warê civakî jî pê bihête dan ku dibêjnê dadperweriya civakî.

Li ser bingeha vê boçûnê bû ku wî jêve bû li navbera sîstema Amrîka û modêla Şorewiyê de rêyeke dinê heye, ku dibêjnê sosyalîzma demokratîk. Wî serdemekê sosyalîzma demokratîk di nava refên PDK Îranê de şirove kir ku karekî wisa di warê siyasî de cesuriyeke zaf dixwast.

***

Axaftina Dr. Bîrnard Giranjon serokê iftixarî yê rêxistina nojdarên cîhanê

Li ser izna we ez dixwazim ji aliyê wan rêxistinên mirovî ve ku tevî Dr. Qasimlo hevkarî kirine, kêmekê qise bikim. Qasimlo bo me her tenê kesek nebû ku bi başî ew arîşeyên ku di dema encamdana xizmetên mirovî de dihatne ser me fam dikirin. Belkî kesekî gelek ji vê hindê meztir bû. Ew bo me mînaka mirovhezeke mezin bû. Hekî ez bixwazim taybetmendiyên Dr. Qasimlo baştir bas bikim, divêt ez bi ducarîkirina du gotinan qisên xwe bi dawî bînim. Yek ji wan du gotinan ya Qasimlo bixwe ye. Gotinek ku ez hez dikim ducarî bikim û min jêve ye hetanî dema dawiyê a jiyana xwe jî ezê her bêjim, ev jî eva ye: "Dizanî, di navbera "qanii"kirin û dasepandinê de,

"qanii"kirin zehmettir e, û dem û xwe mandîkirineke zortir jî dixwaze. Lê di encam de ew kese serkevtî ye ku ji rêya "qanii"kirinê ve arîşeyan çareser diket". Gotineke din ya zarokekî 8 salî ê Kurd e. Çend heyvan piştî şehîdbûna Dr. Qasimlo di binkeya Deftera Siyasî a PDK Îranê de ku hingê di nav şîn û taziya jidestdana kesayetiyeke hankî mezin de bû, çavê min kete wî zarokî û min jê pirsî: Dr. Qasimlo bo te berjeng û sembola çi tiştekî ye? Vî zarokî di bersîva min de got: "Demokrasî". Ez bêjim vî zarokî hemû taybetmendiyên Dr. Qasimlo bi peyvekê eyan kirin.

Gotara Madam Daniyel Mîtran hevjîna Firanswa Mîtran serkomarê pêşîn ê Feransayê di dehemîn salvegera şehîdbûna Dr. Qasimlo de

Roj baş!

Vira de ez hejmareke dostên nasyar dibînim ku di berevanî ji armanc û daxwazên Kurdan û berevanî ji armanca aştiyê de arîkaria me kirine. Bîstekê berî niha dema Dr. Giranjon(Dema xwandina deqê gotara Ebdullah Hesenzade sekreterê giştî ê PDK Îranê bi zimanê Feransewî) digot ku dewleta Utrîşê terorîst berdan, ez bo bîstekê ji merema wî tênegihîştim. Dizanin bo çi? Çimku di kom û komikên fermî de ku parlemana Feransayê yek ji wan e, eva hertim Kurd in ku bi terorîst têne hesêbandin. (Beşdarên rê û resmê dikenin) lê helbet ez û hûn li ser Kurdan hankî nafikirin. Xulase paşê min fikra xwe kir û ji merema wî têgihîştim.

Di dawiya vê sedsalê de ez dibînim ku di navbera siyaseta dewletan û gelên wan de cudahiyeke hinde zaf heye ku mirov heyrî dimîne. Herçend ev dewletane hemû dewletên demokrat in.

Ebdulrehman Qasimlo mirovdost û alîgirê aştiyê bû û baweriyeke zaf bi aştiyê hebû. Li ser bingeha vê bawerê jî bû ku wî jêve bû tund û tîjî û çek, tevî pêkvejiyana bi aştî a mirovan û ji hev têgihîştina wan, hev nagirin. Lewma hemû cehda xwe bi kar anî da ku bi dewletê re hevpeyvînê bike û vê dewletê "qanii" bike ku Îranî û Kurd dikarin pêkve bijîn û herwisa ji bilî komkujiyê rêyeke din bo ji hev têgihîştinê û li hev nêzîkbûnê heye. Rast li dema cîbicîkirina vê meimuriyeta aştîxwazane de bû ku ew şehîd bû. Bi şehîdbûna wî nefreteke mezin pêk hat û bîr û raya giştî dagirt. Bîr û raya giştî a

ewên ku rasterast bi Kurdan re têkilî hebûn û herwisa ewên ku Kurd nas dikirin. Helbet îro bi baweriya min hemû cîhan Kurdan û dîroka wan nas diket û bo nasandina wan hewce naket ku em tewaya wan bûyerên ku hatine serê Kurdan bas bikin. Lê ji aliyê dewletan ve (Helbet merema min dewletên Ewropayî ye) ji bilî eyankirina çend peyvan bi nîşana nîgeraniyê tiştekî dinê neqewimî. Dîhare hekî îro ez vira de van qisane dikim, sebeb eva ye ku em dizanin gelek nûnerên wisa hene berî evê ku nûner bin, mirov in û wekî me bîr dikin. Lê çi kesek vê hemû hêzê dimeşîne da ku dewletên wan neçar bin guhê xwe bidne qisên wan. Mixabin dewlet dengê gelan guhdarî nakin. Mixabin dewlet dengê wan kesane ku nêzîkî gelan in nabihîsin. Yanî dewlet dengê nûnerên xelkê guhdarî nakin û tenê siyasetê dikin. Îca ew jî hekî em bikarin bêjnê siyaset. Di rastî de divêt em bêjin ew bê deshilat in. Lewma ez bi bîranîna Ebdulrehman Qasimlo ku bo me qutbek bû, hatme ser vê bawerê ku kesekî wisa hewce ye da ku me neçar bi fikirkirinê biket. Dîhare di vî warî de ez ji Firanswa[Mîtran] jî dersê werdigrim. Belê bi derswergirtina ji wan kesane û rêniwînî wergirtin ji bîr û fikra wan e ku mirov dikare çêtir pêngavan hilgire û siyaseta aştiyê di navbera gelên hevpêywend de xurt biket.

***

Birêz Rostem Cehangîrî endamê komîteya navendî a PDK Îranê

Dîhare ez xwe gelek ji vê hindê bi kêmtir dizanim ku bikarim li ser vî navdarî binivîsim. Ez ne nivîskarim û ne jî hinde bi xizmeta wî gihîştim. Dîhare di çend hevdîtinan de kesekî wekî min nikare rêberekî wisa mezin di hemû waran de binase. Wa dîhare rast gotine ku dibêjin Kurd mirîperest in, yanî piştî mirinê kesayetiyên xwe ên mezin nas dikin. Belê wekî hewce Kurda ew bi saxî baş nas nekirin. Bila bi belavkirina nivîsîn û gotinan wî heya qasekî bidne naskirin. Dîhare dijmin ew baş nas kiribû, lewma dest bi cinayeteke weha hovane û kovandar kir û derba xwe li neteweya Kurd weşand. Dr. Qasimlo di her civakekê de ba, bala wê civakê bo aliyê xwe

radikêşa û dibû ciyê rêz û hurmeta wê civakê. Ew di nava refên pêşmergeyan de mêrxasekî cesûr û fermandeyekî bi rêniwîn bû.

Di nav rêberan de serê wî ji hemûyan bilindtir bû. Di rûniştina tevî bîhaniyan de dizanî ku çi bêje, û derdê Kurdan wan re bas biket. Zimanê wî ê şirîne xelk bo aliyê xwe radikêşa. Di bîra min de ye ku rojekê serokê nojdarên bê sînor tevî radyo BBC‹ê hevpeyvîn hebû. Nûçegihanê BBC‹ê ji wî doktorî pirsî, erê hûn çima hinde diçne Kurdistanê, xwe di Efxanistanê de jî şer heye û birîndar zor in. Wî doktorî got ewa ku tu dibêjî rast e, lê Kurdan rêberek hene gava tevî mirov qise diket di destê mirov de nine, bala mirov bo aliyê xwe radikêşe, mirovan cezbî xwe diket. Eva mînakeke kêm e ku ji zimanê bîhaniyan ve tête gotin.

Gava ku em dibêjin Dr. Qasimlo demokratekî bi wateya tewaw a peyvê bû, em zêde nabêjin. Wî baweriyeke zaf bi mafên jinan hebû. Wî cehd dikir ku jinan beşdariyeke berçav di nava karûbarên siyasî ên welat bi taybetî di nava PDK Îranê de hebin. Lewma wekheviya mafên jin û mêran di PDK Îranê de bi tewahî ciyê xwe girtiye. Wî di behs û gengeşeya tevî helbestvan û nivîskaran de ciyê vala nedida. Tevî wan meclîs germ dikir. Tevî rojnamevan û dîroknivîsan bi şarezayiyeke tewaw ve qise dikir. Wî şarezayiyeke tewaw li ser dîroka kurdan û gelên herêmê û Ewropa û Amrîkayê hebû. Canata Randêl, rojnamevanê Amrîkayî li xwe re nabêje ku wî di nava siyaseta Rojhilata Navîn de gelekî baş dikarî xwe rêk bêxe, bêy ewê ku li ser pirsên neteweyî ên wan welatan muamilê biket û zererê bi wan bigehîne. Belê wî siyaseta serxwebûnê di nava PDK Îranê de cîgir kir. Dîhare cehdeke zaf jî kir heya ku karî serkeve. Wî cehd kir ku endamên partiya xwe hîn biket da ku bawerî bi xwe hebin û li hemberî xwastekên derekî de teslîm nebin. Karnameya wî û partiya wî di her warî de gelekî paqij e. Têkiliyên wî tevî wan welatên ku Kurd tê de hene li ser hisaba Kurdên wir nebûye. Ew zana û zîrek bû. Lê dixwast ewa ku dizane hînî dost û hevalên xwe û partiya xwe nemaze xebatkarên gelê Kurd biket.Ya ji hemûyan giringtir eva bû ku qet xwe ji çi kesî zanatir nedizanî. Wî pêka karîna xwe bi xortên gelê Kurd yên parên din re hevkarî dikir.

Ew rêberekî pir demokrat û rexnepezîr û reftarxweş bû. Di çaxê

nerehetiyê de jî qet biryar nedidan. Lewma wî her gav digot hekî hûn nerehet bûn qet biryaran nedin, rawestin bila dilê we hêsayî be, îca paşê hûnê biryarên çêtir û serrastir dê bidin.
Wî di rojên tengaviyê de gelê xwe ji bîr nedikir.Wî karesata Helebçê bi tundî pirotesto kir û dewleta Iraqê a wî çaxî bi berpirsyarê wê karesata dilêş da zanîn. Dîhare ev helwêsta wî di wî çaxî de jêre gelekî giran tewaw dibû, çimku kite rêya çûna wî bo derveyî welêt her Îraq bû, lê wî qet qazanc û mesleheta Kurdan goriyê meslehet û berjewendiyên PDK Îranê nekir.
Bi baweriya min mirovekî mîna Dr. Qasimlo bi hemû wan hizr û bîr û baweriyên xwe carê bo Kurdan peyda nabe, îca xwedê dizane. Dîhare bo neteweyeke şoreşvan gelekî dûr nine ku xortên baştir jî perwerde biket û pêşkêşî baregeha azadiyê biket, û gemiya gelê xwe di nava vê behra pir şîpel de rizgar biket. Bi hêviya wê rojê.

***

Her nehatî ey rêber

Mihemed Salih Qadirî

Ey jidayîkbûyê Şeva Yeldayê, rêvîngê karwanê rûnahî û azadiyê, dijminê tarîkperestan, melewanê behra evînê, evîndarê dayîka jînê, stêrka bextê Kurdan di şeva reş û tarî de, çavê min li rêya te bû, lê tu her nehatî.

Ey ew kesê ku bo gihîştin bi azadî û rizgariay welat, te dil kire hêlûna kul û xeman û te can kire siwarê egîdî û fedakariyê, tu her nehatî.

Ey çavkaniya ilm û zanistê, gopka hêvî û baweriyê, rugeha evîndaran, zimanzanê rêveker, nasname û navdarê Kurdên belengaz, mêrê roja tengavî û oxirmeyên giran, çavê min li rêya te bû, lê tu her nehatî.

Tu dizanî ji kengê ve ez li benda te me û çavê min li rêka te ye? Ji dema ku te rêya çûn û nehatê girte berahiya xwe, û ji wê dema ku te dixwast kela hêvî û daxwazên me li nava babelîsk û kiroveya zordariyê de biparêzî û nehêlî rûnahiya dilê kûşke û pirr hêvî yê viyana me bitemire, belê ji wê demê ve çavê min li rêka te ye, û ez çavnihêrê te me, lê tu her nehatî.

Havîn û payîz bihurîn û dinya jî gevilî û xurist mirûs bû, quling jî çûne germiyanê, pêşmerge jî vegeriyane êvirgehên xwe ên zivistanê, û çavê min li rêya te bû, lê tu her nehatî.

Çavê min li rêya te bû ka kengê, kengê tu dê bêy û bi girnijîna xwe ya şirîn careke din hêviya jiyanê bidî me, û bi nûçe û mizgîniya

oxira xwe, wekî derketina çavê rojê, germahiyeke nû bêxî nava dilê pêşmergeyan û hêviya serkevtinê nêzîk bikî, lê tu her nehatî.

Befrê jî serê çiya girt û mij û duman jî hatin, lê dîsan tu her nehatî. Min wisa hizir kir ku tê tevî hatina buharê, di gel herikîna ava kaniya jiyanê û bişkujîna xwezaya Kurdistanê, ku pêşmerge jî wedigerne qada xebat û dîlana şoreşê, û çeperên berxwedaniyê nûjen dikin, hingê tê bêyî, lê tu her nehatî.

Ey rêber, ey ji bîr nekiriyê rêya Qazî, mişextî û dilşewitiyê Kurd û Kurdistanê, bextreşê çerxa felekê, teyrê perşikestî û der bi der, bo min eyan bû ku sedema nehatina te eve bû ku dijmin bi bêbextî û bi merema vê ku rêvîngên rêbaza demokrat bê pêşeng bihêle û aşê şoreşa gelê Kurd rawestîne, gula temenê te ya pirr ji hêvî hilwerand û tu kirî mêhvanê xerîbî û nehatiyê.

Ax û hezaran ax, ji bo vê bûyera tal û dilêş, çi derdekî bê derman e, hindî çi dikim nikarim ji feleka xayîn bawer bikim, bo min wekî xewnekê ye.

Ey pirpiroka bi agirê evînê per şevitî, azadîxwazê azadî nedîtî, hêvîxwazê hêvî ji dil da mayî, aştîxwazê ketî davka şerxwazan, elehê ketî ber gulleyên neyaran, evîndarê negihîştî mirazê, canxelatê bo welat, mamostayê qotabî sêvî hêlayî, te zanî şehîdbûna te çende dilê dosta şikand û dilê dijminan li me şa kir, û dijimin bi vê derdî giran û bi jan, çawa dil û hinavên me şevitand û pişta me çewand!! Lê dilgiran nebe dijmin nekarî bîr û hizra te ji me bistîne û bi kurahiya çavê dijminê kore fam, heval û hogirên lêhatî û emegnas ên şopa te, li ser wê tevna ku te bo wan raçandî û ew binêşeya ku te bo wan danayî, nehêlan alaya destê te bikeve erdê, herwekî te nehêla alaya destê Pêşewa bikeve erdê. Lewma niha jî rêvîngên rêya te alaya xebat û cangoriyê ku remza hebûn û pênaseya gelê Kurd e, li her ciyekî Kurdistanê, bi bilindî radihejînin û mikur in heta serkevtinê, ku ev alaye bi rijidî pêla bide.

Ey rêber, min jî ji hingê ve, belê ji wê demê ve, qewl û soz da ku heta hebim vê rêbaza ku te canê xwe li ser daniye, bidomînim û bikme ronahiya rêya jiyan û xebatê, û heta gihîştin bi miraza te û hemû şehîdan, nehêlim heyfa we erdê bimîne, xatircem im ku riha

mezine we jî hertim wek sîberekê raserî serê me ye û çavnihêrê mizgîniya serkevtinê ye.

Belê rêber, hingê di vê roja pîroz de, tu jî wê tevî Şerefkendiyê heval û sozdar ê xwe yê heta ser û tevî hemû şehîdên gorxerîb, hûnê karê xwe bikin û ji sefera xerîbiyê ve ber bi axa bab û kalan, êvirgeha Simkoyê nemir û Qaziyê Pêşewa wegerin. Hingê em jî evîndarên rêbaza te, wê ref bi ref û bi deste gulên sor ve, ber bi pêşwaziya we ve bên û tevî dengê sirûd û marşa bi heybet a Ey Şehîdan û tevandina bejna xwe li hemberî mezinahiya we, emê tabûtên ve himbêz bikin û bikne hewar û bêjin: Hûn bi xêr bên, mizgîniya serkevtinê li we ey şehîdên rêber, nemirî bo te ey Qasimloyê pêşeng.

***

Ta hetaye yadit dekem

Bêbeş

Giwêm lê bigre, emşew dilim deryayekî tofanî ye. Her çî reşebay qîn û şemalî aza û şîba heye, destiyan le destî yektir kirdiwe û şepolekan be rapertir heldestênin. Emşew eşkim helçorawe û le cêy çawim nûkî qelem firmêskî sûr debarênê. Emşew le nêw zanistge da her xwêndkare û be diway koçî xwênînî mamostakey da be firke û bang û hawarî, dilî reşî ehrîmen û payey qelay be samî şew delerzênê.

Emşew eşkim helçorawe û wa hest dekem tîşkî çawekanim girin, hênd bir deken sinûrekanîş debrin. Le her şiwênê Kurdê hebê kizey le cerg heldestênin, nek her Kurd bê, dilniyaşim her kes wek min aşnay xem û bendî tem û azar çêştûy çing sitem û dilsûtawî şehîdan bê, pêy desûtê.

Axir emşew karwanêkî deh sal pêşim le ber çawe, karwanêkî dûr û dirêj ke pêş siwarî dûr le diyar pêkrawe.

Ho hewarî pir azarim siwêndit dedem be şêir, be gul, be kanî, be firmêsk, be xwên, be nale, be kêw, be dar, be awaz, be xakî pakî Kurdistan to ke dilit pir azare çend kostî wa gewret dîwe?

Emşew xemî kostî gewrem zor girane, belam bo çî bejnî kace sewzekanî Viyen le şerman û le daxan danayen?

Bo çî "Gonay" yadî hestêkî wa gewre nay hejênê û le nêw gora raynaperênê heta sînaryoy tirajîdîy beserhatî hunerdostêkî mamosta, ke be destî hunerkujan dilî westa, binexşênê?

"Nêruda" ba hestêtewe û emşew çirîkey gîtar û girî şîir têkel bika ta minîş bo "Alindey" xom çend dêr ristey pir be bala bixolqênim. Axir emşew le cêy çawim nûkî qelem firmêskî sûr debarênê. Ba "Himînguy" ew car romanekey be nawî em şewey min ka. Ger wek pêwîst şarezay derdî min niye be espayî ser bilind ka û le pêş siware zam helgirtuwekey min bipirsê, dilniya bê way fêr deka wekû Emrîka bînasê.

Emşew xemim pengî xiwardiwe û wek girkane. Haka teqî. Teqî û le lutkey kêwî xoragirîmewe pir be balay hezekanim girî derwa.

Girêkî sûrî wek xwênî şehîd. Yan wek şefeq. Girêkî sûtênerî dij û dujmin. Girêk ke xaristanî jiyanî mirov xor û aştîkujan desûtênê.

Ax… demew beyane. Wa kotrêkî le goyn kotrekey "Pîkaso" le ber pencerey hodekem hel kurmawe û çawî birîwete laper û pencere û qelem. Belam çi bikem şew têperî û herçî kirdim nemtiwanî, na, pir be balay xem û hest û wîstekey xom, pir be nîgay kotre pir xwênawiyekey ber pencere û pir be amêzî dayke keziye befrîne dilsûtawekey şehîdanî Kurdistanim, çepke wenewşey wişe rinêw bênim…

Spas bo to heware pir azarekem giwêt lê girtim. Toş kotre per xwênawiyeke lêm bibûre ke nemtiwanî wek şayante pesnit bikem. Ta hetaye yadit dekem.

***

Bo mamostay Kurdayetî
Pêşkeşe be şehîd Ebdulrehman Qasimlo

Debibare...debibare
Ey firmêskî helqirçawî azar û jan
Debibare...debibare
Nale û keser helbijêre
Le naw cergî a em gele tazyedare.
Ah ...rojê nemdî lem wilate
xem balî şanman sûk bika û
xorîş tîşkî zêrînî bixate naw cergey
ew rûbaraney hezaran sale
serçawekey lafawî firmêsk û
xemî dayk û bawkî birîndare.
Emşew estêrekanî pîrlaşîz
Legel cirîwey estêrekanî kurdistan
Kejawey firmêsk berê exen
Dilop dilop be ser gorî şehîdanî komon û
Giyanî gewrey Qasimlo da deybarênin
Ey pîrlaşêz....
Ey daykî gewrey şehîdan
Baweşî xot awala ke bo heloyek
Jiyanî be şehîd bûnîyewe ciwane
Bo heloyek be mirdûyîş awate geşekanî
Le nêw şelalî areqe û xwînî nêwçewanî şepol deda û
Bo diwarojman pê dekenê û kamerane

Şemal Ebdulla
1989.07.15
1368.04.24



Dr. Qasimlo

Dr. Qasimlo

Dr. Seîd Şerefkendî



Dr. Qasimlo- Gulistan û Şivanperwer

شەهید دوکتور قاسملوو　　شەهید عبدالله قادری آذر

Dr. Qasimlo (13.07.1989)

Dr. Qasimlo, Cimata Pirlaşêz (Parîs)